K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ

# LÊKOLÎNEK LI SER ÇÎROKÊN OSMAN SEBRÎ YÊN DI HAWAR Û RONAHIYÊ DE

**Sevim Hatun SÜRÜCÜ**

**132302104**

**Teza Lîsansa Bilind**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN**

**Bîngol - 2019**

**T.C.**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

# OSMAN SEBRİ'NİN HAWAR VE RONAHİ DERGİLERİNDEKİ HİKÂYELERİ ÜZERİNE BİR İNCELEME

**Sevim Hatun SÜRÜCÜ**

**132302104**

**Yüksek Lisans Tezi**

**Danışman**

**Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN**

**Bingöl-2019**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Sevim Hatun SÜRÜCÜ tarafından hazırlanan ***Lêkolînek Li Ser Çîrokên Osman Sebrî Yên Di Hawarê û Ronahî De*** başlıklı bu çalışma, **14.06.2019** tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *[oybirliği ile/ oy çokluğu ile]* başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından *[Kürt Dili ve Edebiyatı]* Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

**Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan** | : Doç. Dr. **Mehmet Zahir ERTEKİN** | İmza:............................ |
| **Üye** | : Dr. Öğr. Üyesi Üyesi **Canser KARDAŞ** | İmza:............................ |
| **Üye** | : Dr. Öğr. Üyesi **Bedrettin BASUĞUY** | İmza:............................ |

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun 03../05./ 2019 tarih ve 8-6. sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdunnasır SÜT

Enstitü Müdürü

# NAVEROK

**NAVEROK** .......... **I**
**KURTE** .......... **X**
**ÖZET** .......... **XI**
**ABSTRACT** .......... **XII**
**PÊŞGOTIN** .......... **XIII**
**LÎSTEYA GRAFÎK Û TABLOYAN** .......... **XVI**
**BEŞA YEKEM** .......... **6**
**1. JIYAN, BERHEM Û HUNERA OSMAN SEBRÎ** .......... **6**
**1.1. JIYAN** .......... **6**
1.1.1. Jidayîkbûn .......... 6
1.1.2.Xortanî û Perwerdehî .......... 6
1.1.3. Nasîna Mamoste Îsmaîl Efendî .......... 7
1.1.4. Zewac .......... 7
1.1.5.Çawa Navê “Apo” hat lêkirin .......... 8
1.1.6.Wefat .......... 8
**1.2.BERHEM** .......... **9**
1.2.1. Berhemên Wî Yên Di Saxîtiya Wî De Wekî Pirtûk Çapkirî .......... 9
1.2.1.1.Derdên Me .......... 9
1.2.1.2.Bahoz .......... 9
1.2.1.3.Çar Leheng .......... 10
1.2.2.Berhemên Wî Yên Piştî Wefata Wî Wekî Kitêb Hatine Çapkirin .......... 10
1.2.2.1.Dîwana Osman Sebrî: .......... 10
1.2.2.2.Hevalê Çak: .......... 10
1.2.2.3.Alfabeya Kurdî: .......... 10
1.2.2.4.Şerên Sasonê, 1925- 1937: .......... 10
1.2.2.5. Bîranînên Osman Sebrî: .......... 11
1.2.3. Berhema Wî Ya Çapnebûyî: .......... 11
1.2.3.1.Wergera Romana Dê: .......... 11
1.2.4.Berhemên Wî Yên Di Kovaran De Weşandî .......... 11
1.2.4.1.Berhemên Wî Yên Di kovara *Hawar*ê De .......... 12
1.2.4.2.Berhemên Wî Yên Di Kovara *Ronahi*yê De .......... 14
1.2.4.4.Berhemên Wî Yên Di Kovara *Hêviya Welêt* De .......... 18

1.2.4.3.Berhemên Wî Yên Di Kovara “Hêvî”yê De ..... 19
**1.3.HUNERA OSMAN SEBRÎ ..... 21**
1.3.1. Helbestvanî ..... 21
1.3.2. Çîroknivîsîn ..... 25
1.3.3.Sehitî ..... 27
1.3.4.Bîranîn ..... 28
1.3.5.Gotarnivîsîn ..... 28
1.3.6.Wergêrî ..... 29
**BEŞA DUYEM ..... 31**
**2. LÊKOLÎNEK LI SER ÇÎROKÊN OSMAN SEBRÎ ..... 31**
**2.1.LI GORISTANEKE AMEDÊ ..... 35**
2.1.1.Hêmanên Materyal ..... 37
2.1.1.1.Vegêr ..... 37
2.1.1.2. Awayê Nêrînê ..... 38
2.1.1.3. Rêzebûyer ..... 39
2.1.1.1.4. Leheng ..... 40
2.1.1.5. Dem ..... 43
2.1.1.6. Mekan ..... 44
2.1.1.7. Ziman û Şêwe ..... 45
2.1.1.8.Raman-Tema ..... 46
2.1.2.Hêmanên Teknîkî ..... 47
2.1.2.1. Rêbaza Vegotinê ..... 47
2.1.2.2.Teswîr ..... 47
2.1.2.3.Diyalog ..... 48
2.1.2.4.Teknîka Otobiyografîk ..... 49
2.1.2.5. Leîtmotîv ..... 49
**2.2. ŞÎNA JINEKÊ ..... 50**
2.2.1. Hêmanên Materyal ..... 51
2.2.1.1 Vegêr ..... 51
2.2.1.3. Awayê Nêrînê ..... 52
2.2.1.4. Rêzebûyer ..... 52
2.2.1.5. Leheng ..... 55
2.2.1.6. Dem ..... 56

2.2.1.7. Mekan ........ 56
2.2.1.8. Ziman û Şêwe ........ 57
2.2.1.8. Raman-Tema ........ 57
2.2.2.Hêmanên Teknîkî ........ 59
2.2.2.1. Diyalog ........ 59
2.2.2.2.Teswîr ........ 59
2.2.2.3.Monolog ........ 60
**2.3.TERŞÊ ŞEVÊ ........ 62**
2.3.1.Hêmanên Materyal ........ 63
2.3.1.1. Vegêr ........ 63
2.3.1.2. Awayê Nêrînê ........ 64
2.3.1.3. Rêzebûyer ........ 64
2.3.1.4. Leheng ........ 65
2.3.1.5. Dem ........ 66
2.3.1.6. Mekan ........ 67
2.3.1.7. Ziman û Şêwe ........ 68
2.3.1.8. Raman-Tema ........ 69
2.3.2.Hêmanên Teknîkî ........ 70
2.3.2.1.Rêbaza Vegotinê ........ 70
2.3.2.2.Teswîr ........ 70
2.3.2.3.Diyalog ........ 71
2.3.2.4.Teknîka Otobiyografîk ........ 71
**2.4. ŞÊXÊ BARZAN ÇAWA FIRANDIN ........ 72**
2.4.1.Hêmanên Materyal ........ 73
2.4.1.2. Vegêr ........ 73
2.4.1.3. Awayê Nêrînê ........ 74
2.4.1.4. Rêzebûyer ........ 74
2.4.1.5. Leheng ........ 75
2.4.1.6. Dem ........ 76
2.4.1.7. Mekan ........ 76
2.4.1.8. Ziman û Şêwe ........ 77
2.4.1.9. Raman-Tema ........ 78
2.4.2. Hêmanên Teknîkî ........ 78

2.4.2.1.Diyalog ........ 78
2.4.2.2.Teswîr ........ 79
2.4.2.3.Leîtmotîv ........ 79
**2.5. ŞEYTANQÛNÎ-1 ........ 80**
2.5.1.Hêmanên Materyal ........ 81
2.5.1.1. Vegêr ........ 81
2.5.1.2. Awayê Nêrînê ........ 82
2.5.1.3. Rêzebûyer ........ 83
2.5.1.4. Leheng ........ 84
2.5.1.5. Dem ........ 84
2.5.1.6. Mekan ........ 85
2.5.1.7. Ziman û Şêwe ........ 86
2.5.1.8. Raman-Tema ........ 86
2.5.2.Hêmanên Teknîkî ........ 87
2.5.2.1.Diyalog ........ 87
2.5.2.2.Teswîr ........ 88
2.5.2.3.Leîtmotîv ........ 88
**2.6.ŞEYTANQÛNÎ-2 ........ 88**
2.6.1.Hêmanên Materyal ........ 89
2.6.1.1. Vegêr ........ 89
2.6.1.2. Awayê Nêrînê ........ 90
2.6.1.3. Rêzebûyer ........ 90
2.6.1.4. Leheng ........ 90
2.6.1.5. Dem ........ 91
2.6.1.6. Mekan ........ 91
2.6.1.7. Ziman û Şêwe ........ 92
2.6.1.8. Raman-Tema ........ 92
2.6.2.Hêmanên Teknîkî ........ 93
2.6.2.1.Teswîr ........ 93
2.6.2.2.Diyalog ........ 94
**2.7. ŞÊYTANQÛNÎ-3 ........ 95**
2.7.1. Hêmanên Materyal ........ 96
2.7.1.1. Vegêr ........ 96

2.7.1.2. Awayê Nêrînê ........ 96
2.7.1.3. Rêzebûyer ........ 96
2.7.1.4. Leheng ........ 97
2.7.1.5. Dem ........ 97
2.7.1.6. Mekan ........ 98
2.7.1.7. Ziman û Şêwe ........ 98
2.7.1.8. Raman-Tema ........ 98
2.7.2.Hêmanên Teknîkî ........ 99
2.7.2.1.Diyalog ........ 99
**2.8. SEYÊ KO GUR TANÎ FÊZA PÊZ ........ 100**
2.8.1.Hêmanên Materyal ........ 102
2.8.1.1. Vegêr ........ 102
2.8.1.2. Awayê Nêrînê ........ 102
2.8.1.3.Rêzebûyer ........ 103
2.8.1.4.Leheng ........ 103
2.8.1.5.Dem ........ 104
2.8.1.6. Mekan ........ 104
2.8.1.7. Ziman û Şêwe ........ 104
2.8.1.8. Raman-Tema ........ 105
2.8.2.Hêmanên Tekînîkî ........ 106
2.8.2.1.Teswîr ........ 106
2.7.2.2.Diyalog ........ 106
**2.9. NÊÇÎRA HIRÇAN ........ 107**
2.9.1.Hêmanên Materyal ........ 108
2.9.1.1. Vegêr ........ 108
2.9.1.2. Awayê Nêrînê ........ 108
2.9.1.3. Rêzebûyer ........ 108
2.9.1.4. Leheng ........ 108
2.9.1.5. Dem ........ 109
2.9.1.6. Mekan ........ 109
2.9.1.7. Ziman û Şêwe ........ 109
2.9.1.8. Raman ........ 110
**2.10.MIST-AWIK ........ 111**

2.10.1.Hêmanên Materyal ..... 111
2.10.1.1 Vegêr: ..... 111
2.10.1.2. Awayê Nêrînê: ..... 112
2.10.1.3. Rêzebûyer ..... 112
2.10.1.4. Leheng ..... 113
2.10.1.5. Dem ..... 113
2.10.1.6. Mekan ..... 114
2.10.1.7. Ziman û Şêwe ..... 114
2.10.1.8. Raman-Tema ..... 115
2.10.2. Hêmanên Teknîkî ..... 116
2.10.2.1.Teswîr ..... 116
2.10.2.2. Diyalog ..... 116
**2.11.ŞÊREK BI DAREKÎ ..... 117**
2.11.1.Hêmanên Materyal ..... 118
2.11.1.1. Vegêr ..... 118
2.11.1.2.Awayê Nêrînê ..... 118
2.11.1.3. Rêzebûyer ..... 118
2.11.1.4. Leheng ..... 119
2.11.1.5. Dem ..... 120
2.11.1.6. Mekan ..... 120
2.11.1.7. Ziman û Şêwe ..... 121
2.11.1.8. Raman-Tema ..... 121
2.11.2. Hêmanên Teknîkî ..... 123
2.11.2.1.Diyalog ..... 123
**2.12. WARÊ MIN NE Î KOR E ..... 124**
2.12.1.Hêmanên Materyal ..... 125
2.12.1.1. Vegêr ..... 125
2.12.1.2. Awayê Nêrînê ..... 125
2.12.1.3. Rêzebûyer ..... 125
2.12.1.4. Leheng ..... 126
2.12.1.5. Dem ..... 127
2.12.1.6. Mekan ..... 127
2.12.1.7. Ziman û Şêwe ..... 128

2.12.1.8. Raman-Tema ... 128
2.12.2. Hêmanên Teknîkî ... 129
2.12.2.1. Diyalog ... 129
**2.13.PIRA GENDERÊ Û HEMÛŞÊ KULIK ... 130**
2.13.1. Hêmanên Materyal ... 130
2.13.1.1. Vegêr ... 130
2.13.1.2. Awayê Nêrînê ... 131
2.13.1.3. Rêzebûyer ... 131
2.13.1.4. Leheng ... 132
2.13.1.5. Dem ... 133
2.13.1.6. Mekan ... 133
2.13.1.7. Ziman û Şêwe ... 134
2.13.1.8. Raman-Tema ... 134
2.13.2.Hêmanên Teknîkî ... 135
2.13.2.1. Teswîr ... 135
2.13.2.2. Diyalog ... 135
**2.14. BERAZ Û BERAZÎ ... 136**
2.14.1.Hêmanên Materyal ... 137
2.14.1.1.Vegêr ... 137
2.14.1.2. Awayê Nêrînê ... 137
2.14.1.3. Rêzebûyer ... 137
2.14.1.4. Leheng ... 137
2.14.1.5. Dem ... 138
2.14.1.6. Mekan ... 138
2.14.2.Hêmanên Teknîkî ... 139
2.14.2.1.Teswîr ... 139
2.14.2.2. Diyalog ... 139
**2.15.MIJO Û XANÊ ... 140**
2.15.1.Hêmanên Materyal ... 140
2.15.1.1. Vegêr ... 140
2.15.1.2. Awayê Nêrînê ... 141
2.15.1.3. Rêzebûyer ... 141
2.15.1.4. Leheng ... 141

2.15.1.5. Dem........................................................................................ 142
2.15.1.6. Mekan ..................................................................................... 143
2.15.1.7. Ziman û Şêwe ......................................................................... 143
2.15.1.8. Raman-Tema........................................................................... 144
2.15.2. Hêmanên Teknîkî........................................................................... 144
2.15.2.1. Teswîr ..................................................................................... 144
2.15.2.2. Diyalog ................................................................................... 144
**ENCAM ................................................................................................. 146**
**ÇAVKANÎ ............................................................................................... 151**

# KURTE

Di vê xebatê de em li ser jiyan, berhem, huner û çîrokên Osman Sebrî rawestiyan, me çîrokên Sebrî yên di kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin ji aliyê hêmanên materyal (vegêr, awayê nêrînê, rêzebûyer, leheng, dem, cih, ziman û şêwe, raman) û hêmanên teknîkî (vegotin, teswîr, teknîka otobiyografîk, leîtmotîv, monolog, rêbaza paşve vegerînê û hwd.) ve vekola.

Xebata me ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem a tezê de em ji bîranîn, hevpeyvînên pê re hatine kirin û agahiyên xwendekarê Sebrî (Dîlawerê Zengî), nivîskar Firat Cewerî, keçên wî (Hingûr-Kewê Sebrî) û zavayê wî (Şêx Birimce) dan bi rê ketin û me hewl da ku em jiyana wî ji hemû aliyan ve nîşan bidin. Di dawiya beşê de me derheqê hemû berhemên Osman Sebrî yên berdest û yên neberdest de agahî dan. Osman Sebrî herçiqas bi kesayetiya xwe ya siyasî derbikeve pêş jî wî hema hema di hemû qadên wêjeyê de (helbest, çîrok, sihetî, gotar, bîranîn) berhem nivîsîne. Me berhemên Sebrî wekî bingeh qebûl kir û hewl da ku em hunera wî ji hemû hêlan ve bidin xuyakirin. Di beşa duyem de ku beşa sereke ya xebata me ye çîrokên Sebrî yên di kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin ji aliyê hêmanên vegêranê yên wekî awayê nêrînê, mekan, dem, leheng û rêzebûyerê ve hatin nirxandin. Herweha li ser mijar û tema, ziman û taybetiyên vegêranê yê van çîrokan hate rawestin.

Di encama xebata xwe de me agahiyên ku piştî nirxandina çîrokên Osman Sebrî bi dest ketin, made bi made hatin rêzkirin.

**Bêjeyên Sereke:** Jiyana Osman Sebrî, berhem, huner, çîrok, vekolîn, Hawar, Ronahî, ekola Şamê.

# ÖZET

Bu çalışmada Osman Sebri'nin *Hawar* ve *Ronahi* dergilerinde yayımlanan hikâyeleri materyal (anlatıcı, bakış açısı, olay örgüsü, kişiler, zaman, mekan, dil ve üslup, fikir) ve teknik unsurlar (anlatma, tasvir, otobiyografîk, leitmotiv, diyalog, monolog, geriye dönüş tekniği vb.) yönünden ele alınarak incelenmiş, her hikaye tek tek değerlendirilerek Sebri'nin hikaye sanatı ortaya konulmuştur.

Çalışmamız iki bölümden oluşmaktadır. İlk bölümde Osman Sebri'nin anılarından, onunla yapılan röportajlardan ve öğrencisi (Dilawerê Zengî), yazar Fırat Ceweri nin ve kızı (Hingûr Sebrî) verdiği bilgilerden yola çıkarak hayatını her yönüyle açığa çıkarmaya çalıştık. Bölümün sonunda Osman Sebri'nin ulaşabildiğimiz bütün eserlerini ve ulaşamadıklarımız hakkında bilgi verdik. Osman Sebri her ne kadar siyasi kişiliğiyle ön plana çıksa ve tanınsa da o edebiyatın hemen hemen her dalında (şiir, hikâye, deneme, makale, anı) eser vermiştir. Bölümün devamında eserlerinden yola çıkarak edebi yönünü ifadeye etmeye çalıştık. Çalışmamızın ikinci bölümünde *Hawar* ve *Ronahi* dergilerinde yayımlanan hikâyelerini anlatıların unsurları olan, bakış açısı, mekân, zaman, kişiler ve olay örgüsü açısından ele alınmış; ayrıca bu eserlerin, konu ve tema, dil ve anlatım özellikleri üzerinde durulmuştur.

Çalışmamızın sonuç bölümünde Osman Sebrinin hikâyeleri madeler halinde değerlendirilmiştir.


**Anahtar Kelimeler:** Osman Sebri, Hayatı-Eserleri-Sanatı, Hikâye, İnceleme, Hawar, Ronahi, Şam Ekolü

# ABSTRACT

In this study, Osman Sebri's life and art are emphasized; and his stories published in *Hawar* and *Ronahi* journals are examined in terms of structure with regards to material (narrator, point of view, plot, characters, time, place, linguistics, wording, and idea) and technical elements (storytelling, depiction, autobiographic, leitmotiv, dialogue, monologue, flashback, etc.).

Our study consists of introduction, two chapters. In the first chapter, we uncovered Osman Sebri's life in many aspects by his memoirs, interviews with him, and the reports given by his student (Dilawerê Zengî), writer Fırat Ceweri, his daughters (Hingûr-Kewê Sebrî), and his son-in-law Şêx Birimce. At the end of this chapter, we wrote about all of his works that we could and could not find today. Although Osman Sebri is known by his political roles, he had wrks in almost every fields of literature (poem, story, essay, article, and memoirs), we analyzed his literary aspects based on his works. In the two chapter, his stories published in Hawar and Ronahi journals are addressed in terms of story elements such as point of view, place, time, characters, and plot. Also, these stories are examined in terms of subject, theme, and language and expression properties.

In the conclusion part, based on the conclusions made by studying the structure of Osman Sebri's stories, his stories are evaluated and reported in items.



**Key Words:** Osman Sebri's life-works-art, story, study, *Hawar, Ronahi*, Şam School

# PÊŞGOTIN

Osman Sebrî nîvîskarekî girîng û berhemdar ê kovara *Hawar* û *Ronahi*yê ye. Ne tenê helbest di heman demê de çîrok, gotar, bîranîn, sihêtî, jînenîgarî nivîsîne û werger kirine. Heta dawiya emrê xwe li ser ziman û edebiyatê xebitiye. Xwestiye zimanê Kurdî bi pêş bikeve û bi vê armacê gelek berhem dane.

Heta niha vekolînek li ser hemû çîrokên Osman Sebrî nehatiye kirin. Me di vê xebata xwe de hewl da ku em ji aliyê binyadê ve vekolînekê li ser çîrokên nivîskar bikin ku di kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin. Hêviya me ew e ku ev xebat di qada lêkolînên li ser edebiyata Kurdî de, bi taybetî di qada nirxandina kurteçîrokan de bibe çavkaniyek sûdewar.

Teza me ji du beş û encamê pêk tê. Me di beşa yekem de cih da jiyan, berhem û hunera Osman Sebrî. Ji ber ku Osman Sebrî di çîrokên xwe de pir zêde cih daye bîranîn, jiyana eşîriyê pêwîst bû em jiyan û jiyana eşîr û herêmê bidin nasîn. Piştî vê em bi gelemperî li ser hunera Osman Sebrî rawestiyan. Di beşa duyem de ku beşa sereke ya teza me ye, me panzdeh çîrokên Osman Sebrî yên di kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin ji aliyê binyadê ve vekola. Me berê pêşîn ji aliyê mijarê ve çîrok senifandin ku berî me Heyder Omer jî ev senifandin kiribû. Dema ku me çîrok nirxandin, ewil me kurteya çîrokê da paşê jî me çîrok ji hêla hêmanên materyal û hêmanên teknîkî ve di bin du serenavan de veçirandin. Di bin serenavê hêmanên materyal de em li ser vegêr (*narrator*), awayê nêrînê (*point of view*), rêzebûyer (*plot*), leheng (*character*), dem û cih (*setting*), ziman û şêwe û ramanê rawestiyan. Di bin serenavê hêmanên teknîkî de me rê û rêbazên vegêranê (*narration*) yên wekî diyalog, teswîr, teknîka otobiyografîk, leîtmotîv, monolog, rêbaza paşva vegerînê (*flashback*) nirxandin. Di encamê de pêzanînên piştî lêkolînê derketin holê, hatin berpêşkirin.

Ji ber ku di qada teoriya roman û çîrokê de heta niha zêde kitebên Kurdî nehatine çapkirin me ji kitabên Tirkî û yên ji Îngilîzî bo Kurdî hatine wergerandin sûd wergirt, wergerandina ji hin beşên kitêban barê xebata me girantir kir.

Ez spasdarê mamoste û şêwirmendê xwe Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN im, ew bi rêberî û alîkariya xwe xalên tarî yên li pêşiya min ronî kirin. Spasiyên taybet bo Abdullah KOÇAL ku di komkirina çavkaniyan de alîkariyên wî ji bîr nakim.

Spasdarê Doç. Dr. Abdulkadir SÜRÜCÜ, Heyder ÖMER, Dîlawerê ZENGİ, Firat CEWERÎ, Hingûr SEBRÎ, Kewê SEBRÎ, Şêx BIRIMCE, Ebubekir GÖREN, Ümran ARAN im ku di pêvajoya nivîsîna tezê de gelek alîkariya wan gihîşt min.

Sevim HATUN SÜRÜCÜ

Çewlîg, 2019

KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **Bnr.** | Binêre |
| **c.** | Cild |
| **ç.** | Çap |
| **j.** | Hejmar |
| **h.b.** | Heman berhem |
| **h.g.** | Heman Gotar |
| **H.h.** | Heman Hevpeyvîn |
| **Hwd.** | Her wekî din |
| **r.** | Rûpel |
| **wer.** | Wergêr |
| **Weş.** | Weşan |
| **Yay.** | Yayın |
| **çev.** | Çeviren |

# LÎSTEYA GRAFÎK Û TABLOYAN

## LÎSTEYA GRAFÎKAN

**Grafik 1:** Li Gor Cureyê Hejmara Berhemên Wî yên di Kovaran de ........................ 20

**Grafik 2:** Li Gor Cureyê Rêjeya Berhemên Wî yên di Kovaran de........................... 20

## LÎSTEYA TABLOYAN

**Tablo 1:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Hawarê de hatine weşandin .......... 12

**Tablo 2:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Ronahiyê de hatine weşandin ....... 15

**Tablo 3:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Hêviya Welêt de hatine weşandin. 18

**Tablo 4:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Heviyê de hatine weşandin ........... 19

**Tablo 5:** Çîrokên Osman Sebrî li gor mijarê ev in .................................................... 32

**Tablo 6:** Çîrokên Osman Sebrî li gor mijarê ev in .................................................... 33

**Tablo 7:** Çîrokên hatin analîzkirin li gor kovara tê de hatine weşandin ................... 34

## DESTPÊK

### Hawar

*Hawar*, yekemîn kovara Kurdî ya bi tîpên latînî ye. Di kovara *Hawar*ê de yekem car di tarîxa Kurdan de zimanê Kurdî bi tîpên latînî hatiye nivîsandin û ji ber vê yekê cihekî taybet ê kovarê di pêşveçûn û standartkirina zimanê Kurdî de heye. Mehmet Uzun dibêje *Hawar*ê ziman û edebiyata Kurdî di bin rewşên dijwar de parast û pêş ve bir. Wê rê da gelek navên Kurdî ku bibin hozan, nivîskar û qelemşor. Ji ber vê yekê gava mirov qala edebiyata Kurdî ya nûjen dike ev ekol tê bîra mirov. Edebiyata me ya nûjen û navê *Hawar* û nivîskarên wê bi hev re bûne yek.

Hawar ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve dihat weşandin. Bedirxan serok, plançêker û sernivîskarê kovarê bû û navên din ên ekolê li dora wî civiyabûn, "Lê kesê ku heval hogir û şagirtê wî bû û pê re dimeşiya, bi her awayî alîkarî li kovarê dikir, Osman Sebrî bû. Osman Sebrî navê duduyan ê vê ekole bû."[1] Ji bilî Osman Sebrî wê serdemê navên wekî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Qedrîcan, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza derdikevin pêş.

*Hawar* û weşanên Celadet û Kamûran li ser tradîsyona rojnameya yekemîn Kurdistanê diçin. Ev rojnamevaniya Kurdî jêdereke dewlemend e ji bo lêgerînên siyasî, lîteratûrî, dîrokî, çandî, zimanzanî, etnografî, derûnî, nefsî û hwd.[2] Herweha, "Materyalên *Hawar*ê jêderinê ecêb dewlemend, piralî û balkêş in, eger mirov lê bikole, wê tenga pêşketina hişyariya civakî ya gelê Kurd di salên sî û çelî de ji vê sedsalê tê bigihne, wê bi kûranî di nav kêşeyên siyasî, civakî û yên lîteratûrî wê serdemê keve."[3]

### Ronahî

Kovara Ronahiyê bi birêvebirêya Celadet Alî Bedir-Xan, li bajarê Şamê, di 1ê nîsana 1942yan de bi îbareya Fransî "Supplément Illustré de la Revue Kurde Hawar" ango "Pêveka wêneyî ya Kovara Kurd *Hawar*ê" dest bi weşanê dike. Ronahî wekî pêveka wêneyî ya kovara *Hawar*ê derketiye û a rastî jî bi wêneyan tijî ye.

---

[1] Mehmed Uzun, *Hêz û Bedewiya Pênûsê*, Weşanên Nûdem, Swêd, 1989, r. 9-17

[2] Husên Hebes, *Raperîna çanda Kurdî di kovara Hawarê de*, Belavgeha Hogir, Bonn 2007, r.18-23

[3] Husên Hebes, *h.b.*, r.7.

Gava ku jimara pêşîn a *Ronahi*yê di 1ê nîsana 1942yan de derdikeve *Hawar* deh salî ye û jimara wê ya 42yan çap dibe. *Hawar*, di tarîxa Tebaxa 1943yan de bi jimara xwe ya 57an dawî li weşana xwe tîne. Di vê tarîxê de *Ronahî* gihîştiye jimara xwe ya 17an. Celadet bi Hawarê re 17 jimarên *Ronahi*yê diweşîne. *Ronahî* heta jimara 28ê û dema Şerê Cîhanê yê Duyem ê 1945ê weşana xwe dewam dike.

Ronahî di warê edebiyat û ziman de xwedî rûmeteke bilind e. Gotar, çîrok, helbest û stranên tê de di edebiyata Kurdî de ciyekî payebilind girtine. Bi kurtî Ronahî wekî kovareke kulturî û niştimanî, hem di dîroka têkoşerî ya Kurdistanê de hem di dîroka rojnamegeriya Kurdî de xala werçerxê ye.

Nivîskarên Ronahiyê yên ku derdikevin pêş Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Xelîlê Genco, Ehmed Namî, Silêamê Ferho, Ûsif Hecîersan, Hesenê Miştê, Bişarê Segman, Mela Enver, Cemîlê Tacdo, Evdirehmanê Eliyê ûnis, Îhsan Nûrî, Hesen Hişyar in.

Nivîskarê ku di kovaran de, şanenava wî herî pir derbas dibe Osman Sebrî ye. Di Kovara *Hawar*ê de 37, di Ronahiyê de 40 nivîsên wî hatine weşandin.

Wekî ku me li jorê behsa jimara nivîsên wî yên ku di *Hawar* û *Ronahiyê* de hatine weşandin kir, em karin bibêjin ku wî jiyana xwe daye ser ziman û wêjeya Kurdî, wekî “makîneyeke nivîsê” xebitiye.

**Giringiya Mijarê**

Osman Sebrî yek ji nivîskarên Ekola Hawarê yê pir-hêl e, gelek berhemên cureyên wan ji hevûdin cuda dane. Herçiqas jiyaneke bi zor û zehmet li pêş bûye jî bi xîret û hewla xwe xwe bi xwe gihandiye, him di nav gelê xwe de wekî mirovekî ji gel jiyaye him jî wekî nivîskarekî navê xwe belav kiriye. Berhemên xwe ne bi armanceke edebî ji bo şiyarkirin û perwerdekirina gelê xwe, bi zimanekî sade û zelal nivîsiye.

Wextê em li ser berhemên Osman Sebrî hûr û kûr dibin, dibînin ku wî berhemên xwe ji civakê re kiriye neynik jiyana civakî û eşîrî, tarîx û cografyaya ku Kurd lê dimînin; nêçîr, koçerî, heywandarî, cotkarî di çanda Kurdan de nîşan daye. Herweha bi vê jî nemaye xurafe û baweriyên pûç ên di nav civakê de bi şêweyeke trajî-komîk, bi zimanekî herikbar û sade daye der, rexne lê girtiye û rastî nîşanî civakê daye.

Osman Sebrî ku wekî “Apo” di nav Kurdan de navdar bûye mîr û axayên serdemê jî kiriye mijara çîrokên xwe. Bi lehengên xwe yên çîrokan hewl daye ku mêrxasî, nefsbiçûkî û dilêriya gelê Kurd û hemû rengên civakê bi realîzmeke xurt nîşan bide. Xwestiye bi hemû berheman jiyana civakî were nîşandan, çanda gel bê parastin, ji bo nifşên nû were neqilkirin. Di destpêka piraniya çîrokên xwe de wî bi xwe ev fikra xwe eşkere kiriye, gotiye armanca min bi nivîsîna vê berhemê ew e ku ev serpêhatî û çîrokên di nav gel de neyên jibîrkirin û ji bo nifşên nû bên veguhastin.

Di çîrokên xwe de zimanekî sade, herikbar û siruştî bi kar aniye, çîrokên xwe carinan di destpêkê de carinan di ortê de daye rawestandin û agahî dane xwînerên xwe ku ev yek jî wekî kêmasî tê nirxandin û rexne lê tê girtin. Herçiqas ev aliyê wî wekî kêmasî bê nirxandin jî samimiyeta wî nîşan dide. Ev yek jî wî zêdetir nêzîkî xwînerên wî dike û wî bi wan dide hezkirin. Aliyekî wî yê balkêş ê çîrokên wî jî ew e ku hema hema di her çîroka xwe da peyamek daye, şîretek li xwînerên xwe kiriye.

Osman Sebrî digel çîrok û helbestan, sehitî, gotar nivîsîne, li ser ziman xebitiye û werger kirine. Digel nivîskarên Ekola Hawarê hîmên edebiyata modern daniye. Ji nivîskarên me yên îro re digel hev bingehek avakirine.

**Armanc û Çarçove**

Di vê tezê de li ser çîrokên Osman Sebrî xebat hatiye kirin ku di Kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin. Bi vê xebatê armanc ew e ku çîrokên Osman Sebrî bên analîzkirin û di qada edebiyata nûjen a Kurdî de ev bibe gavek. Lewre herçiqas gelek çîrok, roman hatibin nivîsîn û xebatên tomarkirinê hatibin kirin jî di qada analîzê xebat kêm in. Hêvî ew e ku ev pêl fireh bibe û di vê qadê de zêdetir xebat bên kirin.

Ev tez ji du peşan pêk tê. Di beşa yekem de jiyana Osman Sebrî bi kurtasî hatiye dayin. Lewre piraniya berhemên Sebrî otobiyografîk in, bêyî zanîna jiyana wî tehlîl û analîzkirina wan ne mimkin e. Ji ber ku Osman Sebrî di çîrokên xwe de cih daye jiyan, bûyerên siyasî, cografya, jiyana eşîriyê em jî li ser van sekinîn. Ji bo em hûrgiliyên jiyana wî baştir hîn bibin me bi xwendekar, malbat û nivîskaran re hevpeyvîn kirin ku ew baş nas dikirin. Herweha me cih da hemû berhemên Osman Sebrî yên di kovaran de û yên wekî pirtûk hatine çapkirin û me bi kurtasî behsa

hunera Sebrî kir. Di bin beşa hunera Osman Sebrî de me behsa helbestvanî, çîroknîvîsîn, sihetî, bîranîn, gotarnîvîsîn, wergêriya wî kir.

Di beşa duyem de ewil hemû çîrokên Osman Sebrî ên hatin tehlîlkirin li gor mijarê hatin senifandin û wekî tablo hatin nîşandan. Paşê çîrok ji aliyê hêmanên materyal ên wekî vegêr (*narrator*) awayê nêrînê (*point of view*), rêzebûyer (*plot*), leheng (*character*), dem û cih (*setting*), ziman û şêwe, raman û hêmanên teknîkî ên wekî vegêran (*narration*), teswîr, teknîka otobiyografîk, leitmotiv, monolog, rêbaza paşve vegerînê (*flashback*) û hwd. ve hatin tehlîlkirin. Di vê beşê de berî tehlîlê her term bi kurtasî hate pênasekirin, paşê li ser çîrokê hate tetbîqkirin û li ser çîrokan şîrove hatin kirin.

**Çavkanî û Rêbaz**

Ev xebata ku ji bilî pêşgotin, destpêk û encamê ji du beşan pêk tê li ser jiyan, berhem, huner, pênase, tehlîl û analîzê hatiye avakirin. Di qada analîz û tehlîlên berhemên Kurdî de, di qada teoriya roman û çîrokan de xebatên akademîk kêm in, ev kêmasî wekî astengî derketin holê. Lê dîsa jî wextê ku ev xebat hat amadekirin hin çavkaniyên Kurdî bûn bingeha vê tezê. Ji bilî çavkaniyên kurmancî, çavkaniyên Tirkî û yên ji îngilîzî bo Tirkî hatine wergerandin bi kêrî me hatin.

Piştî ku mijara tezê hat tespîtkirin, çavkanî hatin berhevkirin û peyderpey hatin xwendin. Paşê bi malbat, xwendekar û nivîskaran re peywendî hat danîn ku Osman Sebrî nas kirin, bi wan re hevpeyvîn hatin kirin. Ji hevpeyvînan sise bi rêya maîlê dudu jî rû bi rû hatin kirin. Ev hevpeyvîn bi taybetî di nivîsîna beşa yekem de bûn alîkar. Herweha çîrokên Osman Sebrî yên ku di beşa duyem a tezê de hatin tehlîlkirin yek bi yek bi hûgilî gelek caran hatin xwendin, dû re berhemên teoriya roman û çîrokan, çîrokên ku hatin tehlîlkirin hatin xwendin. Paşê aliyên taybet û hevpar ên çîrokan hatin tespîtkirin û bi rêya fîşan ev hatin nîşandan. Herî dawî di roniya berhemên teorîk de ev hatin tehlîlkirin.

Di beşa yekemîn a ku tê de behsa jiyan berhem û hunera Osman Sebrî hat kirin çavkaniyên sereke *Bîranînên Osman Sebrî*, antolojiya Qanatê Kurdo a bi navê *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, berhema Feqî Huseyîn Sagniç a bi navê *Dîroka Wêjeya Kurdî*, berhema Mehmet Uzun a bi navê *Kürt Edebiyatı Antolojisi* bûn ku rêya me ronî kirin. Hevpeyvînên me digel *Hingûr, Kewê, Şêx Mihemed Birimce, Dîlawerê*

*Zengî, Firat Ceweri* kirin deriye jiyana Sebrî li ber me heta dawiyê vekirin. Ji bo berhemên Osman Sebrî Kovara *Hawar û Ronahiyê* ji me re bûn du çavkaniyên sereke. Ji bilî van kovara *Hêvî, Hêviya Welat, Roja Nû* û hemû berhemên çapkirî kêrî me hatin. Herweha xebata Dilawerê Zengî ya bi navê Osman Sebrî (1905-1993*),* berhema Heyder Omer ku wekî PDF ji me re şand a bi navê *Osman Sebrî Helbestvan û Nivîsevan,* teza Amed û Zîn a bi navê *Welatparêzê Hêja Apo, (Hevpeyvînên salên 1984-1988an*), berhema *Bîranîn:100 Saliya Osman Sebrî (ev xebat bi minasebeta sedsaliya Osman Sebrî hatiye amadekirin)* jî bi kêr hatin. Dîsa di vê beşê de wextê behsa helbestvanî û çîroknûsiya Osman Sebrî hat kirin *Kovara W*yê ku hejmara wê ya 51ê li ser Osman Serbî bû ji min re bû alîkar. Bi taybetî gotara Mem Bawer, *"Li Goristaneke Amedê Xewna Azadiyê"* û gotara Berken Bereh a bi navê *"*Osman Sebrî*"* kêrî min hatin.

Di beşa duyem de jî lêkolînek li ser çîrokên Osman Sebrî hat kirin. Ev beş ji danasîn, têgeh, analîz û tehlîla çîrokan pêk tê. Ji bo vê qismê çavkaniyên me yên sereke Kovara *Hawar* û *Ronahi*yê û hemû berhemên Osman Sebrî bûn. Ji bilî van me xebatên li ser teoriyê jî sûd wergirt ku di edebiyata Tirkî de jî wekî xebatên bingehîn tên qebûlkirin. Ji van berhema Şerif Aktaş a bi navê *Edebi Metinlerin Tahlili û Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş,* berhema Mehmet Kaplan a bi navê *Hikaye Tahlilleri,* berhema Mehmet Tekin a bi navê *Roman Sanatı*, berhema İsmail Çetişli a bi navê *Metin Tahlillerine Giriş/2*, berhema Foster a bi navê *Roman Sanatı,* berhema Remezan Alan a bi navê *Zanista Edebiyata Modern* ji min re bûn alîkar ku ez vê beşê binivîsim.

**Sînor û Zehmetiyên Tezê**

Osman Sebrî nivîskarekî berhemdar e. Hema hema di her cureyî de berhem dane. Piraniya berhemên wî berî ku wekî kitêb werin çapkirin di kovaran de hatine weşandin. Ji ber ku ji kovarên berhemên wî tê de hatine weşandin hinek ne li Tirkiyeyê li Sûriye, Swêd, Almanyayê hatine çapkirin, li Tirkiyeyê çapên wan bi destê me neketin û me digel lêkolîn û pêwendiya bi malbata Sebrî re danî jî ev bi dest nexistin. Di beşa duyem a vê xebatê de me çîrokên Osman Sebrî analîzkirin. Ji ber ku berhemên li ser teoriya roman û çîrokê yên Kurdî kêm bûn em mecbur man berhemên Tirkî bixebitînin. Me jêgirtinên ji berhemên Tirkî bo kurmancî wergerand, vê yekê barê me girantir kir.

# BEŞA YEKEM

# 1. JIYAN, BERHEM Û HUNERA OSMAN SEBRÎ

## 1.1. JIYAN

### 1.1.1. Jidayîkbûn

Osman Sebrî di 7ê çileya paşîna 1905an de li gundê Narincê ji dayîk bûye.[4] Ev eşîra koçer di navbera Meletî-Riha-Sêwreg-Semsûrê de ye. Bavê wî serekeşîr bû.[5] Osman Sebrî di bîranînên xwe de dibêje: "Bavê min Sebrî serekê eşîra Mirdês bû. Ev eşîr ji emareta Mirdêse ku li ser rêya koçeriyê hatiye di bin hêla çiyayê Bellî ku bi Çiyayê Nemrûd hatiye nasîn de bi cih bûye."[6]

Zarokên diya Osman Sebrî hetanî 5 salan çênebûne. Ji ber vê yekê Osman Sebrî zaf bi qîmet bûye. Lê di bîranîn xwe de dibêje ku wextê ji dayîkbûye pirî ku biçûk û qels bûye dê û bavê wî ne wekî dê û baveke normal bi bûyîna wî kêfxweş bûne: "Ew çend ez biçûk û qels hatime ku wek zarokên nîvco ji jiyîna min bi sibehê bûne. Eger berî min ji wan re zarokin hatibûna, heye ku qîma xwe bi xwedîkirina min neanîna. Lê tinebûn û nehatina zarokan hiştiye ku serê xwe bi xwedîkirina min re biêşînin."[7]

Sagniç ji bo Osman Sebrî dibêje "Navê wî Osman e, lê bi vî navî hîç nehatiye nasîn. Navê bavê wî ne wekî bernav, bûye wekî navê wî yê xweserî."[8]

### 1.1.2.Xortanî û Perwerdehî

Osman Sebrî piştî mirina bavê xwe, li ber destê apê xwe Şukrî mezin dibe. Şukrî Axa wî li gor rê û rêbazên eşîrtiyê dide xwendin. Lê hertişt ne li gor daxwaza Şukrî Axa bi rê ve diçe. Berî her tiştî li herêma lê dimînin mamoste tune ye.[9] Di sala 1917an de mamosteyek tê gund. Osman Sebrî wê salê destûrnameya xwendina pêşîn

---

[4] M. Mele Ahmed, "Çend Gotin Li Ser Rêzaniya Apo Osman Sebrî", *Bîranîn:100 Saliya Osman Sebrî* Berlîn, 2005, r.47.

[5] Osman Sebrî, *Bîranînên Osman Sebrî*, Weşanên Aram, Stenbol, 2004, r.9.

[6] Sebrî, *h.b.*, r.9.

[7] Sebrî, *h.b.*, r.10.

[8] Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1992, r.544.

[9] Sebrî, *h.b.*, r.34.

bi dawî tîne. Piştî salekê apê wî, wî dişîne Kexteyê, xwendingeha Rişdiyê, sê salan li wê derê dixwîne. Di 1920î de destûrnameya Rişdiyeyê distîne û vedigere malê.[10]

### 1.1.3. Nasîna Mamoste Îsmaîl Efendî

Îsmaîl Efendiyê mamosteyê Osman Sebrî ji ber ramanên xwe yên siyasî ji dibistanê tê dûrxistin û wî dişînin gundê Narincê. Osman Sebrî wî di hejdeh saliya xwe de li wê derê nas dike. Fikr û ramanên Sebrî û yên Îsmaîl Efendî dijberên hev in. Lê Îsmaîl Efendî bandoreke mezin lê dike: "Vî camêrî han çavên min li ser kirêtiya rêzana derebegtiyê vekir. Hînga min ji apê xwe xwest rê bide min ji nav eşîrê derkevim biçim di bajarekî de rûnim."[11]

Osman Sebrî dev ji rêya xwe bernade, roj bi roj kirêtiyên rêzana eşîriyê bêtir dibîne. Êdî nikare di nav eşîrê de bimîne: "Gotinan bi hêsanî li min kar nedikir, ez bi can û cendekê xwe bibûm perçeyek ji rêzana derebegiyê ya kevnar."[12]

### 1.1.4. Zewac

Di sala 1922yê de, di hevdeh saliya xwe de wekî her kesekî eşîr, ew jî zû dizewice.[13] Xanima wî ya ewil dotmama wî Eyşê ye. Ji vê zewacê 3 lawên wî çêdibin, 2 ji van zû dimirin, yê siseyan ku navê wî Welat e, di destpêka sala 1970ê de, li Bakurê Kurdistanê, di temenê 47 salî de tê kuştin.

Osman Sebrî di sala 1944an de cara duyemîn dizewice, zewaca vê carê bi xanimeke esilçerkez re ye. Navê wê Şadiye ye. Ji vê jinê jî bi navê Hoşeng, Hoşîn, Heval, Hingur û Hêvî; 3 kur û 2 keçên wan çêdibin. Kebaniya wî ya duyem û dawî di sala 1986an de diçe ser dilovaniya xwe.

Ji bilî zarokên Osman Sebrî Kewê jî wekî qîza Sebrî tê nasîn, li cem wî mezin dibe, heta dawiya emre xwe li cem dimîne ne qîza wî ye, qîza birayê wî Şewket e.[14]

---

[10] Sebrî, *h.b.*, r.35.

[11] Sebrî, *h.b.*, r.36.

[12] Sebrî, *h.b.*, r.36.

[13] Sebrî, *h.b.*, r.35.

[14] Dilawerê Zengî, *Osman Sebrî (1905-1993)*, Çapemeniya Emîral, Libnan, 2012, r.12.

### 1.1.5.Çawa Navê “Apo” hat lêkirin

Sebrî ne wekî Osmanê Sebrî wekî Apo hertim hatiye nasîn û wisa hatiye binavkirin. Osman Sebrî dibêje ez ji mala axayan im; lê min tu carî nedixwest bi navê axa bang li min bikin. Jina Celadet ji bo min nexeyîdîne ji min re digot “Apo” û navê min wisa wekî “Apo” ma.[15]

Peyva “apo” di nav civaka Kurdan de rêzgirtinê nîşan dide: “Ji hêlekê din ve ji ber rêzgirtin û rêzdariya kesîniya Osman Sebrî her kesî bi navê ‘Apê Osman’ bang dikirê. Nemaze xanima hêja Rewşen Bedirxan.”[16]

Der û dora Sebrî jê re nedigotin Osman Sebrî, digotin apo, ev nîşaneya rêzgirtin û rûmetê ye. Sebrî, him apê edebiyat him apê tevgera Kurd e.[17]

### 1.1.6.Wefat

Osman Sebrî heta dawiya emrê xwe li Şamê bû û heta dawiya emre xwe bi xwendin û nivîsandinê re mijûl bû: “Belê heta dikaribû bi xwendin û nivîsandinê dema xwe derbas dikir.”[18]

Bi Osman Sebrî re nexweşiya dil hebû. Di 11ê kewçêra 1993yan de, di 89 saliya xwe de li Şamê çû ser dilovaniya xwe.

Kewê, heta wefata Osman Sebrî li ber serî bû: “Wexta wefat kir ez, cîran, heval û xwendekarên wî tev em li cem bûn.”[19]

---

15 Amed û Zîn, *Welatparêzê Hêja Apo*, Hevpeyvînên salên 1984-1988an Parîs, 1991, kaset 7, r.90.

16 Zengî, *h.b*., r.20.

17 Mehmet Uzun, *Kürt Edebiyatı Antolojisi*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2009, r.335.

18 Sevim Hatun Sürücü, “Hevpeyvînek Digel Hîgur Sebrî*”*, 03 Tîrmeh 2017, (maîl).

19 Sevim Hatun Sürücü, “Hevpeyvînek Digel Kewa Sebrî*”*, 03 Tebax 2017, (rû bir û).

## 1.2.BERHEM

### 1.2.1. Berhemên Wî Yên Di Saxîtiya Wî De Wekî Pirtûk Çapkirî

#### 1.2.1.1.Derdên Me

Derdên Me, di sala 1956ê de li Şamê, ji aliyê weşanxaneya Compte d'auteurê ve hatiye weşandin. Di pirtûka ji 34 rûpelî de 3 helbest û 7 metn hene. Helbestên di vê berhema çapkirî de, di heman demê de paşê di "Dîwana Osman Sebrî" de jî hatine weşandin. "Kolegîrêya Ramanê (1)", "Ziman di Jîna Miletan de", "Raman", "Welatparêzî û Fedakarî" di kitêba bi navê "Hevalê Çak" de hatine weşandin.

Pirtûk, bi pêşgotinê dest pê dike ku ji aliyê Osman Sebrî ve hatiye nivîsîn. Sebrî di pêşgotina wê de sebebê nivîsîna pirtûkê bi kurtasî vedibêje: "Ji lewre min xwest, bi van çend bendên ku di vê kitêbokê de belav dikim, kambaxtirîn nexweşiyên gelê xwe jê re salixdim. Eger bikarim hinekî bi vê yekê rabim dê xwe gelekî bextiyar bizanim."[20]

Nivîsên di Pirtûkê de, li gor rêzê:

1. Kolegîrêya Ramanê (1)
2. Ziman di Jîna Miletan de
3. Diçin Hec (helbest)
4. Raman (1)
5. Raman Çawan Vaca Dibe (2)
6. Newroz (helbest)
7. Welatparêzî
8. Fedakarî
9. Şêrê Sîrk (helbest)
10. Elîfbêya Kurdî

#### 1.2.1.2.Bahoz

Bahoz, di sala 1956an de ji aliyê weşanxaneya Compte d'auteurê ve hatiye çapkirin. Ev berhema Osman Sebrî bi tevahî 68 rûpel e. Ji 7 helbest û rûpela şaşiyên tê de bê hemdî hatine kirin pêk tê. Ji ber ku piştî wefata Osman Sebrî hemû

[20] Osman Sebrî, *Derdên Me*, Weşanên Compte d'auteurê, Şam 1956, r.1.

berhemên wî yên weşanên cuda tên tomarkirin û wekî kitêb tên çapkirin, helbestên vê berhemê jî dîsa di “Dîwana Osman Sebrî” de tên weşandin.

Helbestên di pirtûkê de, li gor rêzê ev in:

1. Bahoz
2. Bang
3. Jan
4. Ji dest bextê reş û hevalên şaş
5. Feleka Bêbext
6. Wefda Kurdî
7. Ho Xort

**1.2.1.3.Çar Leheng**

Ev pirtûk di sala 1984an da hatiye çapkirin. Weşanger û cihê weşanê diyar nînin. Pirtûk 40 rûpel e. Bi pêşgotineka Osman Sebrî ve dest pê dike. Piştre serpêhatiyên çar lehengan tê û di dawiya pirtûkê de ferhengokeke ji 7 rûpelan pêkhatî ya Kurdî, Tirkî, Erebî heye.

Cara pêşîn di 1966ê de di Kovara Çiya de hatine belavkirin. Paşê Osman Sebrî van kom dike û di sala 1984ê de li Şamê wekî pirtûk çap dike.

Weşnaxaneya Lîsê di sala 2016an de cardin kitêba “Çar Leheng” weşandiye.

**1.2.2.Berhemên Wî Yên Piştî Wefata Wî Wekî Kitêb Hatine Çapkirin**

**1.2.2.1.Dîwana Osman Sebrî:**

Ji helbestên wî pêk tê. Di sala 2004ê de ji aliyê A. Balî ve li Stenbolê hatiye çapkirin.

**1.2.2.2.Hevalê Çak:**

Ji aliyê A. Balî û Hoşeng Sebrî ve hatiye amadekirin. Hemû metnên Osman Sebrî tê de ne. Li Enqereyê hatiye çapkirin.

**1.2.2.3.Alfabeya Kurdî:**

Di sala 1955’an de li Şamê hatiye çapkirin.

**1.2.2.4.Şerên Sasonê, 1925- 1937:**

Ji aliyê Dilawerê Zengî ve hatiye berhevkirin û di sala 2005ê de li Stenbolê hatiye weşandin.

**1.2.2.5. Bîranînên Osman Sebrî:**

Ji aliyê Dilawerê Zengî ve bi du zimanan Kurdî (2005) û Erebî (2001) hatiye komkirin, çapkirin û belavkirin.

**1.2.3. Berhema Wî Ya Çapnebûyî:**

**1.2.3.1.Wergera Romana Dê:**

Osman Sebrî xwestiye romana "Dê" ya Maksîm Gorkî ji zimanê Erebî wergerîne zimanê Kurdî, lê nîvco hiştiye. Destnivîsa wê li cem Dilawerê Zengî heye.

**1.2.4.Berhemên Wî Yên Di Kovaran De Weşandî**

Osman Sebrî di nav civata Kurdan de di warê edebiyatê de herî pir bi helbestên xwe nav û deng daye. Lê dema ku em berhemên wî dixwînin, em bi tevahî dibînin ku di cureyên cuda cuda yên edebiyatê de berhem dane. Osman Sebrî berî ku berhemên xwe bike kitêb ew di gelek kovarên Kurdî de belav kirine. Kovarên ku berhemên wî di wan de çapkirî ev in:

1. *Hawar* (Sûriye)
2. *Ronahî* (Sûriye)
3. *Gelawê*j (Sûriye)
4. *Hêviya Welêt* (Almanya)
5. *Çiya* (Almanya)
6. *Roja Nû* (Beyrûd)
7. *Roja Nû* (Swêd)
8. *Berbang* (Swêd)
9. *Gelawêj* (Bexda)
10. *Hêvî* (Parîs)

Ji van kovaran em negihan kovara Çiya, Roja Nû, Berbang û Gelawêjê ku ne li Tirkiyeyê li derveyî welat hatine çapkirin. Lê Heyder Omer di berhema xwe ya bi navê *Helbestvan û Nîvîsevan Osman Sebrî* de navê nivîsên Sebrî yên di van kovaran de hatine weşandin destnîşan kiriye, derheqê hejmar û dîroka weşanê de agahî dane.

### 1.2.4.1.Berhemên Wî Yên Di kovara *Hawar*ê De

*Hawar*, di 15ê gulana 1932yê de tê derxistin. Pê re jî edebiyata Kurdî, li binxetê dest bi bikaranîna herfên Latînî-Kurmancî dike. *Hawar* seranser 11 sal û 57 jimar derdikevin. Ji jimara 1ê ḥeta jimara 23yê di salekê de derdikevin. Ji jimara 24ê ḥeta jimara 57an 10 sal derbas dibin. Tarîxa derketina wê wekî “Roja Zimanê Kurdî” tê pîrozkirin. Jimara dawî di 15ê Tebaxa 1943yê de derdikeve.

**Tablo 1:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Hawarê de hatine weşandin

| Jimara rêzê | Navê berhemê | Jimara Weşanê | Cureyên berheman | Tarîxa Weşanê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Berdêlik | 2 | Helbest | 1ê Hezîrana 1932yê | 11 |
| 2 | Gazind û Gilî | 14 | Gotar | 31 Çileyê Pêşîn, 1932 | 4 |
| 3 | Lavelav | 20 | Helbest | 8ê Gulana 1933yê | 3, 4, 5 |
| 4 | Li Goristaneke Amedê | 21 | Çîrok | 5ê Hezîrana 1933yê | 9, 10, 11, 12, 13,14 |
| 5 | Ji Dûr Ve | 21 | Helbest(pexşankî-mensûr) | 5ê Hezîrana 1933yê | 15 |
| 6 | Sehitî | 22 | Sehitî | 1ê Tîrmeha 1933yê | 1, 2 |
| 7 | Dongiya Çeqel | 27 | Fabl | 15ê Avrêla 1941ê | 5 |
| 8 | Marşa Xortan | 27 | Helbest | 15ê Avrêla 1941ê | 7 |
| 9 | Çiyayê Sasonê | 27 | Gotar | 15ê Avrêla 1941ê | 8 |
| 10 | Welatê Tirîvirêya | 28 | Helbest | 15ê Gulana 1941ê | 6 |
| 11 | Tarîxa Kurdistanê 1 | 28 | Gotar | 15ê Gulana 1941ê | 5 |
| 12 | Tarîxa Kurd û Kurdistanê 2 | 29 | Gotar | 10ê Hezîrana 1941ê | 6, 7 |
| 13 | Roviyê Jîr | 29 | Fabl | 10ê Hezîrana 1941ê | 8 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 14 | Tarîxa Kurd û Kurdistanê 3 | 30 | Gotar | 1ê Tîrmeha 1941ê | 9,10,11 |
| 15 | Dîk û Rovî | 31 | Fabl | 1ê Tebaxa 1941ê | 4, 5 |
| 16 | Agirî | 36 | Sehitî | 1ê Çileya Pêşînê 1941ê | 8 |
| 17 | Nêçîra Hirçan | 48 | Çîrok | 15ê Tebaxa 1942yê | 4 |
| 18 | Gotinên Şopewer | 48 | Sehitî | 15ê Tebaxa 1942yê | 7, 8 |
| 19 | Marşa Canbêzaran | 49 | Helbest | 15ê Îlona 1942yê | 4 |
| 20 | Li Pêşberê Yarê | 49 | Sehitî | 15ê Îlona 1942yê | 4 |
| 21 | Şihirên Zarokan | 49 | Helbest | 15ê Îlona 1942yê | 8 |
| 22 | Marşa Felatê | 50 | Helbest | 15ê Çirêya Pêşîna 1942yê | 8 |
| 23 | Warê min ne î kor e | 51 | Çîrok | 15ê Çirêya Paşîna 1942yê | 5 |
| 24 | Mezin û Mezinatî | 51 | Gotar | 15ê Çirêya Paşîna 1942yê | 9 |
| 25 | Mirdêsan | 52 | Gotar | 20 Kanûnê Paşînê 1943yê | 6 |
| 26 | Gelo Dem ji Zêr e | 52 | Gotar | 20ê Çileya Paşînê 1943yê | 6 |
| 27 | Pira Genderê | 52 | Çîrok | 20ê Çileya Paşînê 1943yê | 8 |
| 28 | Roviyê Ker | 52 | Fabl | 20ê Çileya Paşînê 1943yê | 10, 11 |
| 29 | Evîn | 53 | Helbest | 15ê Adar a1943yê | 2 |
| 30 | Cejinpîrozî | 54 | Helbest | 15ê Gulana 1943yê | 2 |
| 31 | Sersala Min | 54 | Helbest | 5ê Gulana 1943yê | 3 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 32 | Daylan | 55 | Helbest | 15ê Hezîrana 1943yê | 4 |
| 33 | Şeytanqûnî 1 | 55 | Çîrok | 15ê Hezîrana 1943yê | 7, 8 |
| 34 | Şeytanqûnî 2 | 56 | Çîrok | 15ê Tîrmeha 1943yê | 3, 4 |
| 35 | Keça Şi're | 56 | Helbest | 15ê Tîrmeha 1943yê | 5 |
| 36 | Şeytanqûnî 3 | 57 | Çîrok | 15ê Tebaxa 1943yê | 2 |
| 37 | Hêviya Nuh | 57 | Helbest | 15ê Tebaxa 1943yê | 5 |

#### 1.2.4.2.Berhemên Wî Yên Di Kovara *Ronahi*yê De

Kovara Ronahiyê bi birêvebirêya Celadet Alî Bedir-Xan, li bajarê Şamê, di 1ê Nîsana 1942yan de bi îbareya Fransî "Supplément Illustré de la Revue Kurde Hawar" ango "Pêveka wêneyî ya Kovara Kurd *Hawar*ê" dest bi weşanê dike.

Ronahî wekî pêveka wêneyî ya kovara *Hawar*ê derketiye û a rastî jî bi wêneyan tijî ye. Têkiliya piraniya wêneyan bi şer re heye.

Gava ku jimara pêşîn a *Ronahi*yê di 1ê nîsana 1942yan de derdikeve *Hawar* deh salî ye û jimara wê ya 42yan çap dibe. *Hawar*, di tarîxa Tebaxa 1943yan de bi jimara xwe ya 57an dawî li weşana xwe tîne. Di vê tarîxê de Ronahî gihîştiye jimara xwe ya 17an. Celadet bi *Hawar*ê re 17 jimarên *Ronahi*yê diweşîne. *Ronahî* heta jimara 28ê û dema bidawîhatina Şerê Cîhanê yê Duyem yê 1945ê weşana xwe dewam dike.

Ji bilî jimarên 23 û 26an ku ji bo du mehan derketine û ji bilî jimara dawîn a 28an ku piştî jimara berî xwe bi şeş mehan derketiye, wekî din, Ronahî ji jimara pêşîn heta jimara 22yan her meh birêkûpêk derketiye. Lê di *Hawar*ê de ev pergal û sîstematîkbûn tune ye. Wekî nimûne; jimarên *Hawar*ê carna ji 15 rojan carekê, carna ji mehê carekê; jimara 24an piştî 4 mehan, jimara 26an piştî salekê, jimara 27an piştî 6 salan bi awayekî bêpergal derketine.

Nivîskarê di naverokên jimaran de şanenava wî herî pir derbas dibe -di gelek jimaran de 3 nivîsên wî hene- Osman Sebrî ye. Ji bêhna kovarê diyar dibe ku Osman Sebrî ji bo *Ronahi*yê ji teknîka wê heta hemalî û nivîseriyê ked û xebat kiriye.

**Tablo 2:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Ronahiyê de hatine weşandin

| Jimara rêzê | Navê berhemê | Jimara Weşanê | Cureyên berheman | Tarîxa Weşanê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Gurê Pîr | 12 | Helbest | 1ê Adara 1943yê | 15 |
| 2 | Li Welatê Çînê | 12 | Weger | 1ê Adara 1943yê | 19 |
| 3 | Mist-Awik | 12 | Çîrok | 1ê Adara 1943yê | 21 |
| 4 | Kerê Dengbêj | 13 | Fabl | 1ê Nîsana 1943yê | 15 |
| 5 | Xweşxana Çiyayî | 14 | Helbest | 1ê Gulana 1943yê | 4 |
| 6 | Terşê Şevê | 14 | Çîrok | 1ê Gulana 1943yê | 4 |
| 7 | Şerek bi darekî | 14 | Çîrok | 1ê Gulana 1943yê | 8, 9 |
| 8 | Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz | 15 | Çîrok | 1ê Hezîrana 1943yê | 5, 6, 7 |
| 9 | Beraz û Berazî | 16 | Çîrok | 1êTîrmeha1943yê | 11 |
| 10 | Tarîxa Jîna Napolyon | 16 | Werger | 1ê Tîrmeha 1943yê | 12, 13 |
| 11 | Mijo û Xane | 17 | Çîrok | 1ê Tebaxa 1943yê | 5 |
| 12 | Nêçîr | 17 | Gotar | 1ê Tebaxa1943yê | 15, 16, 7 |
| 13 | Şêxê Barzan | 17 | Çîrok | 1ê Tebaxa 1943yê | 22, 23, 24 |
| 14 | Tarîxa Jîna Napolyon 1 | 17 | Werger | 1ê Tebaxa 1943yê | 26-27-28 |
| 15 | Hevalê Çak | 18 | Bîranîn | 1ê Îlona 1943yê | 7 |
| 16 | Nêçîr 2 | 18 | Gotar | 1ê Îlona 1943yê | 18 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 17 | Tarîxa Jîna Napolyon | 18 | Werger | 1ê Îlona 1943yê | 16, 17, 18 |
| 18 | Berdiliya Mihokê | 19 | Helbest | 1ê Çirêya Pêşîna 1943yê | 5 |
| 19 | Tarîxa Jîna Napolyon 3 | 19 | Werger | 1ê Çirêya Pêşîna 1943yê | 9, 10 |
| 20 | Êzdî û Ola Wan 2 | 19 | Gotar | 1ê Çirêya Pêşîna 1943yê | 13, 14, 15, 16 |
| 21 | Zozan | 20 | Helbest | 1ê Çirêya Paşîna 1943yê | 3 |
| 22 | Çend Gazind | 20 | Gotar | 1ê Çirêya Paşîna 1943yê | 5, 6 |
| 23 | Tarîxa Jîna Napolyon 4 | 20 | Werger | 1ê Çirêya Paşîna 1943yê | 9, 10, 11 |
| 24 | Terlan | 20 | Çîrçîrok | 1ê Çirêya Paşîna 1943yê | 12, 13 |
| 25 | Tarîxa Jîna Napolyon 5 | 21 | Werger | 1ê Çileya Pêşînê 1943yê | 3, 4 |
| 26 | Şîna Jinekê | 21 | Çîrok | 1ê Çileya Pêşînê 1943yê | 5, 6, 7, 8 |
| 27 | Êzdî û Ola Wan | 21 | Gotar | 1ê Çileya Pêşînê 1943yê | 15 |
| 28 | Tarîxa Jîna Napolyon 6 | 22 | Werger | 1ê Çileya Paşînê 1944yê | 5, 6, 7 |
| 29 | Tarîxa Jîna Selahedîn 1 | 23 | Werger | Sibat-Adar 1944 | 12, 13, 14 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 30 | Tarîxa Jîna Napolyon 7 | 23 | Werger | Sibat-Adar 1944 | 18, 19, 20, 21 |
| 31 | Tarîxa Jîna Napolyon 8 | 24 | Werger | 24ê Nîsana 1944ê | 6, 7, 8 |
| 32 | Tarîxa Jîna Selahadîn 2 | 24 | Werger | 24ê Nîsana 1944ê | 22, 23 |
| 33 | Ziman | 24 | Gotar | Nîsan 1944 | 22, 23 |
| 34 | Tarîxa Jîna Napolyon 9 | 25 | Werger | Gulana 1944ê | 10, 11, 12 |
| 35 | Tarîxa Jîna Selahadîn 3 | 25 | Werger | Gulan 1944 | 21, 22 |
| 36 | Tarîxa Jîna Selahadîn 4 | 26 | Werger | Hezîran-Tîrmeh 1944 | 10, 11, 12 |
| 37 | Tarîxa Jîna Napolyon 10 | 26 | Werger | Hezîran-Tîrmeh 1944 | 14, 15 |
| 38 | Tarîxa Jîna Napolyon 11 | 27 | Werger | Tebax-Îlon 1944 | 17, 181, 19 |
| 39 | Tarîxa Jîna Selahadîn 5 | 28 | Werger | Adara 1945ê | 9, 10 |
| 40 | Tarîxa Jîna Napolyon 12 | 28 | Werger | Adara 1945ê | 11, 12 |

### 1.2.4.4.Berhemên Wî Yên Di Kovara *Hêviya Welêt* De

Kovara *Hêviya Welêt* li Ewropayê di navbera sala 1963-196ê de hatiye çapkirin. Bi tenê sê jimarên wê hene.

**Tablo 3:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Hêviya Welêt de hatine weşandin


| Jimara rêzê | Navê berhemê | Jimara Weşanê | Cureyên berheman | Tarîxa Weşanê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Qelsok | 1 | Helbest | Razbera 1963yê | 6 |
| 2 | Mafir | 1 | Sehitî | Razbera1963yê | 14 |
| 3 | Dîcle-Firat | 1 | Helbest | Razbera 1963yê | 15 |
| 4 | Durû | 1 | Helbest | Razbera 1963yê | 15 |
| 5 | Bersiva Gazin Ji Xwedê | 1 | Helbest | Razbera 1963yê | 16 |
| 6 | Fedekarî | 1 | Sehitî | Razbera 1963yê | 20 |
| 7 | Ziman di Jîna Miletan da | 1 | Gotar | Razbera 1963yê | 22 |
| 8 | Pîrozî | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 30 |
| 9 | Newroz | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 32 |
| 10 | Jan | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 45 |
| 11 | Gîsin | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 46 |
| 12 | Ker û Azadî | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 47 |
| 13 | Bawerî | 2 | Sehitî | Gulana 1964ê | 49 |
| 14 | Diçim Hec | 2 | Helbest | Gulana 1964ê | 57 |
| 15 | Wefda Kurdî | 3 | Helbest | Newroza 1965ê | 72 |
| 16 | Ho Xort | 3 | Helbest | Newroza 1965ê | 83 |

### 1.2.4.3.Berhemên Wî Yên Di Kovara “Hêvî”yê De


**Tablo 4:** Berhemên Osman Sebrî yên di kovara Heviyê de hatine weşandin

| Jimara rêzê | Navê Berhemê | Jimara Weşanê | Cureyên berheman | Tarîxa Weşanê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Elîfbêya Kurdî | 1 | Lêkolîn | Îlona 1983yê | 19, 20 |
| 2 | Bijî Welatê Min | 1 | Helbest | Îlona 1983yê | 59 |
| 3 | Ziman | 2 | Helbest | Gulana 1984an | 61 |

**Grafik 1:** Li Gor Cureyê Hejmara Berhemên Wî yên di Kovaran de




**Grafik 2:** Li Gor Cureyê Rêjeya Berhemên Wî yên di Kovaran de



### 1.3.HUNERA OSMAN SEBRÎ

#### 1.3.1. Helbestvanî

Osman Sebrî mirovekî zana, dûrbîn û hunermend, nivîskarekî pirhêl e: “Osman Sebrî jî wekî nivîskarên dema xwe pirhêl e. Hema hema di hemû warên nivîsê de berhem daye.”[21]

Sebrî di bîranînên xwe de behsa Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Elî Herîrî, Feqeyê Teyran û Hecî Qadirê Koyî dike, dibêje wan bi Kurdî nivîsîn lê berhemên wan bi peyvên Erebî û Farisî tijî ne. Ev yek jî nîşan dide ku Osman Sebrî şair û edebiyatzanên mezin ên navdar nas dike. Wî berhemên wan xwendine û ew gihîştiye asta rexnelêgirtina li wan.

Ji bo helbestnivîsînê, divê nivîskar bigihîje asta bilindtirîn a zimên: “Edeb bi pêşveçûna ziman pêşve diçe. Dema şerekî dirêj nehat xwendin û nivîsandin ziman nagihê ser hev. Gava şaîr an edîbê Kurd hatiye xwestiye tiştekî binivîse li pêş xwe zimanekî nepêkhatî dîtiye. Ji ber vê yekê çûye bi Farisî, Erebî, Tirkî nivîsiye û bûye peyayên wan zimanan.”[22]

Helbesta ewil a Osman Sebrî Berdêlk e. Em vê helbestê di jimara duyem a *Hawar*ê de dibînin. Em dikarin bibêjin ku destpêka helbestnivîsîna Osman Sebrî ev helbest e û wî di sala 1932yan de dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

**Berdêlk**

Jiyîn xweş e bi Kurdî
Li Kurdistan bi Kurdan
Bav û biran cih bikin
Hemû min tê bi derdan

Min dil tucar nenalî
Min zar tucar nekalî
Bi dilhişkî bi lalî

---

[21] Ronî War, *Terşê Şevê*, Weşanên Ava, Ankara 2013, r.7.

[22] Sebrî, *Bîranîn,* r.13.

Sînga xwe da ber riman

Min îşev dît xewna rast
Deng û gazî çi xweş hat
Digot rabin Kurdino!
Tev biran û tev xwehan

Derbanli me tu zanî
Rim nîne giş nezanî
Xopan kirin Kurdanî
Ev tiral û nezanan

Hewarê xweş awa kir
Dilê Kurdan pê şa kir
Zar û ziman ava kir
Jîn û xweşî bela kir[23]

Osman Sebrî dû re di sala 1956ê de li Şamê dîwaneke biçûk, Bahoz[24]ê çap dike.

Herweha helbestên Osman Sebrî di kovara "Hêviya Welêt" û "Çiya"yê de tên weşandin. Paşê Hemreş Reşo van hemû helbestan kom dike. Di sala 1981ê de li Almanyayê bi navê Dîwana Osman Sebrî[25] çap dike.

Di berhemên Osman Sebrî de wisa diyar dibe ku dixwaze helbest û cureyên din ên edebiyatê bikevin xizmeta gel. Mebesta nivîsîna wî şiyarkirin, rênîşandana gel û gelparêzî ye: "Ew ne bi tenê hozan û nivîser bû, di heman demê de siyasetmedar,

---

[23] Osman Sebrî, "Berdêlik", *Hawar,* j.2, 1 Hezîrana 1932, r.11.

[24] Osman Sebrî, *Bahoz û Çend Nivîsarên Din*, Şam 1956.

[25] Osman Sebrî, *Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Perî, Stenbol 1998.

şoreşger û şervan bû. Ziman û edebiyat paşê ket jiyana wî û bû perçeyek ji karaktera wî."[26]

Jiyana Osman Sebrî ne jiyaneke ji rêzê ye: "Di ronîkirin û şerê xwenaskirina Kurdan de û di şerê serbestî û azadkirina Kurdan de, gelek roj û salên giran li pêşiya vî mirovî bûne. Lê ew di karê xwe de ji rêya xwe venegeriyaye, xebitiye, şer kiriye ji bo xatirê serxwebûn û neteweya Kurd."[27]

Mijara piraniya helbestên Osman Sebrî li ser yekîtiya Kurdan e: "Piraniya helbestên Osman Sebrî yên welatperweriyê yên yekîtî û hevkariya Kurdan in, yên ronîkirina wan in bo xatirê azadî, serbestî û serwxebûna wan û welatê wan. Di helbestên xwe de Osman Sebrî temî û şîretan li miletê xwe dike, temî û şîretên xwe berê pêşîn li keç û xortên Kurd dike."[28]

Osman Sebrî di warê helbestê de bi serketî bû, rê û rêbazên vegotineke manîdar û serkeftî baş dizanibû. A herî girîng, ji hemû hêmanên wî bêhna xweş a folklorê û kultura Kurdî tê. Li hêla din hemû helbestên wî ku dema mirov tarîxa nivîsandina wan dinihêre, mirov baş pê dihese ku rasterast ji hest, dilîn û êşên ku jiyaye, hatine pê.[29]

Yekemîn jêderên nivîkar Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî ne. Lê ew di nav miletê xwe de dijî. Folklor û kultura gelê xwe baş dizane. Osman Sebrî folklor û edebiyata devkî ji xwe re dike palpişt û li ser vê mîrateyê hespê xwe dibezîne.[30] "Kûçikê Bekiran"[31] û "Şerê Şêr"[32] nimûneyên vê ne. Ev rêbaz jî dike ku helbesta Osman Sebrî ji pîvanên helbestê dûr bikeve û bibe awayek çîrokbêjiyê. Jixwe dema tu wan metelokan ji helbestê bavêjî tu şêwazeke nûh vedirêsî ya beriya wî hatî vegotin dubare dikî.[33]

---

[26] Uzun, *h.b.*, r.334.

[27] Qanatê Kurdo*, Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed 2010, r.216.

[28] Kurdo, *h.b.*, r.220.

[29] Berken Bereh, "Osman Sebrî" *W*, j. 51, 2015, r.33.

[30] Bereh, *h.g.*, r.33.

[31] Sebrî, *Dîwana Osman Sebrî*, r.169.

[32] Sebrî, *h.b.*, r.164.

[33] Bereh, *h.g*., r.33.

Di helbestên xwe de tevlî teşe û şêwaza klasîk deriyê helbesta modern jî vekir. Em dikarin bibêjin Osman Sebrî digel Qedrîcan ji aliyê şêwaz û teşeya modern ve pêşengên wê cureya helbestê ne. Helbestên xwe yên bi şêwaza klasîk bi heft û heştbangî nivîsîne. Gelek fabl jî nivîsîne. Herçiqas teşe klasîk be jî naverok modern e.

Sebrî, di derya helbesta nûbûn û modern de melevanî kiriye.[34] Mîna Helbestên wekî Wefda Kurdî[35], Ho xort[36], Jan.[37]

Ji hêlekê din ve dilê wî pir bi helbesta kevneşop ve girêdayî ye: "Helbestên xwe bi kêş û bare dihûne û bi kok û rehên wê yên resen ve girêdide û ji êmîş û kaniyên welatê xwe vedixwe. Bi taybetî ji derya melayê Cizîrî –mîrê helbesta Kurdî- û Ehmedê Xanî- bavê ramana neteweya Kurdî- vexwariye."[38]

Helbestên Osman Sebrî yên bi awayê merşê, xweşxan û şoreşgeriyê hatine nivîsandin jî hene. Ev berhem bi destê gelek stranbêjan ve jî bûne berhemên dengî; Marşa Felatê[39] û Marşa Xortan[40] du nimûne ji wan in.

Osman Sebrî ji bo zarokan jî helbest nivîsîne, helbestên Sebrî yên ji bo zarokan nivîsîne qadeke nû ye. "Apo, ji zarokan pir hez dikir û wan wekî dahatûya welêt didît. Zêde li ber çavan nebin jî, balê nekşînin jî gelek helbestên wî yên li ser zarokan hene."[41] Eger ev helbest bi zanistî û awayekî pedagojîk bihata nivîsîn wê pencereya edebiyata zarokan vekira.[42] Siyamend[43], Lewend[44] nimûne ne ji bo wan helbestan.

Osman Sebrî rê û rêbazên hunerê zanibû. Di helbestên xwe de îstî'are, dirûvpêxistin, danberhevkirin û şayesandinê bi hostatî bi kar aniye.

---

[34] Zengî, *h.b*., r.39.

[35] Osman Sebrî, Wefda Kurdî, *Hêviya Welêt*, j. 3, Newroz 1965, r.72.

[36] Osman Sebrî, Ho Xort, *Hêviya Welêt*, j. 3, Newroz 1965, r.83.

[37] Osman Sebrî, Jan, *Hêviya Welêt*, j. 2, Gulan 1964, r.45.

[38] Zengî, *h.b*., r.39-40.

[39] Osman Sebrî, Marşa Felatê, *Hawar*, j. 50, 15 Çirêya Pêşîn 1942, r.8.

[40] Osman Sebrî, Marşa Xortan, *Hawar*, j. 27, 15 Avrêl 1941, r.7.

[41] Mehmed Uzun, *Hêz û Bedewiya Qelemê*, r. 9-17.

[42] Bereh, *h.g*. 33-34.

[43] Sebrî, *Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Perî, Stenbol 1998, r.179.

[44] Sebrî, *h.b*., r.178.

Osman Sebrî, peyvên xwe ji jiyana xwe ya rojane werdigire. Yanî wan li gor maneya wan a ferhengî bi kar tîne: “Ji ber xem û qesaweta şiyarkirina gel, Osman Sebrî, helbestê wekî alavake ragihandin û peyamdayinê dihesibîne. Ji ber vê heta jê tê peyvên xwe ji jiyana rojane berhev dike û wan di wateya wan a ferhengî de bi kar tîne, lê ew peyv hêsan û bêpêjn û stûxwar in.”[45]

Di tevahiya jiyana xwe de Sebrî xwestiye mîna Cegerxwîn gelê xwe; gundî, reben, belengaz û jarên welatê xwe ji ber zilm û zora mêtingeran, axa û beg û şêxan hişyar bike. Di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê Apo de poetîkaya xwe weha destnîşan dike:

> “Rojekê ji rojan nedihate bîra min, ev berhemên min, ku ev berhemên min ên ku di nava çil û pênc salan de, di demeke xweser rewşa kambax de hatibûn nivîsîn û piraniya wan di hin kovar û belavokên Kurdan de hatibûn belavkirin, holê bigihên ser hev û di dirûvê pirtûkekê de bêne çapkirin. Berya her tiştî, ez ne helbestkar im, lê gelekî kêfa min ji xwandina helbestan re tê û car caran dinivîsim jî. Jê pê ve baweriya min bi feyde û qenciya helbestê pir mezin e. Çi dema ku helbest an çîrok, bi awayekî rêber û rênas bêne nivisîn, dikarin miletekî serwext û hişyar bikin û ji bo têkoşîneke niştimanî pêk bînin.”[46]

### 1.3.2. Çîroknivîsîn

Osman Sebrî, çîrokên pexşankî û menzûm bi awayekî kurt û dirêj nivîsîne, lê xwe wekî siwarê çîroka kurt dibîne.[47] Giringiyê dide kultura gel, çîrokên ji çîrokbêjan dibihîse dinivîsîne: “Di biçûkiya xwe de min ji çîrokan hez dikir. Çîrokbêjek li ku bûya min dişande pê tanî, an diçûm nik wî ji bo guhdariya çîrokên wî bikim, nemaze çîrokên lehengan ên efsaneyî. Herçî çîroka kurt hinekî bi min re derdikeve, lê a dirêj ez ne peyayê wê me.”[48]

Wekî piraniya nivîskarên *Hawar*ê piralî bû Osman Sebrî. “Ew di destpêkê de siyasetvan bû. Lê wî mijûlbûna zimên ji xwe re wekî karekî sereke hilbijartibû. Ji aliyê din ve ew çîroknivîsekî şareza bû. Bêguman ew şaîr bû jî. Wî herweha gotar jî

---

[45] Bereh, *h.g.*, r.34.

[46] Sebrî, *h.b.*, r.7.

[47] Sebrî, *Bîranîn*, r.11-12.

[48] Sebrî, *h.b.*, r.12

nivîsandine. Ew di dema xwe de stûnek ziman û edebiyata Kurdî bû. Di warê helbestê de ne zêde serkeftî be jî, ew di warê çîrokê de şareza bû."[49]

Di kultura Kurdan de çîrokbêjî heye. Çîrokbêj, nemaze di mehên zivistanê de li dîwanê rûdinên, mêvan li dora wan kom dibin û çîrokbêj dest vegotina bi çîrokan dikin. Osman Sebrî çîrokên ji wan dibihîse, bûyerên dibe şahidê wan, tevlî serpêhatiyên xwe bi honakekê zexm, bi ziman û şêweyekê xurt dinivîsîne.

Osman Sebrî şahidiya gelek bûyerên mezin kiriye. Herweha ew bixwe jî di nav van bûyeran de bûye. Serhildana Şêx Seîd hê di zarokatiya wî de rû daye. Her du apên wî hatine dardakirin. Ji ber ku ew jî endamek ji wê malbatê bûye ketiye nav siyasetê. Serpêhatiyên wî û bûyerên ku şahidiya wan kiriye bandoreke mezin lê kirine. Wextê em bala xwe didin çîrokên wî, em dibînin ku serpêhatî û bûyerên tarîxî yên serdemê di çîrokên wî de reng vedane.

Bûyerên tarîxî, rojane, xurafeyên di nav Kurdan de, nêçîr û hwd. bûne mijarên çîrokên Osman Sebrî. Ew wekî kesekî ji rêzê jiyaye û ji kultur û jiyana rojane ya Kurdan feyde dîtiye. Kana hunera wî civaka Kurdan e.

Nivîskar di çîroka xwe ya bi navê "Li Goristaneke Amedê"[50] de derûniya ronakbîr û pêşengên Kurd bi rêya lehengê çîrokê dide der.

Sebrî bi çîrokên xwe daxwazên xwe û yên ronakbîrên Kurd digihîne civaka Kurd; rexne li kêmasiyên wê digire, xurafe û şaşiyên wê nîşan dide û eşkere dike.

Mijara çîroka "Terşê Şevê"[51] xurafeyên civaka Kurdî ye. Ew dixwaze xwendevanan di vê mijarê de şiyar bike ku rastiya vî tiştî tune ye. Ji ber vê yekê di destpêka çîrokê de li ser vê mijarê wan haydar dike. Di dawiya çîrokê de nîşan dide tiştê lehengê çîrokê li goristanê lê rast hatiye ne terşê şevê ye, ew kûçikek e.

Çîroka "Şeytanqûnî"[52] ya ji sê beşan pêkhatî li ser hîmê xurafeyên nava kultura Kurdan ava bûye. Ev çîrok wekî rêzeçîrok in: "Ev çîrok ku di dema nivîsînê de li zimanên din hatibûya wergerandin, dê bi teqezî di navbera çîrokên klasîk ên edebiyata cîhanî de cih bigirta. Ji ber ku him ji hêla şêwaz him jî ji hêla vegotinê û

[49] Sevim Hatun Sürücü, "Hevpeyvînek digel nivîser Firat Cewerî", 18.06.2017, (maîl).

[50] Osman Sebrî, "Li Goristaneke Amedê", *Hawar*, h.21, 5 Hezîran 1933, r.9.

[51] Osman Sebrî, "Terşê Şevê", *Ronahî*, h.14, 1 Gulan 1943, r.6.

[52] Osman Sebrî, "Şeytanqûnî 1", *Hawar*, h.55, 15 Hizêran 1943, r.7

him jî ji hêla mijarê ji bo çîroka Kurdî deriyên nû vekirine… Şeytanqûnî, ew bêje ye ku ji hêla felsefî ve dikare derûnî û civatnasiya gelekî, bi xwendevanan bide famkirin: Tirs, kelecan, keftûleft û hin baweriyên di civatê de, bi vegotineke çîrokî û bi vehonakeke cihêreng hatine dayîn."[53]

Osman Sebrî, di destpêka "Şeytanqûnî"yê de qal dike, "Şeytanqûnî: Wekî her miletî li nik me Kurdan jî, li ser xerafatan baweriyek heye. Li gor wê baweriyê, hin mirî piştî mirinê radibin. Gava ku navê kîjan mirovî hildin, ew mirov jî dimire. Ji bo vê yekê kîjan miriye ku dibêjin; şeytanqûnî bêyî merê bi tu tiştî nayê kuştin…"[54]

Nivîskar di çîroka bi navê "Warê Min Ne î Kor e"[55] de behsa şerê navbera eşîran dike. Sebrî di "Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz"[56] de vegotineke modern bi kar tîne, ajalan dide axaftin:

> "Ji bo vegotina derûniya ajelan ku di berhemên edebî yên cîhanê de cih girtine, nimûneyeke gelekî xurt e. Dema ku mirov li berhemên li Çewlika Sewalan, Banga Hovîtiyê, Qaqlîbaz dinihêre ku di nava klasîkên cîhanî de çiqasî cih girtine, mirov heyfa xwe tîne ku çima seyê di çîroka O. Sebrî de jî nebûye qehremanek ji wan."[57]

### 1.3.3.Sehitî

Osman Sebrî ji bilî çîrok, helbest, bîranîn û gotaran sehitî jî nivîsîne. Hejmara sehitiyên Sebrî ne zêde ne. Piranî li ser ziman û alfabeyê ne. Heta ji vana yek bi navê "Sehitî" di jimara 22yê ya *Hawar*ê de hatiye weşandin:

***Sehitî***

*Di jimara şanzdehê ya Hawarê de li ser sehitiya zimên sêpirsyar ji qurdên xwe qiribûn. Bi van çend xêzên jêrîn gotina xwe û gelek silavan pêşberî hingo dikim.*

*1.Yekîtiya Alafabeya Kurdî*

*2.Heçî xortên qurdan yên qo îro bi zimanê qurdî re bendewar dibine ji qurdên her welatî xorteq bijartin û ji van xortan civateqe zanistî anîn pê.*

---

[53] Osman Sebrî, *Li Goristaneke Amedê*, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2007, r.8

[54] Osman Sebrî "Şeytanqûnî 1", *Hawar*, h.55, r.7

[55] Osman Sebrî, "Warê Min Ne î Kor E, *Hawar"*, j.51, 15 Çirêya Paşîn 1942, r.5

[56] Osman Sebrî, "Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz", *Ronahî*, h.15, 1 Hezîran 1943, r.5

[57] Sebrî, *Li Goristaneke Amedê*, r.10

*3.Di civata zanistî de berî her tiştî ferhengeqe gewre, di pişt re qitebên qevnar û modern temamên wan li ser hemû zarên qurdî bilav qirîn û di piştre bi yeqîtiya zimanê qurdî mijûl bûn.*

*Bi vî awayî heya deh salan di xwandinê de yeqîtî û di axaftinê de niziqayiyê hêsanî dibinim.*

*Xwedê vê bendewariya Hevindê Sorî bi miletê qurd re dirêj û berxudar biqe.*[58]

### 1.3.4.Bîranîn

Osman Sebrî di bîranînên xwe de jidayîkbûna xwe dest pê dike, behsa xortanî, perwerde, zewac û malbata xwe dike. Digel van li ser herêma lê dijî haydariyên cografik biberfirehî dide û behsa jiyana eşîrên herêmê dike. Di serdema jiyana Osman Sebrî de gelek bûyerên tarîxî jî rû dane. Osman Sebrî behsa van bûyeran û bandora wan a li ser malbata xwe dike.

Nivîskar tevî nivîseriya xwe di heman demê de siyasetmedarek bû jî. Gelek caran dikeve zîndanê. Em salên dikeve girtîgehan jî di nav rûpelên bîranînên wî de dibînin, behsa girtina xwe, zîndan û mehkemeyên serdemê dike.

Osman Sebrî, mêrxasî û tirsonekiyê; camêrî û qelsiyê; welatperwerî û xiniziyê, serhildan û serîdanînê; rêzdarî û bêrêziyê hemû bi hev re dîtine.

### 1.3.5.Gotarnivîsîn

Nivîskar Osman Sebrî, gotar jî nivîsîne. Gotarnivîsîn ne tiştekî ji rêzê ye. Bo wê zimanekî xurt û zanîn divê.

Osman Sebrî li ser tarîx (Tarîxa Kurd û Kurdistanê), ziman (Ziman Di Jîna Gelan De), welatparêzî (Welatparêzî Di Navbera Duh û Îro De), raman (Raman Di Navbera Aferîn û Vacabûnê De), dem (Gelo Dem Ji Zêr e?), mezinî û mezinatiyê (Mezin û Mezinatî an Sergevaz û Sergevazî) û nêçîrê nivîsiye.

Gotara bi navê "Tarîxa Kurd û Kurdistanê"[59] lêkolîneke tarîxî, berfireh û dirêj e, ji sê beşan pêk tê. Bi pêşgotineke dirêj hatiye nivîsîn. Gotar li ser hin şaşiyên tarîxî yên pirtûka "Xulaseya Tarîxa Kurd û Kurdistan" a Mehmed Emîn Zekî Beg e. Osman Sebrî, herweha sernava vê kitêbê dike sernava gotara xwe.

---

[58] Osman Sebrî, "Sehitî", *Hawar*, j. 22, 1 Tîrmeh 1933, r.1-2.

[59] Osman Sebrî, "Tarîxa Kurd û Kurdistanê 3", *Hawar*, j. 30, 1 Tîrmeh 1941, r.9.

“Gelo Dem ji Zêr e?”[60] meselokeke gelêrî ye û zaf kurt e. Nivîskar, di vê gotarê de demê dinirxîne. Nivîskar bala xwendevan dikişîne ser demê; ka haya wî ji demê, jiyana wî û qiymeta demê heye yan na.

“Ziman di Jîna Gelan de”[61], gotareke ku behsê tîne li ser ziman. Serê pêşîn ziman dinasîne, paşê dibêje ku pêşveçûna miletekî ji bipêşveçûna zimanê wî xuya ye. Herweha bipêşveçûna zimanê miletekî nîşana xurtî û rûmeta wî ye. Paşê behsa lipaşmayîna ziman dike û sebebê li paşmayîna zimên nîşan dide.

### 1.3.6.Wergêrî

Aliyekî din ê Osman Sebrî wergêrî bû. Mîna Celadet Bedirxan, Qedrîcan, Kamîran Bedirxan û Nûredîn Zaza giringiyê bi karê wergêriyê dida, wê wekî mebesteke paqij û bilind didît.[62]

Mebesta sereke ya wergêriyê feydekirina ji kultura miletên din e. Ji ber vê yekê ji zimanê Erebî werdigerîne. Tarîxa Kurd û Kurdistan 2[63], Tarîxa Jîna Napolyon[64], Ezdî û Ola Wan[65], Tarîxa Jîna Selaheddîn[66] hinek ji karên wî ne.

Osman Sebrî, di kovara *Ronahi*yê de li ser Napolyon û Selaheddîn hin rêzenivîs amade kirine. Rêzenivîsa ku li ser Napolyon hatiye amadekirin di jimara 16an ya *Ronahi*yê de, di tarîxa 1ê tîrmeha 1943yan de dest pê kiriye û heta jimara 28ê -ku di heman demê de jimara *Ronahi*yê ya dawî ye-dewam kiriye. Ev rêzenivîs bi tevahî ji pêşgotinekê û 12 beşan pêk hatiye.

Rêzênivîsa li ser Selaheddîn ji jimara 23yan *Ronahi*yê dest pê dike û heta jimara dawî 28an dewam dike. Ev rêzenivîs bi giştî ji 5 beşan pêk hatiye, ev jimar 23, 24, 25, 26 û 28 in, di heman demê de Osman Sebrî di van jimaran de li ser Napolyon jî nivîsiye, yanî wî ligel nivîsên xwe yên din ên kovarê du rêzenivîs bi hev re amade kirine.

---

[60] Osman Sebrî, “Gelo Dem ji Zêr e?”, *Hawar*, j. 52, 20 Kanûna Paşîn 1943, r.6.

[61] Osman Sebrî, “Ziman Di Jîna Miletan Da”, *Hêviya Welat*, j. 1, Razber 1963, r.22.

[62] Zengî, Osman Sebrî, r.44.

[63] Osman Sebrî, “Tarîxa Kurd û Kurdistanê 2”, *Hawar*, j. 29, 10 Hizêran 1941, r.6-7

[64] Osman Sebrî, “Tarîxa Jîna Napolyon”, *Ronahî*, j. 16, 1 Tîrmeh 1943, r.12-13.

[65] Osman Sebrî, “Êzdî û Ola Wan 2”, *Ronahî*, j. 19, 1 Çirêya Pêşîn 1943, r.13-14-15-16.

[66] Osman Sebrî, “Tarîxa Jîna Selahedîn 1”, *Ronahî*, j. 23, Sibat-Adar 1944, r.12-13-14.

Her du rêzenivîs jî ji jidayîkbûna Napolyon û Selaheddîn dest pê dikin û di kêlîka berî biserketina wan diqede. Osman Sebrî, tam di kêlîka qralbûna wan de rêzenivîs qedandine. Ji ber vê şêwaza xwe, nivîs baş û balkêş e, teknîkeke cuda ye. Osman Sebrî, destpêka tarîxa wan ji me re vedibêje, lûtkeya wan ji lêkolîn û xwendinên me yên din re dihêle:

> "Helbet weke gellek nivîserî Osman Sebrî jî ji bo azadiya neteweyekê xatirê tarîxê baş dizane, ji ber vê wî ev biyografiyên tarîxî şayesandine û herweha helbet wî ev her du şexsiyetên tarîxî nêzikî xwe dîtine. Yek, Selaheddîn ji xwe bi Kurdbûna xwe nêzikî wî ye û dudu, Osman Sebrî jî weke her du şexsiyetan şervanek e û wî jî enî û herb dîtine û jiyane. Her du leheng jî Napolyon û Selaheddîn du fermandar û qral împaratorên girîng in di tarîxa cîhanê de, yek lehengê Rojavayê ye û yê din jî lehengê rojhilatê ye."[67]

**Romana Dê:** Sebrî, romana "Dê" ya Maksîm Gorkiyî ji zimanê Erebî wergerandiye zimanê Kurdî. Lê bi dawî neaniye. Destnivîsa wê li cem nivîskar Zengî heye.

[67] Rênas Jiyan, *Napolyon-Selaheddîn*, Weşanên Belkî, Diyarbakır 2011, r.5.

# BEŞA DUYEM

## 2. LÊKOLÎNEK LI SER ÇÎROKÊN OSMAN SEBRÎ

Osman Sebrî digel helbest, sehitî, gotaran fabl û çîrok jî nivîsîne. Piraniya çîrokên Sebrî kurt in. Çîroka bi navê “Li Goristaneke Amedê” ji 6 rûpelan pêk tê ya bi navê Şîna Jinekê ji çar rûpelan pêk tê. Herweha çîrokên din ên me li ser lêkolîn kir ên wekî “Terşê Şevê”, “Şeytaqûnî”, “Şêxê Barzan”, “Mijo û Xane”, “Mist-Awik”, “Pira Genderê”, “Berza û Berazî”, “Şêrek Bi Darekî” ji du sê an jî ji rûpelekê pêk tên.

Çîroka herî dirêj a Sebrî çîroka lehengiyê ya bi navê “Çar Leheng” e. Ev çîrok ji 40 rûpel û ferhengokeke piçûk a bi zimanê Kurdî-Erebî pêk tê. Ev çîrok li ser çar lehengên Kurd e; Ferzende, Seyid Xan ku di şerê Çiyayê Agiriyê de derketine pêş, Remezanê Xezo yê di şerê Sasunê de şer kiriye û lehengên dawîn jî Adil Begê ku bi neçarî dikeve nava şerekî û di encamê de biserdikeve. Ev çîroka ku ji çar beşan pêk tê di salên şêstî de beş bi beş di kovara “Çiya” de tê weşandin, paşê di sala 1984an de wekî pirtûkekê li Şamê tê çapkirin.

Heyder Omer, di berhema xwe ya *Helbestvan û Nivîsevan Osman Sebrî (1905-1993)* de çîrokên Osman Sebrî di bin çar serenavan de *Çîrokên Lehengiyê, Serpêhatî û Çîrokên Xerefatan, Serpêhatî û Çîrokên Xiniziyê, Serpêhatî û Çîrokên Dilêrî û Camêriyê* dabeş kiriye. Ev dabeşkirinê li gor mijara çîrokan e. Me jî ev dabeşkirina Omer ji xwe re wekî bingeh qebûl kir û li ser hin guherîn kirin. Omer, di bin serenavê çîrokên lehengiyê de çîroka bi navê *Çar Leheng* jî nirxandiye, herweha di bin serenavê serpêhatî û çîrokên xiniziyê de çîrçîroka (masal) bi navê *Terlan* jî daye. Ji ber ku çîrokên Osman Sebrî yên ku me tespîtkirin hemû di kovara *Hawar û Ronahiyê* da bûn û piraniya wan kurt bûn me çîroka “Çar Leheng” ku çîrokeke dirêj e û di kovara “Çiya” de hatiye weşandin me nekir nava xebata xwe. Herweha xebata me li ser çîrokan e û li gor tespîtê me kirin “Terlan” ne çîrokek e ew çîrçîrokek e ji ber vê me ev jî ji nav tabloyê derxist.

Osman Sebrî sê çîrok li ser mijara şeytanqûnî nîvîsîne, Omer ev çîrokên ku mijara wan yek e wekî çîrokekê di tabloyê de nîşan daye. Ji ber ku ev çîrok xwedan taybetmendiyên cuda ne, me wekî çîrokên serbixwe her yek ji hevûdin cuda nirxand

û di tabloyê de nîşan da. Çîroka bi navê "Nêçîra Hirçan" a Sebrî di tabloya Heyder Omer de nîne, ev jî li ser tabloyê hat zêdekirin.

**Tablo 5:** Çîrokên Osman Sebrî li gor mijarê ev in[68]

| Çîrokên Osman Sebrî Li Gor Mijarê Ev In |
|---|
| **1.Çîrokên Lehengiyê** |
| 1.1.Li Goristaneke Amedê<br>1.2.Şîna Jinekê Li Ser Gora Birho<br>1.3.Çar Leheng |
| **2.Serpêhatî û Çîrokên Xerefatan** |
| 2.1.Terşê Şevê<br>2.2.Şêxê Barzan Çawa Firandin<br>2.3.Şeytanqûnî |
| **3.Serpêhatî û Çîrokên Xiniziyê** |
| 3.1.Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz<br>3.2.Terlan |
| **4.Serpêhatî, Çîrokên Dilêrî û Camêriyê** |
| 4.1.Mist-Awik<br>4.2.Şêrek Bi Darekî<br>4.3.Warê Min Ne î Kor e<br>4.4.Pira Genderê û Hemûşê Kulik<br>4.5.Beraz û Berazî<br>4.6.Mijo û Xane |

[68] Ev tablo ji aliyê Heyder Omer ve hatiye amadekirin. Di vê xebatê de ev tablo hatiye bikaranîn lê li ser hin guhertin hatine kirin. Ev tablo tabloya orîjînal e.

**Tablo 6:** Çîrokên Osman Sebrî li gor mijarê ev in

| **Çîrokên Osman Sebrî Li Gor Mijarê:** |
|---|
| **1.Çîrokên Lehengiyê** |
| 1.1.Li Goristaneke Amedê<br>1.2.Şîna Jinekê Li Ser Gora Birho |
| **2.Serpêhatî û Çîrokên Xerefatan** |
| 2.1.Terşê Şevê<br>2.2.Şêxê Barzan Çawa Firandin<br>2.3.Şeytanqûnî-1<br>2.4. Şeytanqûnî-2<br>2.5. Şeytanqûnî-3 |
| **3.Serpêhatî û Çîrokên Îxanetê** |
| 3.1.Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz<br>3.2.Nêçîra Hirçan |
| **4.Serpêhatî, Çîrokên Dilêrî û Camêriyê** |
| 4.1.Mist-Awik<br>4.2.Şêrek Bi Darekî<br>4.3.Warê Min Ne î Kor e<br>4.4.Pira Genderê û Hemûşê Kulik<br>4.5.Beraz û Berazî<br>4.6.Mijo û Xane |

**Tablo 7:** Çîrokên hatin analîzkirin li gor kovara tê de hatine weşandin

| Jimar | Navê Çîrokê | *Hawar* | Ronahî |
|---|---|---|---|
| 1 | Li Goristaneke Amedê | ✓ | |
| 2 | Şîna Jinekê | | ✓ |
| 3 | Terşê Şevê | | ✓ |
| 4 | Şêxê Barzan | | ✓ |
| 5 | Şeytanqûnî-1 | ✓ | |
| 6 | Şeytanqûnî-2 | ✓ | |
| 7 | Şeytanqûnî-3 | ✓ | |
| 8 | Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz | | ✓ |
| 9 | Nêçîra Hirçan | ✓ | |
| 10 | Mist-Awik | | ✓ |
| 11 | Şêrek Bi Darekî | | ✓ |
| 12 | Warê Min Ne î Kor e | ✓ | |
| 13 | Pira Genderê û Hemûşê Kulik | ✓ | |
| 14 | Beraz û Berazî | | ✓ |
| 15 | Mijo û Xane | | ✓ |

## 2.1.LI GORISTANEKE AMEDÊ[69]

**Kurteya Çîrokê**

Bêhna leheng (leheng-vegêr) teng dibe, diçe ber behra du sed gav dûrî malê, wextê digihê ber behrê, ba dikeve bin çengê wî û wî ji teyran, balafiran û kamilkan zûtir difirîne. Di ser Filistîn, Şerq el Urdun û Sûriyeyê re derbas dibe û di navbera Mêrdîn û Wêranşarê de xwe digihîne Diyarbekirê, li hêla Derê Çiyê tîrêjeke nûrê wekî keskesorê lê stûr bi ber çavên wî dikeve. Pêşî çavên wî diçirisin, paşê dide pey şopa tîrêjê û diçe. Wextê digihîje tîrêja nûrê wekî perperoka ku perên wê dişewitin, ji jor ve tê xwarê û dikeve. Cihê ku lê dikeve pêşiya balafirên Roman e. Ji ber ku du apên wî jî li vê derê veşartî ne, dizane ku li vê derê kîjan şexsên tarîxî veşartî hene.

Osman Sebrî, xwe digihîne tîrêja nûrê ya li pêş şemal dide, li vir zimanê wî tê girtin û nema zane çi bibêje. Bîstekê bi şûn de diaxive, bang li Şêx Seîd dike lê tu kes ranabe bersivê nadê û dîsa dewam dike:

-"Ey şehîdê gewre! Piştî mîrê ola Mihemed! Hîmê heyîna Kurdanî ye! Tu bi evîna xebata şehîdên kerr û Seyîdxan û Elîcan dikî ku hindê min bê fer nekî, ya ez ne hêjayî vê daxwziyê me?"[70]

Piştî vê bangê, êdî mecala qehreman namîne, bi dengeke girî dike zarîn, sê navan dibêje, deriyekî mezin ji erdê vedibe û yek jê derdikeve. Dibîne ku yê derketî Ezîz Axayê Silopî ye, jê re dibêje, bira îşev civîna mezin heye bes bike qêrîn û zarîn.[71]

Leheng derbasî hundir dibe, Ezîz Axa li pey derî digire. Dibîne ku derbasî alemeke din bû û hemû tiştên li vê alemê ji aqil der in. Leheng li vir pirsa civînê dike, jê re dibêjin her kes nikare beşdarî vê civînê bibe. Dû re pirsa her du apên xwe dike, jê re dibêjin ne li vir e li ber Dîcleyê ye. Ew jî digel xortekî dadikeve ber Dîcleyê, dibîne ku mamê wî li wê derê destnimêj digire. Gava ku çavên mamê wî pê dikeve hema radibe wî hembêz dike û destûra xortê digel Osman Sebrî dide, xort diçe. Sebrî, pirsa apê xwe yê din dike.

---

[69] Osman Sebrî, "Li Goristaneke Amedê", *Hawar,* j. 21, 5 Hezîran 1933, r.9-10-11-12-13-14.

[70] "Li Goristaneke Amedê", r.10.

[71] "Li Goristaneke Amedê", r.10.

Apê wî dibêje ew li cinetê dimîne, ku tu dixwazî ez te bişînim nik wî, di vê navberê de Osman ferq dike ku zimanê apê wî zimaneke têkûz e. Jê pirsa zimanê wî dike ku ewqasî çawa xurt bûye. Apê wî dibêje Şêx Esedê Hewlêrî hat cem me û me bi serokatiya wî civatek amade kir û ev civat li ser ziman xebitî.

Osman Sebrî di vê navberê de pirsa civîna mezin ji apê xwe dike. Jê dixwaze ku wî bibe civînê. Bi asansorê derdikevin tebeqeya nozdehan, xortekî li ber çapxaneyê rawestî ye. Mamê Sebrî pirsa began jê dike, xort dibêje çûne civîna mezin.

Mamê wî li pêş, ew li dû, dikevin nava çapxaneyê, dibinîn ku Doxtor Fûad dinivîsîne, Kemal Fewzî ji *Hawar*ê nivîsekê dixwîne. Osman Sebrî li vê derê pirsa Hecî Extî dike, dibêjin çûye welêt ku xeberan bîne.

Li vê derê Doxtor Fûad û Osman Sebrî li ser lingan sohbetê dikin û paşê Doxtor dibêje;

"-Ma dixwazî tu jî 'Hişyariyekê' bibe ji hevalan re?"[72]

"-Zor sipasan dikim. Gelekî minekar im ko yekê bibînim û bibim."[73]

Kemal Fewzî jê re Hişyariyekê tîne, ew jî hema rûpelan vedike, dinihêre, wextê di helbesta "Bijîjkê Welêt" de kûr dibe destek li mile wî dikeve, lê vedigere dinihêre ku milyaketek e, milyaketek jê re dibêje,

-"De rabe xorto! Şefeqê gewr kiriye, divê tu ji goristanê derbikevî."[74]

Osman Sebrî dibêje, ne min civîna mezin dît ne jî Şêx, ma çûyîna wiha dibe. Li ser vê gotinê, Doxtor Fûad jê re dibêje, here. Xebat ne bi tenê li vê derê ye, here li welêt bixebite. Êdî li ser gotinên hevalan jî nema dikare li wê derê bisekine, Hişyariyê dike destê xwe û dikeve rê, di wê navê de rûhistîn destê xwe diavêje wî destê. Ji ber vê yekê êşek dikeve milê wî.

---

73 "Li Goristaneke Amedê", r.14.

74 "Li Goristaneke Amedê", r.14.

Çîrok bi van hevokan diqede, "Min çavên xwe vekirin ku ez li ber behrê, li ser mêrgekê razayî me û min pişta destê xwe yê rastê di rex xwe de li kuçekî daye û xwîna germ jê tê. Hişyarî jî di destê min de tune bû. Şefeqê hin nûh gewr kiribû."[75]

### 2.1.1.Hêmanên Materyal

#### 2.1.1.1.Vegêr

Vegêr, ew kes e ku çîrçîrok, efsane, çîrok, romanê ji me xwîner-guhdaran re vedibêje. Vegêr "ew kesên ku ji bêjeya ewil a berhemê hemû bûyer û rewşên li dinya îtîbarî diqewimin bi dizîka bi guhên me de dibêje. Ew azad e, çawa dilê wî bixwaze dikare bi wî awayî çîroka xwe vebêje."[76] Ango em dikarin bibêjin ku vegêr her dem di navbera xwîner û berhemê de ye.[77]

Osman Sebrî di çîroka bi navê "Li Goristaneke Amedê" de hem vegêr, hem nivîskar û him jî leheng e.

Çîrok, bi vegêrê "ez" hatiye nivîsîn. Lewre çîrok weha dest pê dike, "Qefseng, li 'min' teng bûbû û têra dilê min nedikir."[78]

Vegêr "ez", bi qasî yê vegêr "ew" xurt nîne nikare bikeve dinya lehengên xwe û wekî îlahekî hemû bûyeran bibîne. Dinya wî bi tenê ew dinya ye ku li ser vegotinê tê avakirin. Û him vegêr û him jî ew kes e ku qala wî tê kirin. Yê ku ew nebîne û pê nizanibe xwîner jî nabîne û pê nizane. Ev jî kêmasiyek e û lazim e wekî kêmasiyekê bê nirxandin.[79]

Di paragrafa duyem a çîrokê de bûyer hatiye rawestandin, nivîskar agahî dane. Ev ji bo berhemê kêmasiyek e, lewre bala xwîner ji ser metnê diçe ser vegêr û herikbarira çîrokê radiweste. "Vegêrê ku dikeve nava xwîner û berhemê, ji aliyekî ve pêşiyê li wê herikbariya bûyeran digire."[80]

---

[75] "Li Goristaneke Amedê", r.14.

[76] İsmail Çetişli, *Metin Tahlillerine Giriş/2*, Akçağ Yay., Ankara, 2004, r.81.

[77] *H.b.*,r.81.

[78] "Li Goristaneke Amedê", r.14.

[79] Mehmet Tekin, *Roman Sanatı*, Ötüken Yayınevi, İstanbul, 2014, r.48.

[80] Tekin, *h.b.*, r.48.

Ev tevgera wî ji aliyekî ve herikbariya çîrokê serobino dike ji aliyê din ve nahêle ku xwandevan bikeve nav deryaya xeyalên nivîskar, “Ma divê nivîskar hemû agahiyên li ser lehengên xwe bi xwînerên xwe re parve bike?” û dibersivîne, “Ku neke çêtir e. Lewre tevgereke weha dibe sebebê belavbûna fikr, kelecan û hestên xurt ên xwîner, ji ber vê yekê agahiyeke bi vî şiklî bitalûke ye.”[81] Ev tevgera nivîskar ji bo berhemê qisûrek e.

### 2.1.1.2. Awayê Nêrînê

Di nav de çîrok û roman jî di hemû berhemên ku dinyayê ji xwe re wekî mînak digirin, li gor vê dinyayeke îtîbarî avadikin da “nêrîn-dîtin” heye. Li gor vê awayê nêrînê/bergeh (*point of view*) di metnên çîroksaziyê de, bersiva pirsan dide yên wekî zincîra bûyerê û hêmanên wekî mekan, zeman, kadroya şexsan ku di avakirina xelekên vê zincîrê de tên bikaranîn ji aliyê kê ve tên dîtin, ji aliyê kê ve tên îdraqkirin û ji aliyê kê ve ji kê re tên vegotin.[82]

Herweha jiyana her însanî li gor fikr û raman, tecrûbe, çand, pîşe, emr, zayend û her wekî din dikeve dirûvekî, wisa be mirov bi gelemperî bo awayê nêrînê dikare bibêje, li hemberî dinyayê fêmbarî û sekn, tecrûbe, çand, pîşe, zayend, haletî ruhiye û îdraq û awayê nirxandina me ye.[83]

Di vê berhemê de vegêr û yê ku qala wî tê kirin heman kes in, “Ji bo van taybetiyan jê re dibêjin leheng-vegêr.”[84] Di çîrokên bi vî awayî nivîsandî de hemû bûyer li gor dîtina vegêr ango leheng tênê nîşandan. Xwîner, her tiştî li gor dîtin, çand, ramana siyasî, pîşe, zayend, emr, tecrûbeyên xwe dibîne, dinirxîne û radigihîne xwîner. Xwîner, vegêr çi çawa bibîne ew jî wisa dibîne û dibihîse, herweha “vegêr, ziman û şêweya xwe bi kar tîne”[85]

---

[81] E.M. Foster, *Roman Sanatı,* (wer. Ü.Aytür), Adam Yay., İstanbul 1982, r.178.

[82] Şerif Aktaş, *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş,* Birlik Yay., Ankara, 1984, r.73.74.

[83] Çeşitli, *h.b.*, r.82.

[84] Aktaş, *h.b.*, r.100.

[85] Çetişli, *h.b.* r.81.

Leheng-vegêr raste rast ziman û şêweya xwe bi kar tîne. Di hevoka ewil a çîrokê de vegêr "ez-min" derdikeve pêş xwîner, "Îşev ji şeva pirtir bihna min teng bûbû. Dîsan derdê min serî bi derxistibû."[86]

Piraniya berhemên bi nêrîna vegêr-leheng tên nivîsîn "otobiyografîk"[87] in, vebêjêr piranî serpêhatiyên xwe bi devê kesê yekem neqil dike. Herweha wextê em bala xwe didin jiyana vegêr-leheng em serwext dibin ku her du apên wî hatinde dardakirin, di çîrokê de ev wiha derdikeve pêş xwîner,

"- Ma kesî te yê civakê li hir heye? Ko bikaribî werî diyarê civînê."[88]

"- Erê Axa heke ew jî ne weka min sê ser bin du mamên min li hire hene. Xeberê bide Şukrî û Nûriyê Mirdêsî bila destûra min bigirin da ko werim nik we."[89]

Nivîskar piranî di berhemên xwe da xwe, jiyana xwe dernaxin pêş, xwe vedişêrin "Lewre taybetiya romanûsê xas ev e: Hez nake qala xwe, jiyana xwe bike."[90]

Awayê nêrînê yê vegêr leheng herçiqas ji aliyê xwîner ve samîmî, vekirî û pêbawer were nirxandin jî "Nivîskarê ku ku vegêrek wiha hildibijêre, dinya îtîbarî ya berhemê bi serpêhatî, dîtin, gotin, nirxandina kesekî sînordar dike ku ev jî li gor nêrîna îlahî tê wê wateyê ku vegêr derfetên berfirehtir ji xwe dûr dixe."[91]

### 2.1.1.3. Rêzebûyer

Berhemên ku li ser hîmê vegotinê tên nivîsandin de "vak'a-bûyer" unsura herî girîng e,[92] lewre metn li ser bûyerê ava dibe. Bûyer li mekanek û di demekê de diqewime.

Di metnên edebî de bûyer bi awayên cuda tên honandin, hinek bûyer wekî xelekê zîncîrekê tên rêzkirin, hinek ji du an çend xelekan pêk tên. Carinan jî bûyer di nav bûyerekê din de tê ristin.

---

[86] "Li Goristaneke Amedê", r.9.

[87] Çeşitli, *h.b.*, r.86.

[88] "Li Goristaneke Amedê", r.10.

[89] "Li Goristaneke Amedê", r.10.

[90] Milan Kundera, *Roman Sanatı*, (wer. Aysel Bora) Can, Stenbol 2017, r.137.

[91] Çeşitli, *h.b.*, r.87.

[92] Şerif Aktaş, *Edebi Metinlerin Tahlili*, Kurgan Edebiyat Yay., Ankara 2015, r.41.

Rêzebûyer (*plot*) sîstemek e, rexnegiran bo bi awayekî sîstematîk nîşandana wê şiklên geometrîk bi kar anîne. "Ji bo pênasekirina rêzebûyerê termên geometrîk hatine bikaranîn; xêzeke dûz, xêzeke parelel, çember-xelek, bo nîşandana raperikîn û daketina aksiyonê jî sêgoşe hatine bikaranîn."[93]

Di çîroka Li Goristaneke Amedê de, bûyer serpêhatiya leheng-vegêr e. Di çîrokê de em du bûyeran dibînin. Bûyera pêşî ev e ku bêhna leheng-vegêr teng dibe, diçe ber Dîcleyê, li vê derê di nav deryaya xeyalan de dikeve xewê. Xewnekê dibîne û paşê şiyar dibe ku yên ku ew dîtine xewn e û sibeh e.

Çûna leheng a ber behrê ji bûyera esil re bûye çarçove. Bûyera esil di vê çarçoveyê de çê dibe. Di nava çarçoveya mezin û ya di hundirê wê de têkiliyek heye.

Lehengê çîrokê aciz dibe û diçe ber behre. Li wê derê di xew re diçe. Xewnekê dibîne û bûyer heta şiyarbûna leheng dewam dike. Ev tevgera wî ji aliyekî ve herikabariya çîrokê serobino dike ji aliyê din ve nahêle ku xwandevan bikeve nav deryaya xeyalên nivîskar.

#### 2.1.1.1.4. Leheng

Di berhemên edebî de sîstemek heye, "Roman, sîstemeke ku bi hin unsûran hatiye vegirtin e."[94] Di berhemên edebî yên wekî roman, çîrok, çîrçîrok, efsane û tiyatroyê da cih, dem, bûyer û leheng girîng in.

Lehengên berhemê mecbûr in ku bi bûyer, tema û atmosfere ve têkildar bin. Heke di nav ûnsûrên sereke yên wekî vegêr, leheng, dem, cih, temayê de têkiliyeke xurt nebe berhem nikare bikeve dirûvekî xwezayî; herweha "lehengên romanê mecbûr in ku guh bidin daxwazên nivîskar."[95]

Vegêr lehengê sereke ye, lê li tu derê navê xwe bi kar neaniye. Herweha lehengên din ên di dewama çîrokê de derdikevin pêşiya me jî hemû bi navên xwe yên rastî di çîrokê de cih girtine. Vegêr, lehengên din ji tarîxê wergirtiye, ew şexs in ku tevlî bûyerên Serhildana Şêx Seîd û Agiriyê bûne û paşê hetine darvekirin. Ehmedê Xanî ku di warê edebiyata Kurdî de berhemên girîng dane lehengekî çîrokê ye.

---

[93] Necla Aytür, *Amerikan Romanında Gerçekçilik,* DTCF. Yay., Ankara 1974, r.30.

[94] Tekin, *h.b.*, r.79.

[95] Philip Stevick, *Roman Teorisi*, (wer. Sevim Kantarcıoğlu) Akçağ Yay., Ankara 2017, r.165.

Lehengên çîroka “Li Goristaneke Amedê” rasteqîn in. “Mesela çîroka Osman Sebrî ya Li Goristaneke Amedê bi lehengên rasteqîn tijî ne; lê di wir de ne Kemal Fewzî, ne Hesen Xeyrî, ne Ezîz Axayê Silopî û ne jî her du mamên wî Şukrî û Nûrî yên ku bi Şêx Seîd re hatin dardakirin şexsiyetên tarîxî nin; ew di wê çîrokê de ji bo bûyereke xeyalî bûne lehengên rastiyeke çîrokî.”[96]

Herçiqas lehengê çîrokê ji dîroka rasteqîn ketibin nav dinya îtibarî ya nivîskar jî di dinya îtibarî de ew êdî ne ji jiyana rasteqîn in ew êdî kirasê lehengiyê li xwe kirine di nav destê nivîskar de li gor fikr û ramanên wî tevdigerin, “Mebest ji van gotinan ew e ku dema edebiyat tarîxê û şexsiyetên tarîxî ji xwe re dike mijar, di nav hebûneke çîrokî de ye êdî.”[97]

**Şêx Seîd:** Lehengê ku herî pêşîn em wî dibînin; Şêx Seîd e. Lê vegêr behsa taybetiyên fizîkî û psîkolojîk ên Şêx Seîd nekiriye. Bi tenê lavelav jê dike û di wê navberê de behsa xebatên wî dike ku ji bo Kurdan kiriye.

“-Ey qencê Xwedê! Qesda min ziyaretkirin û dîtina welêt û vî erdê ku ji şêr û lehengan tijî û ji vê jana di dilê xwe re jî dermanek ji cenabê we xwastin bû. Lê ev ê tîrajan perên min sotin û ketime xwar ve ka tu ji min re çi dibêjî?”[98]

Dema ku em berê xwe didin bîranînên Osman Sebrî, em dibînin ku haya wî ji serhildana Şêx Seîd heye. Heta ji ber alîkarî û piştevaniya ku her du apên wî (Şukrî û Nûrî) didin serîhildana Şêx Seîd tên darvekirin.

**Ezîz Axayê Silopî:** Wextê Osman Sebrî dest bi lavelavê dike, derdikeve. Sebrî bere wî di zindanê de diye û wî nas dike. Dergevanê civîna mezin e.

**Şukrî û Nûriyê Mirdêsî:** Her du Apên Osman Sebrî ne. Ji karên siyasetê xwe ragirtine û ji ber vê yekê beşdarî civîna mezin nebûne. Lê xebatên xwe yên di qada welêthezî û ziman de didomînin.

**Şêx Esedê Hewlêrî:** Serekê Civata Zanînê ye. Hatiye darvekirin. Li vir bi pêkanîna ferhenga mezin re mijûl dibe.

---

[96] Remezan Alan, *Zanista Edebiyata Modern*, Weş. Peywend, Stenbol 2015, r.97.

[97] Alan, *h.b.*, r.97.

[98] “Li Goristaneke Amedê”, r.10.

“Şêxê Neqşîbendî, di sala 1835an de li Erbîlê hat dinyayê. Piştî ‘Bûyera Menemenê’ di sala 1930yî de tê girtin û di 96 saliya xwe da, di sala 1931ê de bi derziya jehrê tê îdamkirin. Ev Şexs bi navê Şêx Esedê Erbîlî jî tê nasîn. Tê gotin ku Şêx Esed kalê şovmen Mehmet Alî Erbîl e.”[99]

**Salih Begê Hênî:** Bi koma zimannasan re li ser ferhenga mezin dixebite.

“Tê gotin ku bi eslê xwe ji nijada Hz. Ebbas e, di xebatên “Kurd Teavun û Terraki Cemiyeti” de cih girtiye. Piştî Serîhildana Şêx Seîd hatiye bidarvekirin.”[100]

**Kemal Fewzî:** Birêvebirê çapxaneya çapkirina kovara “Hişyarî”yê ye. Herweha şexsiyetekî tarîxî ye. “Damezrînerê ‘Kurt Teşkîlat-i İçtimaiye Cemiyeti” ye. Piştî serîhildana Şêx Seîd hatiye dardekirin.”[101]

**Hesen Xeyrî:** Hesen Xeyrî, Mebûsê Dêrsimê ye, piştî serîhildana Şêx Seîd hatiye dardakirin.

**Hecî Extî:** Di kovara “Hişyarî”yê de dixebite, xebergihan e. Osman Sebrî di bîranînên xwe de behsa wî dike.

**Doktor Fûad:** Yek ji xebatkarên Hişyariyê ye. Wextê diçin çapxaneyê dibînin ku nivîseke bi serenavê “Cendekê Bê Serî, Destên Çûne” dinivîsîne.

**Ehmedê Xanî:** Ehmedê Xanî, çavdêrê hemû xabetên li ser ziman e, di çîrokê de bi wezîfeyeke girîng derdikeve pêşiya me, lê li ser jiyan û xebata wî tu agahî tune ne. “Ehmedê Xani, di nav hozanên edebiyata Kurdi ya klasîk da, navê herî mezin û bi rûmet e. Xanî, bi afirandinên xwe yên giranbiha, edebiyata Kurdî ya nivîskî dewlemendtir û bilindtir kiriye."[102]

Di çîrokê de hemû leheng li gor daxwaz û ramana vegêr-leheng tevdigerin. Hemû leheng erênî ne û di nav wan de tîp an lehengên dijraber tune ne. Heke li hemberî lehengên erênî yên dijber hebûna wê aksiyon çêbûya û bala xwîner bêtir wê bihata kişandin.

Leheng li gor statuya xwe ya civakî, emr, zayend, çanda xwe tevdigerin.

---

[99] Mem Bawer, “Li Goristaneke Amedê Xewna Azadiyê,” *W*, j. 51, Gulan 2014, r.42.

[100] Bawer, *h.g.*, r.42.

[101] Bawer, *h.g.*, r.42.

[102] A. Nûbar, *“Ji Nav Edebiyata Kurdî ya Klasîkî”, Roja Nû,* j. ,58, sal.8, 1987.

### 2.1.1.5. Dem

Ji ûnsûrên sereke yên çîrok, roman û tiyatroyê yek jî dem e. Bûyer di demekê de diqewime û vegêr wê di demekê din de vedibêje, bi kurtasî "di roman û çîrokan da du demen ji hevûdin cuda hene ji vana yek 'dema vak'a' yê ya din jî 'dema vegotinê' ye."[103]

Nivîskar wextê bûyerek neqil dike ne li gor jiyana rasteqîn li gor şert û merc û rêgezên dinya hunerê tevdigere. Jixwe ya girîng ne wextê bûyerê ye, ya girîng ew e ku vegêr dema qewimîna bûyerê bi hostetî neqil bike, di nav honaka berhemê de, plana demê baş bi cih bike û berhemê ji aliyê demê ve bike dirûvekî edebî. "Lewre tiştê ku berhemê dike dirûvê edebî ne dema reel e, dema îtibarî (çîroksazî) ye ku ji aliyê vegêr ve tê avakirin."[104]

Lazim e bê qebûlkirin ku dem di metnê edebî de xwedî ciyekî girîng e, "Lewre hêmaneke sereke ye ku berhem li ser tê avakirin"[105]

Di çîrokê de dem, şevek e. Leheng-vegêr diçe ber behrê, li wê derê di xew re diçe, xewnekê dibîne û wextê ber destê sibehê şiyar dibe fêm dike ku ew hemû xewn bûn. Yanî ji êvarê dest pê dike, danê sibê bi dawî dibe. Hemû bûyer di nav van çend saetan de diqewime. Lê nivîskar demê bi awayekî estetîk fireh dike û bûyeran bi wî awayî bi xwînerên xwe, dide zanîn.

Çîrok weha dest pê dike, "Îşev, ji şevan pirtir bêhna min teng bûbû."[106] Em fêm dikin ku dem şevek ji şevan e.

Wextê şiyar dibe şeveq e. Di çîrokê de tê gotin, "Min çavên xwe vekirin ku li nêzîkê behrê, li ser mêrgekê razayî me û min pişta destê xwe yê rastê di rex xwe de li kûçekî daye û xwîna germ jê tê. Hişyarî jî di destê min de tune bû. Şeveqê hin nuh gewr kiribû."[107]

---

[103] Çeşitli, *h.b.*, r.73.

[104] Aktaş, *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, r.117.

[105] Tekin, *h.b.* r.135.

[106] "Li Goristaneke Amedê", r.9

[107] "Li Goristaneke Amedê", r.13

### 2.1.1.6. Mekan

Mekan, ew sehne ye ku bûyer li ser diqewime. Di navbera mekan û bûyerê de têkiliyeke pir girîng heye, "Lewre, mekanê ku meriv lê dimîne yek ji wan hêmanan e ku karakterê însan diyar dike."[108]

Me li jorê di beşa awayê honandina çîrokê de diyar kiribû ku çîrok ji du xelekan pêk tê; di xeleka pêşîn de ku ji bûyera esil re bûye çarçove, cih keraxê behrê ye. Leheng-vegêr, aciz dibe diçe ber behrê û li vê derê bi xew re diçe. Wextê şiyar dibe, dibîne bûye sibeh û li ser mêrgekê ye. Di bûyera esil de cîh; goristaneke li Diyarbekirê ye.

Bawer ji bo cih dibêje, "Osman Sebrî di tevna çîroka xwe de goristan wekî cih hilbijartiye. Giringiya vê yekê jî berbiçav e, ji ber ku gava kesên ku xwestine di qada tarîxê de Kurdan û zimanê wan bin ax bikin, ew darve kirine, kuştine, hin kesan avêtine zindanan, hin kesan jî ji axa wan dûr xistine şandine sirgûnê û xwastine ku ziman û hebûna wan di goristana jiyanê de binax bibe û bimire. Lê em dibînin ku gava lehengê çîrokê ber bi civîna mezin ve diçe, qesreke mezin dibîne ji apê xwe dipirse dibêje ev çi avahî ye? Apê wî dibêje ev Qesra Civata Zanînê ye. Û axaftina xwe didomîne dibêje tu dizanî Hişyarî li vê derê derdikeve."[109]

Vegêr-leheng li vê derê ji dinyaya lê dijî derbasî alemeke din dibe. Em li vê derê şopên Îslamiyetê dibînin. Di Îslamiyetê de piştî mirinê axret heye. Li wê derê dojeh û bihûşt hene, mirî li tebeqeyên wê derê li gor kirinên xwe dimînin.

Alema din ji ya dinyayê cuda ye. Em dibînin ku kêmasiyên dinyayê li alema dine nînin. Ew alem bi her awayî birêkûpektir e.

Di çîrokê de behsa civîna mezin tê kirin. Wextê leheng dixwaze here cihê lê civîna mezin tê lidarxistin, mamê wî dide pêşiyê û wî dibe.

"…Em bi rê ketin. Qesreke bê awa mezin hate pêşiya me. Min pirs kir got: 'Ev qesra civata zanînê ye?' Û me xwe gihandê, nûh avakiribûn, qesreke wilo mezin bû

---

[108] Çeşitli, *h.b.*, r.77

[109] Bawer, *h.g.*, r.41.

ku ‘Yildêz’ nayên bîra mirov, ez ecêbmayî bûbûm. Gelo tûbê qesra civîna mezin çilo bû? Em gihane derê qesra zanînê…”[110]

Em dibînin ku li qesrên mezin û biheybet li ser ziman civîn tên kirin. Çapxane hatine avakirin li vê derê, kovara “Hişyarî”yê tê çapkirin. Hemû zanyar û qehreman li vê derê kombûne.

Di çîrokê de xebatên lehengan, kesayetiya wan û cihê ku vegêr ji bo wan hilbijartiye li hevûdin tên. Lewre hemû leheng ji tarîxê hatine hilbijartin, di rêya welêt û ziman de xebat kirine. Eşkere ye ku qîma xwe bi xebatên li vê dinyayê kirî neanîne, yan nîvco mane, berpirsiyariya-mesûliyeta xwe li wê derê bi cih tînin.

**2.1.1.7. Ziman û Şêwe**

Zimanê çîrokê zimanê jiyana rojane ye, zimanekî sade û herikbar e; zimanê *Hawar*ê[111]ye. Ji serî heta dawiyê zimanekî siruştî hatiye bikaranîn. Çîrok li ser diyalogan hatiye honandin. Wexta mirov bala xwe dide axaftina lehengan, hemû bi zimanekî sade û têkûz diaxivin. Ji xwe piraniya lehengan li ser ziman dixebitin, dinivîsîn.

Çîrok bi diyalog û axaftinê ketiye dirûvekî şirustî û herikbar. Ziman zimanekî edebî ye, nivîskar bi şibandinên orjînal, teswîrên mîna tabloyên rengîn vegêranê xurt dike: “Şaxên mor li kolana dev bernexûn diyar bûn”, “tezînê sar di binê lingan heya qotê serî diçûn”, “wekî nexweşê ko ta li serî dide min dixwest cilên xwe biçirînim”, “zarîna teyrekê şevê di zik hev de wekî lorika diyan li ber dergûşê bi canê min şadibûn, weka perperokê ko per dişewitin ez di jor da hatime xwar”.

Di berhemê de xalbedî jî balkêş e, vegêr di navbera metn, hest, tema û xalbendiyê de peywendiyeke xurt çêkiriye. Wextê em li ser metnê hûr dibin ev hevokên wekî “Kela gîhana welêt. . . kela gîhan welêt...”,” Tu . . . tu”, “Cihabek... du pirs... dilxweşiyek. . . çi dibe?”, “hey lo pepûko” em dibînin ku bi sêxal, pirs û baneşanan vegêr dixwaze di gihanê xwîneran de hestekê çêbike.

Di nav metnê de biwêj (ziman hatibû girtin), cotepeyv (dest best), ravekên hevalnavî yên orîjînal (êşek evînî) hene.

[110] “Li Goristaneke Amedê”, r.12.

Leheng ji bo dîtina Şêx Seîd, ji bo beşdarbûna civîna mezin lavelavê dike. Di hevokên wî de tim banglêkirin, gazîkirin heye. Ev yek derûniya lehengî jî dide der. Lewre ew ji welatê xwe dûr e, ji civata zanyar û zanayên ku dixwaze li ba wan be, dûr e.

Vegêr hemû lehengên xwe ji nav nivîskar, zana û zimannasên tarîxê hilbijartiye. Heta her du mamên xwe yên zimanê wan hinek qels jî kirine şagirdê koma zimanzanan û wan jî bi zimaneke têkûz û herikbar daye axaftin.

Xebata lehengan li ser ferhengê ango li ser zimên e, ma gelo mimkin e ku komeke weha zimanekî qels bi kar bîne.

Vegêr, li gor atmosfera avakirî zimên bi kar aniye. Em dikarin bibêjin ku peywendiya lehengên vegêr a bi atmosfera çîrokê ve zaf girêdayî ye û serkeftî ye.

Berhem, zarokên serdema xwe ne. Wextê mirov serdema nivîser dide ber çavên xwe, hê nû kovara *Hawar*ê tê çapkirin, zana hê nû dest bi xebatên li ser zimanê Kurdî dikin, yanî di wê serdemê de nivîsandina çîrokekê weha nîşaneya biserketinê ye.

**2.1.1.8.Raman-Tema**

Çîrok utopyaya vegêr bi xwe ye. Xeyalên ku li dinyayê nehatine cih xwestiye bi awayekê din bide nîşan.

Çîrok ji aliyê honak, ziman û şêweyê ve serkeftî ye. Lê wekî ku me li jorê di bin serenavê vegêr, awayê nêrînê, leheng de jî şîrove kir hin kêmasî jî hene. Lewre hemû leheng bi awayê ku vegêr dixwaze biaxivin, diaxivin ango di xizmeta vegêr de ne, leheng hemû xwedî taybetiyên erênî ne, hemû li ser ziman û di rêya welat de dixebitin. Lê ji bo di metnê de hinekî aksiyon çêbe, xwîner kelecanî bike divê lehengên dijraber jî hebin.

Temaya sereke ya çîrokê welat û ziman e. Hemû şexsên çîrokê ji bo welat hewlek dane û li ser ziman keda wan heye.

Vegêr di atmosfereke utopîk de daxwaz û xeyalên xwe bi rêya çîrokekê vegotiye. Goristan, Amed, xewn, serhildan, hişyarî, ruhîstîn, melek, bihûşt, civîna mezin, qata xebatên welêt, Ferhenga Mezin, Şêx Seîd, Ehmedê Xanî di çîrokê de wekî sembol hatine bikaranîn. Ev sembol naverok û binhişê nivîskar jî didinê der.

Di çîrokê de “goristan” semboleke girîng e. Wextê em bala xwe didin sernavê çîrokê em dibînin ku behsa goristanekê tê kirin. Bûyera sereke ya çîrokê li goristanekê diqewime.

Wextê mirov dimirin li goristanê têne defnkirin, goristan di heman demê de destpêkeke nû ye ji bo mirovan. Goristan bêrîkirin e, lewre hezkiriyên me yên ku dimirin li goristanê ne.

**2.1.2.Hêmanên Teknîkî**

**2.1.2.1. Rêbaza Vegotinê**

Rêbaza vegotinê rêbazeke ku hertim vegêr derdikeve pêş metnê. “Di metnekê de heke bal bi gelemperî li ser vegêr be, tê wê wateyê ku di wê metnê de ‘rêbaza vegotinê’ tê sepandin. Di vê rêbazê de vegêr bi awayê vegotina çîrokê, agahiyên wextê vegotinê dide û bi ravekirinên xwe ve bala xwîner hertim dikişîne ser xwe.”[112]

Di çîrokê de em her tiştî bi çavên vegêr dibînin. Em hemû bûyeran û kesan bi çavên wî dibînin. Vegêr tim li pêş metnê ye, carinan di nav metnê de agahiyan dide xwîner.

**2.1.2.2.Teswîr**

Koka teswîrê, suret e ku ev jî peyveke Erebî ye. Wateya peyvê resim, fîgûr, suret e û bi peyvan resimkirin e. Bi awayekî din teswîr hunera “terîfkirin û nîşandana eşya ye.”[113]

Di metnê edebî de teswîr girîng e, bi saya teswîrê em ji sehna bûyerê serwext dibin ku ev jî di berhemê de ji yek hîmên sereke e. Em heta mekan nas nekin em bûyerê bi giştî nikarin fêm bikin, lewre di navbera van ûnsûrên bingehîn de têkiliyeke xurt heye.

Di çîrokê de teswîr kêm in. Lehengên çîrokê bi tu awayî (fizîkî-derûnî) nehatine teswîrkirin. Em bi tenê teswîra mekanî dibînin. Ew jî bi hûrgilî nîne,

---

[112] Tekin, *h.b.*, r.207.

[113] Nihat M. Özon, *Türkçede Roman*, İletişim Yay., İstanbul 1985, r.113.

“…Qesreke bê awa mezin hate pêşiya me… Û me xwe gihanedê, nûh ava kiribûn, qesreke wilo mezin bû ku Yildêz nayênin bîra mirov, ez ecêbmayî bûbûm…”[114]

#### 2.1.2.3.Diyalog

Di jiyana rojane de ziman girîng e, lewre hemû însan bi ziman xwe îfade dikin. Carinan tenê diaxivin carinan jî bi kesê li hember xwe re diyalogê datînin. Diyalog “axaftina dualî ye ku herî kêm di navbera du însanan de çêdibe.”[115]

Di berhemên edebî de diyalog ji ûnsûrên sereke yên vegotinê ne. “Vegêr derfeta axaftinê dide lehengên xwe ev jî rê li pêşiya leheng vedike ku ew xwe bi xwînerên xwe bide nasîn. Herweha ev axaftin di derbarê karakter, çand û statuya civakî ya leheng de jî agahiyan dide me.”[116]

Di destpêkê de hemû tiştên ku dikevin nav berhemên edebî bêrih û can in. Dema ku dikevin ber deste nivîskar ew “eynî Mesîh rih dide wan; wan vedijîne wisa derdixe pêş xwîner.”[117] Ji bo ku ev pêk bê “diyalog” tên bikaranîn ev jî giringiya diyalogan nîşan dide.

Rêbaza herî şirustî diyalog e. Em dikarin bibêjin ku çîrok ji destpêkê heta dawiyê li ser diyalogan hatiye honandin. Em xebat û kirinên lehengan ji vê atmosfera bi diyalogan avakirî, dibînin.

- “Serekê civata zanînê kî ye?”[118]

-“Serek Şêx Esed Efendî ye, nivîsevan Salih Begê Hênî û diwanzdeh jî libatên wê hene. Ev salek e bi pêkanîna ferhenga mezin mijûl dibin.”[119]

-“Tu zanî mamo! Tirko zimanê me rakiriye?”[120]

-“E, berî çardeh rojan min di Hişyariyê de xwendibû.”[121]

---

[115] Çeşitli, *h.b.*, r.102.

[116] Çeşitli, *h.b.*, r.103.

[117] Tekin, *h.b.*, r.277.

[118] “Li Goristaneke Amedê”, r.12.

[119] “Li Goristaneke Amedê”, r.12.

[120] “Li Goristaneke Amedê”, r.12.

[121] “Li Goristaneke Amedê”, r.12.

-"Ma tu rojnameyên we hene?"[122]

### 2.1.2.4.Teknîka Otobiyografîk

Hema her nivîskar di berhemên xwe da qala jiyana xwe dike, ji tecrûbeyên xwe sûdê werdigire. "Heta hin nivîskar tenê qala jiyana xwe dikin."[123] Lewre otobiyografî yek ji cureyên edebî yê herî kevn e. "Di sîstemeke wiha ya vegotinê de, xwîner hemû tiştî bi nêrîna vegêr dibîne."[124] Berhemên otobiyografîk te awayê nêrînê û çarçove pir teng e "Di destê nivîskar de tenê kesek bo çavkaniya agahiyê heye, tenê ev tê bikaranîn"[125]

Di "Li Goristaneke Amedê" de, em gelek tiştên ku hatine serê Osman Sebrî dibînin. Sebrî di bîranîn xwe de qala darvekirina apên xwe (Şukrî, Nûrî), qala serîhildana Şêx Seîd dike. Wextê em li ser çîrokê hûr dibin em van tecrûbeyên vegêr di metnê de dibînin ku bi awayekî edebî di atmosfereke utopîk de hatine honandin.

### 2.1.2.5. Leîtmotîv

Wateya leîtmotîvê "motîfa rêber, motîfa esil"[126] e. Leîtmotîv, têgeheke ku di muzîkê de tê bikaranîn û ji muzîkê derbasî edebiyatê jî bûye. Wekî terza vegotinê leîtmotîv "di metneke edebî de bi hin wesîleyan dubarekirina tevger, helwest an gotinekê ye."[127] Nivîskaran bi demê re ev teknîk bi kar aniye. Ev teknîka ku bi taybetî romanûsên naturalîst serî lê daye; bo nîşandana taybetiyên berbiçav ên karakterên vegêranê hatiye bikaranîn.

Ji ber ku çîrok bi qasî romanê dirêj nîne û derfetên vegotinê yên romanê di destê çîrokê de tune ye, di çîrokê de zedê nayê bikaranîn. Lê di vê çîroka navborî de hatiye bikaranîn ku ji şeş rûpelan pêk hatiye. Di çîroka "Li Goristaneke Amedê de", navê rojnameya "Hişyarî"yê pênc û yê "Civîna Mezin" heft caran dubare dibe. Bi saya dubarekirina heman peyvan bala xwîner tim li ser hişyarî û civîna mezin e ku ev jî daxwazên vegêr bi xwe ne.

---

122 "Li Goristaneke Amedê", r.13.

123 Tekin, *h.b.*, r.271.

124 Tekin, *h.b.*, r.272.

125 Ünal Aytür, *Henry James ve Roman Sanatı*, DTCF yay., Ankara 1977, r.31.

126 Çeşitli, *h.b.*, r.111.

127 Çeşitli, *h.b.*, r.111-112.

### 2.2. ŞÎNA JINEKÊ [128]

Ev çîrok dişibe çîroka bi navê "Li Goristaneke Amadê." Ji çar rûpelan pêk tê. Di nav çîrokê de loriyeke dirêj û lomeyek hene. Wekî ku di serenavê çîrokê de jî diyar e, şîn heye, bûyer li goristanekê rû dide. Lehengê sereke yê bûyerê; vegêr e. Çîrok, li gorî taybetiyên xwe çîrokeke otobiyokrafîk e. Herweha em di vê çîrokê de afirandin, honandin û helbestvaniya Osman Sebrî bi hevûdin re dibînin.

**Kurteya Çîrokê**

Çîrok weha dest pê dike, "Îşev di mecala razanê de keserên felata welêt, kûfîn û zarînên dîliyê û bêkesiya me Kurdan, wekî tevazan ji dilê min va diyar bûn."[129]

Vegêr, ji ber derd û kulen welêt, dike û nake nikare rakeve. Di nava nivînan de li ser teniştа rast û çepê diçe û tê. Paşê di xew re diçe û xewnekê dibîne. Dibîne ku dengê hejîneke mezin ji çiyê, deryayê, ezmên û stêrkên pêşberî wî tê. Bi hejînê re erd diqelişe, bi hilweşînê re ew dipengize. Demekê li ser erda nenas a pengiziye wisa dimîne. Radibe ser xwe, li dorbera xwe dinêre ku cihê lê ye, Çiyayên Araratê ne: Berê xwe dide Ararata biçûk. Wextê digihîje serê Araratê dixwaze gora Birho bibîne. Hê ku nagihê ser gorê, dengê jinekê dibihîse. Herweha carcaran jî nalîna zarokekê tê ber guhên wî. Bala xwe didê ku jineke zarokek li ber dilan, berî wî çû ser gora Birho. "Wê berî min xwe gihande qûnçê; bi gihêştinê ra dengê qîrîn û zarîneke dilsoj bi ser ket. Welê bi awakî zîz û kezebxur dest bi şînê kir û lorand ko kevir li ber dihelîn."[130] Jina digihîje ser gorê, dest bi şînê dike, dilorîne û zêmareke dirêj dibêje. Em bi vê zêmarê fêm dikin ku ev jin, jina Birho ye, çar kurên wê û mêrê wê mirine. Dergûşa yek salî ya di hembêzê de birîndar kirine û ew jî rastî destdirêjiyê hatiye.

Piştî demekê diweste, disekine. Wextê disekine, di ser biçûkê xwe re xwar dibe, dibîne ku cendekê wî sar bûye û dilê wî lê nade. Diqîre…

---

[128] Osman Sebrî, "Şîna Jinekê", *Ronahî*, j. 21, 1 Kanûna Pêşîn 1943, r.5-6-7-8.

[129] "Şîna Jinekê", r.6.

[130] "Şîna Jinekê", r.6.

-“Aha aha, ew jî mir; ew jî çû... Êdî tu tiştê ko min bi jînê va girêbide nema. Namûs çû, mêr çû, keç çû, çar kur şewitîn; bi tenê di dest min de ev çêlî, ev gede ma bû, niha jî ew çû…”[131]

Piştî vê axaftinê dest bi zêmarê dike û wextê disekine, her du guliyên xwe li dora stûyê xwe dibe û tîne û ew jî li ser gorê dimire.

Vegêr, tê ser gorê, li ser laşê her duyan xwar dibe, ew jî dest bi lomeyan dike.

- “Ma gelo ev çi zînat bû?... Hey em giştik gunehkar; lê vî biçûkê du sal û nîvî çi kiribû ko Yezdan sînga wî dabû, ber singoya neyar? An ew cezayê gunehên ko bav û kalên wî kiribûn dihate pêşiya wî?”[132]

Dinêre ku tu tiştekî ji destê wî nayê, berê xwe dide ezmên û dest bi gazinan dike. Piştî demekê dengekî xurt gazinên wî dibire;

-“Ho xort! Ji bo çi beradayî gazindan dikî? Xwedê çawan neyarên we afirandine hûn jî welê afirandin. Li nik wî hûn hemû yek in. Lê dinê qada xebatê ye; Eger hûn xwe ketî û nizim dibînin, teqez ew ji dest necamêrêya we ye. Bixebitin û paşê bazgûrî Xwedê bibin; Eger daxwaza we ne de hînga gazindan bikin.”[133]

Piştî kurte-axaftinekê bi dengekî xurt re şiyar dibe. Wextê şiyar dibe, dibihîse ku dîk bang didin û ev gotin li ser zimanê wî ye: “Bi gur be ku tu gurxwarî nebî”.

### 2.2.1. Hêmanên Materyal

#### 2.2.1.1 Vegêr

Leheng-vegêr, di heman demê de lehengê sereke yê çîrokê ye**.** Em bûyerê ji wî dibihîzin, bi çavên wî dibînin. Bi vê taybetiya xwe “Şîna Jinekê” dişibe çîroka lehengiyê ya bi navê “Li Goristaneke Amedê.” Vegêrê her duyan jî leheng-vegêr e.

Xwîner ji serî heta dawiyê bûyerê bi hişmendî û dîtina leheng-vegêr dibîne. Tenê wextê axaftina jina Birho gotinê dide destê jinê lê ew jî li gor daxwaza vegêr-leheng tevdigere û dipeyive.

[131] “Şîna Jinekê”, r.7.

[132] “Şîna Jinekê”, r.7.

[133] “Şîna Jinekê”, r.8.

Agahiyên di berhemên ku li gor nêrîna kesê yekem "ez/min"ê tê nivîsîn bi qasî yê bi nêrîna nivîskar "ew" tê nivîsîn berfireh nînin. "Lewre vegêr leheng-vegêr e. Ji ber vê yekê bi qasî dîtina xwe vedibêje."[134] Leheng-vegêr, di çîrokê de gotinê radestî jina Birho dike, li vê derê teknîka monolog, monologa navxweyî, paşve-vegerînê pê dide bikaranîn. Jixwe "nivîskar, wextê vegêrê ku erka vegotinê dide destan bi qasî ku ew dixwaze wî/wê ji bo çîrokê bide axaftin, teknîkên vegotinê yên cuda bi kar tîne."[135]

### 2.2.1.3. Awayê Nêrînê

Di metnên edebî de bûyer ji aliyê lehengek ve tenê vegotin. Di berhemên otobiyografîk de leheng-vegêr tê bikaranîn. Di metnên wiha de "bi kurtasî vegêr ji lehengan ra dibe yek. Bi vî awayî çand, mîzaç, şert û mercên psîkolojîk û sosyolojîk ên leheng-vegêr li ser metnê xwe nîşan dide. Herweha ziman û şêwe jî ya wî ye."[136]

Leheng-vegêr şêweya "ew" û ez"ê bi hev re bi kar aniye. Di destpêkê de "ez", wextê neqilkirina jina li ser gorê şînê dike "ew" û di dawiyê de dîsa şêweya "ez"ê bi kar aniye. "Ji bo van taybetiyan jê re dibêjin leheng-vegêr."[137] Di çîrokên bi vî awayî nivîsandî de hemû bûyer li gor dîtina vegêr ango leheng tenê nîşandan. Xwîner her tiştî li gor dîtin û gotina lehengê vegêr dibîne û dibihîse. "Vegêr, ziman û şêweya xwe bi kar tîne"[138]

### 2.2.1.4. Rêzebûyer

Vegêr, bûyerê di nava çarçoveyekê de dide. Bûyera çarçove, raketin-şiyarbûna leheng e. Bûyera sereke xewa lehengê sereke ye. Leheng-vegêr di xewa xwe de dibîne ku erd diheje, ew di nav axê de dipengize ber bi çiyayên Araratê. Dixwaze gora Birho ya li vir ziyaret bike bala xwe dide jineke ku ber bi gorê ve diçe û dilorîne.

---

[134] Hasan Çakır, *Öykü Sanatı*, Çizgi Kitapevi, Konya, Eylül 2002, r.187.

[135] Alpay Doğan Yıldız, *Hikaye İncelemeleri*, Dergah Yay., İstanbul, Haziran 2016, r.124.

[136] Aktaş, *Edebî Metinlerin Tahlili*, r.83.

[137] Aktaş, *Roman Sanatı ve İncelemesine Giriş*, r.84.

[138] Çetişli, *h.b.*, r.56.

Rabe de rabe Birho de rabe,
Bo çi Ararat te hişt xefabe!..
Îro dîsa hat Roma bê eman
Gund şewitandin nehişt xwedî can

Geliyê Zilan sotin wek xîjî
Pê ra şewitîn çar kurên min jî
Dema ko Rom li me vemitikî
Keçek min mabû ew jî hurikî

Bes gedek maye singo lê dane
Mirin û mayin Xwedê dizane
Rabe binêre li gedekê min
Hene çend birîn li cendekê min

Mêrên me kuştin bêbav neyaran
Em tev reviyan li şûna waran
Bi serên me va nema têlek por
Şûna lajangan tev da bûn reş mor

Keç û bûk neman bê namûs kirin
Herçî ko çak bûn ji xwe re birin
Me namûs nema çû di talanê
Şermende ne em li pêş cihanê

Bêhnek rihetî ji bo me nîne
Her gav li ser me holê qîrîn e
Nema me xwedî tola me rake
Roman bikuje welêt ava ke

Piştî tu mirî welat ker û lal
Bi hêlekê ma Ferzendê dêlal
Bêbext felekê ne da te hêwan
Da bixebitî wek şêr û dêwan

Hergav li ser kir dengê te dihat
Hestên welatî dibûne kelal
Îro dinhêrim kelatên Kurdan
Ji bo neyaran gengaz û hêsan

Vedibine wek xanên bê derî
Tê da nabînin west û dijwarî
Ko tu dimirî Xelkê me Zîlan
Bila ji te ra bibûna qurban

Cîhan dizane ko tu çi can bû
Piştmêrê Kurda şêrê yezdan bû
Ez sondê dixwim bi wê vêna te
Kurdmanc nabînin yekî mîna te

Bo namûsa min divê tu rabî
Du salên din ji gorê cida bî
Dengê tifingan qet nayê ji kir
Piştî tu mirî kes nema li wir

Dawid bi tenê wer maye dilkerb
De rabe bigre tifinga şeşderb
Carê neyaran vegij gijîne
Şîrê diya wan di poz ra bîne

Tevî Xelikan êrîşê berdê

Tola namûsê mêhle li erdê

Rabe bilive gor ne cigê te

Lawanê Kurdan dest û piyê te.[139]

Cih warê wê hatine şewitandin. Şer çêbûye, çar kur tevî mêrê wê ve di şer de mirine maye bêkes digel dergûşa birîndar a li ber dilê xwe. Gedê maye birîndar e û Xwedê dizane wê bimre an bimîne, li ser bedena wê jî birîn hene. Neçariya jinê nîşan dide.

Bûyera sereke, bi lome û zêmaran pir baş hatiye honandin. Lê carcar li hin cihan lehengê sereke, bûyerê dide rawestandin û agahiyan dide, şîroveyan dike, ev yek jî tevna honakê qels dike.

### 2.2.1.5. Leheng

Lehengê sereke; vegêr e. Li tu derî navê xwe nedaye. Em ji monolog û axaftinên wî fêm dikin ku hezkiriyekî welêt e. Ji ber neçariyê, lomeyan dike. Lê di dawiyê de rêya xebatê wekî rêya felatê û ya rast dibîne û dide ber xwe.

**Jina Birho:** Jineke neçar e. Çar law tevî mêrê wê mirine. Paşê dergûşa di hembêzê de jî dimire û ew jî rastî destdirêjiyê tê. Li ser vê diçe ser gora Birho, zêmareke ku hemû derd û kulên wê dide der dibêje û her du keziyên xwe li dora stûyê xwe dipêçe û ew jî li wê derê xwe dikuje. Taybetiyên fizîkî yên jinê weha tên gotin, “Min bala xwe dayê, jineke serqot, pêxwas, porhinc, pot li ser zîvir zîvirî, çêliyekî biçûk li ber himbêza wê kûr dinalîn.”[140]

Derûniya jinikê pir xerab bûye; vegêr di nav tevna çîrokê de wê dide axaftin, ew bi xwe rewşa xwe vedibêje: “Aha aha, ew jî mir; ew jî çû... Êdî tu tiştê ko min bi jînê va girêbide nema. Namûs çû, mêr çû, keç çû, çar kur şewitîn; bi tenê di dest min de ev çêlî, ev gede mabû, niha jî ew çû…”[141]

“Birho” û “biçûkê du salî” wekî karakterên fonê hatine bikaranîn.

---

[139] “Şîna Jinekê”, r.6-7.

[140] “Şîna Jinekê”, r.5.

[141] “Şîna Jinekê”, r.6.

### 2.2.1.6. Dem

Di hin berheman de dem kronolojîk di hinan de kompleks e, ev li gor berhem, dîtin û helwesta nivîskar-vegêr diguhere. Di nav tevna çîrokê de bikaranîna demê hunera nivîskar jî nîşan dide lewre "…di romanekê de li ser demê lêkolînkirin, tê wateya lêkolîna li ser hişmendiya psîkolojîk a nivîskar û lêkolînkirina hostetiya nivîskar."[142]

Vegêr bi şev radikeve, xewnekê dibîne û wextê şiyar dibe banga dîkan dibihîse. Bûyer di demeke kurt de diqewime. Êvarê bi ketina nav nivînan a leheng dest pê dike û bi şiyarbûna wî bi dawî dibe.

Bûyera vê çîroka ku ji çar rûpelan pêk tê di duwanzdeh saetan de diqewime. Dema qewîn û dema neqilkirinê ji hevûdin cuda ne, "Di navbera dema vegotin û dema vak'ayê de her dem valahiyek heye. Lewre pêşî bûyer diqewime paşê tê vegotin."[143]

### 2.2.1.7. Mekan

Mekan, di berhemê de girîng e. Mirov ji cih, derbarê lehengan de gelek tiştan derdixe, "ji teswîrên mekan mirov dikare ku muhteva zincîra bûyerê û rewşa psîkolojîk a lehengan hîn bibe."[144] Di çîrokê de mekan goristanek e, yên hatine li vir mirovên neçar in. Di navbera goristan û psîkolojiya lehengên çîrokê de têkiliyeke xurt heye. Lehengê ku bêhna wî teng bûye û jina ku mêrê wê tevî çar lawan mirine li vir in. Psîkolojiya her duyan jî serobino ye. Rewşa ku tê de ne rewşeke trajîk e û mekan jî li gor vê trajediyê ye.

Di vê çîrokê de cihê mekan girîng e, "Di çîrokên bikalîte de, mekan tevkariyeke girîng dide çîrokê."[145]

Di bûyera çarçove de cih; mala vegêr-leheng e. Di nav nivînan de ye. Di bûyera sereke de cih, goristaneke li serê Çiyayê Ararata biçûk e. Jina Birho li ser gorê dilorîne, li wê derê dimire. Paşê leheng-vegêr diçe ser gorê wan lomeyan dike. Li vir bi dengekî re xeber dide ku nayê zanîn ji ku derê tê.

---

[142] Stevick, *h.b.* r.231

[143] Çetişli, *h.b.*, r.76.

[144] Aktaş, *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, r.128-131.

[145] Çakır, *h.b.*, r.249.

### 2.2.1.8. Ziman û Şêwe

Di çîrokê de pexşan û helbest di nav hevûdin de hatine honandin. Qismek çîrokê pexşankî qismek jî lîrîk e. Em li vir şopên helbestvaniya Osman Sebrî jî dibînin. Di nav çîrokê de bikaranîna lîrîzmê ne hêsan e, aliyê edebî yê çîrokê xurttir kiriye, "Lîrîzm sermestiyek e û însan ji bo hêsantir bikevin nav jiyanê sermest dibin."[146]

Di çîrokê de xalbendî bi serkeftî hatiye bikaranîn, lewre jineke ku bang dike, lava dike, digirî lomeyan dike xuya ye û wextê em gotinên ji devê jinikê yek bi yek derdikevin dixwînin em hîs dikin ew qêrîn dike, digirî, lava dike, dengê wê dikeve. Vegêr ev yek bi xalbendiyê bi hostatî nîşan daye.

"-Aha aha, ew jî mir; ew jî çû... Êdî tu tiştê ko min bi jînê va girê bide nema. Namûs çû, mêr çû, keç çû, çar kur şewitîn; bi tenê di dest min da ev çêlî, ev gede ma bû, niha jî ew çû… Qey ko Yezdan jî rû ji me Kurdan badaye û bûye arikarê neyar... Em qels û reben, neyar xurt û zexim, bext rû ji me bada û Birho jî ranabe. . . Çû. . çû… tola namûsa me jî... em... em wê jî nabînin . . ."[147]

Di nav çîrokê de biwêj "hinav ji mirov diperitand", "Kevir li ser kevir nema"; cotepeyv "pel pel" gotinên pêşiyan "bi gur be ku tu gurxwarî nebî" hatine bikaranîn. Ev jî dirûvekî siruştî daye berhemê. Herweha şibandinên edebî "wekî teyrên bilatexur dirêjî kiloxê min dikirin"[148] û tewsîrên wekî tabloyan em dibînin. "Serê yekî li ser parsoyê ê din, lûlikên ê sisiyan di nav mûfirkên pişta ê çaran da, ew yekîtî bi awakî ibretamîz şanî mirov didan."[149]

Zimanê çîrokê zimanekî xurt, edebî, herikbar û şirustî ye. Rêbaza vegotinê serkeftî ye, "Di çîrokê de rêbaza vegotinê ji bûyer an mijarê girîngtir e."[150]

### 2.2.1.8. Raman-Tema

Nivîskar-vegêr, xwestiye halê civata Kurdan nîşan bide, ji bo biserketin û bipêşketinê rêya xebatê nîşan daye.

---

[146] Kundera, *h.b.*, r.130.

[147] "Şîna Jinekê", r.6,7.

[148] "Şîna Jinekê", r.5.

[149] "Şîna Jinekê", r.5.

[150] Mehmet Kaplan, *Hikaye Tahlilleri*, Dergah Yay., İstanbul, 2016, r.387.

Ramana çîrokê di encamê de bi vê gotina pêşiyan hatiye nîşandan, “Bi gur be ku tu gurxwarî nebî”[151] Gur nikarin guran bixwin ango mirovên di nav guran da ku bi qasî guran xurt nebin nikarin jiyana xwe berdewam bikin. Lazim e bi qasî guran xurt bin an ji guran xurttir bin. Heke xezalek her roj ji roja borî zêdetir nebeze wê bibe xwarina şêran.

Em karin bibêjin ku çîroka herî serkeftî ango sertacê çîroka Osman Sebrî ev çîrok e. Bi ziman û şêwe, mijar, mekan, dem, leheng, teswîrên xwe ve berhemeke xurt a edebî ye.

Digel aliyên serkeftî yên çîrokê hin aliyên ku qels mane jî hene. Mînak vegêr navê lehenga xwe ya jin nedaye. Piştî ku mêrê wê miriye wê neçar hiştiye. Herweha vegêr di destpêk û navbera çîrokê de bûyer daye sekinandin û şîrove kiriye, bala xwîner ji ser bûyera esil çûye ser vegêr.

Vegêr di dawiya çîrokê de ramana çîrokê bi gotinekê pêşiyan îfade kiriye, nehiştiye ku xwîner li ser bifikirin, ramanê tespît bikin. Di çîrokê de welat, şer, mirin, neçarî hemû di nav hevûdin de hatine dayin. Lewre yek encama yekê ye. Ji ber şer welat tarûmar e, mirin heye, tenêtî û neçarî çêbûye.

Di çîrokê de sembolên wekî erdhej, çiya hene. Çiya, di çanda Kurdan da girîng e; lewre herêma ku Kurd lê dimînin, çiyayî ne. Wextê ku Kurd ketine tengiyê berê xwe dane çiyayan.

Çiya bilind in, çiya cihê azadiyê ye, çiya mekanê xweşik û xweşikiyan e, çiya ew cih e ku mirov li wir nêzî Xwedê dibe. Di tengasiyan de meriv xwe li quntara çiyê digire û xwe dispêre ewlehî û bilindiya çiyê. Piraniya caran wekî hêmayeke xelasker û xweşik û carcar jî wekî aramgeh dibe warekî wisa ku meriv xwe nêzîkî Xwedê his dike.

Ahmed Arîf di helbesta xwe ya bi navê “Vay Kurban” da behsa însanên bê hêvî, mihtac ên li pişt çiya dike. Lehengên vê çîrokê yên li çiya jî wisa bê hêvî, tenê ne.

[151] “Şîna Jinekê”, r.8.

### 2.2.2.Hêmanên Teknîkî

#### 2.2.2.1. Diyalog

Hêmaneke sereke ya vegêranê jî diyalog e ku barekî girîng hildigire ser xwe. “Lewre diyalog berhemê dike dirûvekî rengîn şêweya berhemê ji monotoniyê derdixe.”[152]

Vegêr, bi rêbaza diyalogê lehengên xwe dide axaftin, hestên wan dide der û wan bi xwîner re rû bir û dihêle. “Fonksiyona sereke ya diyalogê ew e ku tiştên veşartî derxe holê, tiştên razber jî şênber bike.”[153]

Di çîrokê de diyalog hene. Mînak dawiya çîrokê di navbera leheng û “dengê xurt” de ev axaftin çêdibe.

“-Kes heqê xebatê nikare înkar bike. Lê em giliyê zilm û zînatê dikin. Ma seza ye ko zînatker (zalim) bê ceza bimînin?”[154]

“-Namînin; lê ne îro...”[155]

“-Ma halê me dê îro çawa be?”[156]

“-Ma nayê bîra te ko bav û kalên we Kurdan gotine: “Bi gur be ku tu gur xwarî nebî.”[157]

#### 2.2.2.2.Teswîr

Teswîr hunera resmkirina eşya ye. Bi teswîrê armanc ew e ku tiştê ku qala wî tê kirin bê nîşandan, bi nîşandanê qesit resimkirin e.

Di çîroka Şîna Jinekê de teswîrên edebî hene. Vegêr xurtiya pênûsa xwe bi van teswîran daye der.

“Min biçûkê wê hilda û lê nihêrî, birîna du singoyan di rex hev de li ser çiçikê wî ê rastê hebû. Pirtalên li ser cendek di xwînê de wekî reqemeşkan hişk bûbûn. Piçek xwîna ser di bêvila wî ra xwe berdabû ser dev û lêvan û hîn nuh qeşmax

---

[152] Çetişli, r.103.

[153] Tekin, *h.b.*, r.277.

[154] “Şîna Jinekê”, r.8.

[155] “Şîna Jinekê”, r.8.

[156] “Şîna Jinekê”, r.8.

[157] “Şîna Jinekê”, r.8.

girtibû. Gûn lê zer û zipilî bûbû. Lêvên wî hinekî ji hev bi dûr ketibûn û diranan wekî mirarêyan xweya dikir. Gava mirov lê hûr dibû, ji xwe ra digot; belbî cendekê vî gedeyî jî bi vê qedera malkambax û vî halê nedî û ne bînayî dikene..."[158]

Wextê xwîner van hevokan dixwîne hemû hûrgilayan tîne ber çavên xwe wî biçûkê birîndar ê di nava xwînê de wekî tabloyeke li ber çavan e. Ev tablo, serkeftina nivîskar nîşan dide, "Serê yekî li ser parsoyê ê din, lûlikên ê sisiyan di nav mûfirkên pişta ê çaran da, ew yekîtî bi awakî ibretamîz şanî mirov didan."[159]

### 2.2.2.3.Monolog

Di piraniya çîrokan de diyalog hene ev diyalog di navbera du an çend kesan de derbas dibin. Monolog "zêdetir di nav lehengên asosyal de tê dîtin."[160] Leheng wekî ku li hemberê wê yek hebe xwe bi xwe diaxive "bi vî awayî ji leheng re derfet çêdibe ku bi hûrgilî derûniya xwe bide der."[161]

Leheng bi taybetî bi rêya monologan "leheng xwe bi xwe diaxivin û derfetê didin xwîner ku xwîner wan guhdarî bikin."[162]

Di vê çîrokê de monolog hene. Lehenga jin û vegêr xwe bi xwe diaxivin. Em bi saya van axaftinan derûnî, fikr û ramanên lehengan bêtir dibînin. Herweha bikaranîna vê şêweyê aliyê edebî yê çîrokê xurttir kiriye.

> "Bersiva van pirsên han gelekî hêsan e. Divê cihê vê yeka han di rê û rezanên Xwedê de hebe. Mafir mîrasa ked û xebata bav û kalan ji me ra dimîniye; ji bo çi em ji mîrasa kirên wan en kirêt û bêrê bê par bimînin. Teqez ev jî ji edaleta Xwedê ye. Ma gelo kî dikare bêje ko « bext » ne havila kirên bav û kalan e û di kirasê rasthatinê de tê pêşiya kur û neviyan? Lê ne hewce ye ko ez di vî warî de xwe bi ber pêlên lehiya felsefeyeke nuh bixînim. Bi tenê dikarim bêjim ko eger bav û kalên wî gedeyî berî daketina bobelatê di rêya welatê xwe de xebitî bûna, îro ew gede bi wî halê han nedimir."[163]

---

[158] "Şîna Jinekê", r.6.

[159] "Şîna Jinekê", r.5.

[160] Çetişli, r.106.

[161] Çetişli, r.106.

[162] Foster, *h.b.*, r.126.

[163] "Şîna Jinekê", r.8.

Leheng-vegêr xwe bi xwe xeber dide, pirsan dipirse û yek bi yek bersiva pirsan dide. Dibêje ev rewşa têdayî mîrata bav û kalan e, heke bav û kalên vê gedê di rêya welêt da bixebityana îro ev gede wiha nedimir.

Dîsa axaftina jina li ser gorê jî monolog e. Jin, tenê ye xwe bi xwe diaxive êşa xwe dide der. Halê ku tê de ye em ji vê axaftina wê hîn dibin. Em jê dibihîzin ku neçar maye, cihekî ku pê de here, kesekî ku pê re biaxive, nemaye, berê xwe daye ser gora Birho (mêrê wê).

"-Aha aha, ew jî mir; ew jî çû... Êdî tu tiştê ko min bi jînê va girêbide nema. Namûs çû, mêr çû, keç çû, çar kur şewitîn; bi tenê di dest min da ev çêlî, ev gede ma bû, niha jî ew çû… Qey ko Yezdan jî rû ji me Kurdan badaye û bûye arikarê neyar... Em qels û reben, neyar xurt û zexim, bext rû ji me bada û Birho jî ranabe… Çû… çû… tola namûsa me jî… em... em wê jî nabînin …"[164]

"-Hê cane bê rûmet! Di dest min da tu bi tenê mayî; min te jî navê..."[165]

"-Tola namûsê…namûsa min…min…"[166]

Ev monolog rewşa trajîk a lehenga jin baş nîşan dide. Di navbera rewşa trajîk ya leheng, metn, mijar, vegêran, şêwe û ziman de peywendiyeke xurt heye.

Monolog di çîroka Osman Sebrî de tiştekî nûjen e. Di vê çîrokê de bi serkeftî bi kar aniye.

Di çîrokê de em şopên çanda Kurdan jî dibînin. Mînak jina li ser gorê bo tola namûsa wê bê hildan lavelavê dike. Dîsa her du keziyên xwe li dora stûyê xwe dipêçe xwe dikuje. Di çanda Kurdan da kurkirina keziyan heye, wextê mêrê jinekê dimire jin keziyên xwe jê dikin, dikin gorê. Lewre por ji bo jinê xeml e, ev tevger nîşan dide ku jina ku mêrê dimire êdî naxwaze xwe bixemilîne.

---

164 "Şîna Jinekê", r.6.

165 "Şîna Jinekê", r.7.

166 "Şîna Jinekê", r.7.

## 2.3.TERŞÊ ŞEVÊ [167]

Ev çîrok ji du rûpelan pêk tê. Vegêr, di destpêka çîrokê de li ser derew û efsaneyên wekî şeytanqûnî û terşê şevê yên di nav civata Kurdan de bi cih bûne, dibêje: "Wekî her miletî di nav me Kurdan de jî pir û hindik efsane û derew bi cih bûne. Ji wan derewên han; cin, şeytanqûnî û terşê şevê di qorê pêşîn de dimînin. Ji ber ku hin mirov bi tiştên holê gelekî bawer dibin û heya zarokên xwe jî pê ditirsînin; me dil heye ku di vî warî de pir hindik ramanên xwe bêjin."[168]

Osman Sebrî paşê sebebê nivîsandina çîrokê rave dike, "Min hêvî gelekî mezin e ku herçî kesên van nivîsan bixwînin, êdî bi tiştên holê bawer nebin."[169]

### Kurteya Çîrokê

Vegêr-leheng ji bo bênderên cotkar û milêbeyan divê here ber bênderên xwe yên li gundê Xêştûrê. Sebrî digel serkarê xwe Mihemedê Eşikê li hespê xwe siwar dibin û berê xwe didin Xêştûrê. Du rojan li wê derê dixebitin, divê vegerin mal lê; li ser bergera gundiyan ji bo şîvê li Xêştûrê dimînin.

Piştî şîvê li hespên xwe siwar dibin û bi rê dikevin, hê negihîştine nîvê rê, dengê zengilan û çargaviya lingên hêstiran dibihîzin. Sebrî û Mihemed ji bo sekinandina hêstiran di devê rê de peya dibin. Hêstir wisa direvin ku fêm nakin ku yek li ser pişta wan e. Li vê derê hêstiran didinê sekinandin. Dibînin ku Osoyê Xerbende li ser pişta hêstirê pêşîn hişk û biring bûye. Oso, ji ser pişta hespê datînin lê dinêrin ku zimanê wî nagere. Piştî çend gepan li cixarê dixe zimanê wî digere lê gotin bi temamî ji devê wî dernakeve dibêje,

"-Min ter… Şê şe…Şe…Vê dî."[170]

"-Te li ku û çito dît?"[171]

---

[167] Osman Sebrî, "Terşê Şevê", *Ronahî,* j. 14, 1 Gulan 1943, r.6-7.

[168] "Terşê Şevê", r.6

[169] "Terşê Şevê", r.6

[170] "Terşê Şevê", r.6

[171] "Terşê Şevê", r.6

"-Di… Di hew… Şo… Yê Ziya… Reta Dar… Girê da… Î spî bû… Serî li ber ez… Ma… Nan bû."[172]

Oso bi rê dikin û ew jî berê xwe didin aliyê ziyaretê, berikê diajon ber devê tifingê. Digihîjin ber hewşê lê tu tiştekî nabînin. Hê çend deqîqe derbas nabin, terşê şevê dibînin. Hema devê tifingê didin pêsîrê, lê wextê lingê tifingê bikişînin kaztîn bi se dikeve.

Gava ku deng pê dikeve, hema destê wan di ber wan re tên berdan. Fêm dikin ku ew kaztîna seyekî ye. Paşê tên cem gundiyên li odeyê rûniştî û ji wan re behsa serpêhatiya xwe dikin. Gundî ji wan re behsa rastiya bûyerê dikin. Dibêjin wê rojê seyekî biyanî hatiye nava gund, zarokên gundî lê dane û wî hema xwe avêtiye hewşa ziyareta goristanê. Wexta Oso tê û li ber goristanê bo xwendina fatîheyê disekine, se jî ji meraqan serê xwe bilind dike ka ew çek û reqa tê çi ye. Osoyê ku çav bi seyê dikeve ditirse û seyê bi dirêjiya peyayekî bi bilindiya mînareyekê yan bilindtir dibîne.

### 2.3.1.Hêmanên Materyal

#### 2.3.1.1. Vegêr

Hema hema her nivîskar di berhemên xwe de cih dide xwe, jiyana xwe, zanebûn û tecrûbeyên xwe. "Heta hin nivîsakar bi tenê jiyana xwe vedibêjin."[173]

Di çîroka "Terşê Şevê" de Osman Sebrî him leheng-vegêr him jî nivîskar e. Çîrok, serpêhatiya wî ye û ji devê yekem rasterast neqil kiriye. Çîrok, bi vegêrê "ez"ê hatiye nivîsandin.

"Wê rojê diviyabû ez herim ber bênderên xwe yên gundê Xêştûrê."[174]

"Navbera gundê me Narincê û Xêştûrê saet û nîvek bû."[175]

Leheng, mekan, dem, bûyer hemû rast in, nehatine afirandin; lê leheng-vegêr ev hemû bi awayekî estetîk gihandine hevûdin û bi zimanekî edebî ve honandiye.

---

[172] "Terşê Şevê", r.6

[173] Tekin, *h.b.*, r.270.

[174] "Terşê Şevê", r.6

[175] "Terşê Şevê", r.6

#### 2.3.1.2. Awayê Nêrînê

Di çîroka Terşê Şevê de, vegêr û yên ku qala wî tê kirin, heman kes in; “Ji bo van taybetiyan, jê re dibêjin leheng-vegêr.”[176] Leheng-vegêr dibe ku “lehengê sereke yê çîrokê ku hemû barê bûyerê li ser pişta wî an lehengek dûrî bûyeran be.”[177]

Di berhemên ku bi nêrîna leheng-vegêr de, jiyan jiyana vegêr bi xwe ye, leheng “Her dem serpêhatiyên xwe, tiştên ku dibihîze û hîs dike derdixe pêş.”[178] Ji ber vê yekê piraniya berhemên bi vî awayî tên nivîsîn otobiyografîk in. Leheng-vegêr ziman û şêweya xwe bi kar tîne û bi devê kesê yekem (ez-min) diaxive.

Di çîrokên bi vî awayî nivîsandî de hemû bûyer li gor dîtina vegêr ango leheng tên nîşandan. Xwîner, her tiştî li gor dîtin û gotina lehengê vegêr dibîne û dibihîse, ev jî pêşî li îmkanên ku vegêr “ew” bi kar tîne, dibire.

#### 2.3.1.3. Rêzebûyer

Di çîroka “Terşê Şevê” de bûyer serpêhatiya leheng-vegêr e. Bûyer, wekî xelekên zincîrekê bi hev ve girêdayî ye û wisa diherike.

Herweha di dawiya çîrokê de paşvavegerîn heye. Wextê li odeya gund behsa bûyerê tê kirin, ji gundiyan yek qala hatina seyê û ketina wî ya nav destên zarokan dike.

“Wê rojê seyekî biyanî û mezin hatiye nava gund. Zarokên gund tevî san lê gihane hev. Ewçend zarokan lê daye û sehan vegewixandiye ko hal lê ne hiştine.”[179]

Tekin bo rêzebûyerê (*plot*) dibêje, “Bûyer rûyê romanê ye ku li dinyayê dinihêre ango vîtrîna romanê ye. Bûyer nayê li hev anîn, ji dinyaya rasteqîn bi deyn tê sitandin. Herçiqas bi deyn hatibe girtin jî navenda cazîbeyê ya romanê li dora wê tê avakirin. Hêmanên wekî dem, cih, leheng ji bo wî hene; tiştê ku bûyerê zindî dikin, nêzî rastiyê dikin ev hêman in.”[180]

---

176 Aktaş, *Roman Sanati ve Roman İncelemesine Giriş,* r.80.

177 Çetişli, *h.b.*, r.85.

178 Çetişli, *h.b.,* r.86

179 “Terşê Şevê”, r.7

180 Tekin, *h.b.,* r.71

Çîroka Terşê Şevê herçiqas serpêhatiyek be jî; cih, dem û qehreman rasteqîn bin jî, bi hostetî hatiye honandin. Rêzebûyer ji destpêkê heta dawiyê kelecana di canê xwîner de zindî dihêle. Xwendevan, wê bi meraq dixwîne ka çi bû, ew tiştê ku Oso dît çi bû, rast bû yan na? Bi pirsên wiha nikare dest ji xwendinê bike. Nivîskar ji bo vê Oso daye axaftin û bi rêya vê diyaloga bi hostatî honandî, kelecana xwîner digihîje asta herî bilind.

-"Min ter… Şê şe…Şe…Vê dî."[181]

-"Te li ku û çito dît?"[182]

-"Di… Di hew… Şo… Yê Ziya… Reta Dar… Girê da… Î spî bû… Serî li ber ez… Ma… Nan bû."[183]

Rêzebûyer (*plot*) wekî pêlekên derenceyekê bi hev ve girêdayî ne. Xwîner, bi kelecan û meraqeke xurt ji pêpelûkan yek bi yek derdikeve. Ev yek biserketina nivîskar nîşan dide. Lê digel vê yekê, ew agahiya ku vegêr di destpêkê de dide û paşê vegotina bûyerê dide sekinandin, meraq û kelecana xwîner dişikîne. Herçiqas rêzebûyer (*plot*) serkeftî be jî agahdarkirina vegêr, vegêran û berhemê qels dike.

#### 2.3.1.4. Leheng

**Osman Sebrî:** Di çîroka "Terşê Şevê" de, vegêr lehengê sereke bi xwe ye. Vegêr Osma Sebrî ye, lê li tu derê navê xwe bi kar neaniye. Herweha lehengê din ên di dewama çîrokê de derdikevin pêşiya me jî hemû bi navên xwe yên rast, di çîrokê de cihê xwe girtine.

Vegêr di destpêka çîrokê de dibêje "Di sala 1924ê de min hivdeh sal ji emre xwe qedandibû û pê kiribû hijdehan."[184]

Osman Sebrî ku di bîranîn xwe de jî qal dike, ew ji gundê Narincê ye, axa wan pir e, bi çandiniyê re mijûl dibin. Ji ber ku xwedî eşîr in, gelek kes jî li ber destê wan dixebitin. Herweha ne mirovekî tirsonek e, li berevajî, mirovekî dilêr û cengawer e.

[181] "Terşê Şevê", r.6

[182] "Terşê Şevê", r.6

[183] "Terşê Şevê", r.6

[184] "Terşê Şevê", r.6

Ji şaşî û derewan natirse û bawer nabe. Bi berevajî vê yeke, bi ser ve diçe, rastiyê derdixe holê.

**Mihemedê Eşikê:** Serkarê Osman Sebrî ye. Li ber destê wî dixebite. Gundiyekî ji rêzê ye û bi karê çandiniyê re mijûl dibe.

Di çîrokê de em wî digel leheng-vegêr dibînin, wekî alîkarê wî derdikeve pêş.

"Ez û serkarê xwe Mihemedê Eşikê li hespên xwe siwar bûn û me berî de Xêştûrê."[185]

**Osoyê Xerbende:** Gundiyek e, xebatkarê ber destê serleheng e. Em ji serpêhatiya wî tê digihîjin ku tirsonek e. Ew kes e ku Terşê Şevê dibîne, li ser pişta hespê ye û ziman di devan de nagere.

Em ji van hêvokan serwext dibin ku Oso, rastgo ye, "Oso, ji çend salan ve di xizmeta min de bû, min rojekê ji rojan derew jê nedîtibûn. Lewre ez bi rastiya wî bawer bûm, lê ne bi terşê şevê."[186]

Gundî û odeya gund wekî fon hatine bikaranîn. Lewre berê gundî li odeya axa, mela, giregirên gund rûdiniştin, ji hevûdin re behsa serpêhatiyên xwe dikirin, çîrok vedigotin. Ode, cihê neqilkirina edebiyata devkî ya Kurdî bû.

### 2.3.1.5. Dem

Dem, ji bo honandin û neqilkirinê hêmaneke girîng a çîrokê ye. "Divê mirov qebûl bike ku di romanê de roleke girîng a demê heye. Lewre dem, yek ji hêmanên sereke ye ku di honandina berhemê de bikêrhatî ye."[187]

Wexta bûyer diqewime, sal 1924 e, lê ew di sala 1943yê de tê nivîsandin. Di çîrokê de dem "wekî sala 1924", "wê rojê", "roja dîtir", "roja dudoyan" derdikeve pêşberî xwîner. "Di sala 1924an de min hivdeh sal ji emrê xwe qedandibû û pê kiribû hijdehan."[188]

Di Terşê Şevê de dem bi teqezî hatiye diyarkirin. Vegêrê ku yek ji lehengê çîrokê ye, dibêje sala 1924ê weha bû, paşê bi diyardeyên demê yên wekî "wê rojê",

---

[185] "Terşê Şevê", r.6

[186] "Terşê Şevê", r.7

[187] Tekin, *h.b.*, r.25.

[188] "Terşê Şevê", r.6

“roja dîtir”, “roja dudoyan” demê diyar dike. Çîrok di sala 1943yê de hatiye nivîsîn, yanî di navbera bûyer û neqilkirinê de 19 sal hene.

Di berhemê de dem bi awayên cuda tê bikaranîn, a girîng ew e ku di nav metnê edebî de divê dem jî bi hostatî bê honandin. “Aliyê ku kirasê edebîtiyê li romanekê dike, wextê bûyer rû dide nîne, bi hostatî honadina maweya bûyerê ye, bi wî hawî di berhemê de dirûvekî têkûz a demê mihum e. Lewre tişta ku kirasê edebîtiyê li romanê dike dema rasteqîn (reel) nîne, dema îtîbarî ye ku ji aliyê nivîskar ve tê pêkanîn”[189]

Jiyana rojane ya civakê li gor demê ye, em lehengan li ser pişta hespê dibînin, bi hespê ji gundekî diçin gundê din. Wesayit tune ye. Gundî bi çandinî, heywandariyê re mijûl in. Peyvê wekî cotkar, pez, mexel, cot, bendêr, odeya gund jiyana sosyal a wê demê ya li gundê Kurdan nîşan dide.

#### 2.3.1.6. Mekan

Di çîroka Terşê Şevê de mekan rasteqîn e. Bûyer li gundê Xêştûrê rû dide. Di çîrokê de behsa gund tê kirin. “Wê rojê diviyabû ez herim ber bênderên xwe yên gundê Xêştûrê. Navbera gundê me Narincê û Xeştûrê saet û nîvek bû.”[190]

Cihê ku lê Oso Terşê Şevê dibîne Dargir e. Di çîrokê de vegêr bi berfirehî behsa Dargirê dike, “Dargir navê goristana gundê me Narincê ye. Darên gelekî mezin û kevin di wê goristanê de hene ku bi şev gelekî bi suhîn û tirs e.”[191]

Di tevna çîrokê de cih, bûyer, qehreman, vegêr û şêwe bi awayekî serkeftî hatine honandin, ev yek jî hostetiya nivîskar nîşan dide.

Terşê şevê, xurafe ye û cihê ku lê tê dîtin goristan e, vegêr bûyer û mekan ku ji ûnsûrên eslî yên çîrokêne pir baş li hevûdin aniye.

Nivîskar bo bûyerê xweştir bidin nîşan, sahneya xwe li gor bûyerê ava û teswîr dikin. Di navbera derûnî û jiyana lehengan, mijar û dekorê de peywendiyek xurt heye.

---

[189] Aktaş, *h.b.*, r.117

[190] “Terşê Şevê”, r.6

[191] “Terşê Şevê”, r.7

Dawiyê em dibînin ku “gundî li odê rûnistî bûn.”[192] Di nav civata Kurdan de çanda “ode”yê heye. Gundî li vê derê dicivin (bi taybetî mêr). Li vir li ser hemû mijaran tê axaftin, herweha carina çîrok û serpêhatî tên vegotin. Di çîrokê de ode bûye cihê ku pirsgirêk lê hatiye çareserkirin û serpêhatî hatiye vegotin.

**2.3.1.7. Ziman û Şêwe**

Huner, berhemên edebî li ser “tiştekî” ne, ji xêncî vê berhem, bi xwe jî “tiştek” e. Wextê em vê rastiyê bidin ber çavê xwe em karin bibêjin ku “wextê pêşkêşkirina bûyereke ji rêzê niyeteke vegêr heye û vegêr li gor vê niyetê pêşkêş dike.”[193]

Zimanê çîrokê zimanekî sade û herikbar e. Zimanê jiyana rojane ye. Ji serî heta dawiyê zimanekî siruştî hatiye bikaranîn. Ziman û mijar baş hatine honandin. Nivîskar, lehengên xwe li gor civata di nav de ne, li gor kultur, perwerde û derûniya wan ew dane axaftin. Wextê ku Oso Terşê Şevê dibîne û ditirse, wiha diaxive;

“-Min ter… Şê şe… Şe…Vê dî.”[194]

-“Te li ku û çito dît?”[195]

-“Di… Di hew… Şo… Yê Ziya… Reta Dar… Girê da… Î spî bû… Serî li ber ez… Ma… Nan bû.”[196]

Wexta em bala xwe didin vê diyalogê, em bi rêya axaftin, xalbendî, ziman û şêweyê kelecanî dibin, ditirsin. Vegêr wê hesta di dilê leheng de bi vegotin, şêwe, ziman û xalbendiyê nîşan dide.

Di metnên edebî de cihekî girîng a xalbendiyê heye. “Metnek ji hêmanên wekî ziman, rastnivîs, xalbendî, hevok, mijar, dem, cih, bûyer…”[197] ê pêk tê. Ev hêman melzemeyên xam ên metnê ne. Ji van melzemeyan metn tê sazkirin.[198]

---

192 “Terşê Şevê”, r.7

193 Yıldız, *h.b.*, r.110.

194 “Terşê Şevê”, r.7

195 “Terşê Şevê”, r.7

196 “Terşê Şevê”, r.7

197 Aktaş, *h.b.*, r.58

198 Aktaş, *h.b.*, r.58

Di çîrokê de mebest ne ziman û şêwe ye; lê ji bo vegotina çîrokê lazim e zimanekî li gor mijar û atmosfera çîrokê were bikaranîn. Ev jî nîşaneya hostetiya nivîkar e.

Osman Sebrî di çîrokên xwe de, di şûna daçeka "ku"yê de "ko"yê; di şûna lêkera "şixul-şuxul"ê de "şol"ê bikaraniye. Ev jî taybetiyên zimanê herêmê ne.

Zimanê çîrokê dewlemend û têkûz e gelek cotepeyv û baneşan, hatine bikaranîn. Qoç û boç, pel pel, çeq û req ji vana hinek in ku dirûveke siruştî dane berhemê.

#### 2.3.1.8. Raman-Tema

Her berhemek peyameke xwe ye, mebesta vegêr ew e ku bi berhemê peyama xwe ragihîne xwîner. "Roman, -çarçove û wesfên wê çi dibin bila bibin- paşiya paşîn perçeyekî jiyanê ye, bi mebestekê taybet tê hilbijartin."[199]

Çîrok, wekî ku ji navê wê jî diyar dibe, li ser baweriyên pûç e ku di nav civata Kurdan de belavbûne. Nivîskar, mebest û fikra xwe ya sebebê nivîsîna vê çîrokê di destpêkê de eşkere kiriye.

> "Wekî her miletî di nav me Kurdan de jî pir û hindik efsane û derew bi cih bûne. Ji van derewên han; cin, şeytanqûnî û terşê şevê di qorê pêşîn de dimînin. Ji ber ko hin mirov bi tiştên holê gelekî bawer dibin û heya zarokên xwe jî pê ditirsînin; me dil heye ko di wî warî de pir, hindik ramana xwe bêjin. Min hêvî gelekî mezin e ko, herçî kesên van nivîsanan bixwînin, êdi bi tiştên holê bawer nebin.
>
> Bi vê gotinê bila hinek, me bi înkariya cinan îtiham nekin. Mafir ko Quran dibêje cin hene, em nabêjin ko cin nînin. Lê bi qasî ko em bi rêbirêya cinan bawermend bin ji ne dilxapî ne. Cinên ko quran dibêje hene, ew cismên letîf in. Ne ew bi çavan tên ditin û ne jî têkiliya wan bi me heye. Bi tenê min divê xwandevanên xwe serwext bikim ko, çîrokên di vî warî de hatine gotin ji rûkî derew in û tu binatî ji wan ra nîne.
>
> Berî her tiştî ya ko li min qewimiye de bi ser û berê wê va bêjim û paşê yen ko min ji camêran bihîstine jî yek bi yek, jimar bi jimar di Hawarê de belav bikim.

---

[199] A. Wellek, *Edebiyat Biliminin Temelleri*, London 1978 (çev. A.Edip Uysal), KB. Yay., İstanbul 1983, r.290.

Di dema qewimîna şolên holê de eger mirov netirse û hinekî xwe ragire, wê di dawiyê de agahi rastiyê bibe; lê tirsa malkambax pir caran camêran şaş dike û nahêle ko serwextî rastiyê bibin. Dema di haletên holê de mirov rastî nenasî, ji tirsê derew tên pê. Derew ji ne vir du wê da, derewên bi qoç û boç..."[200]

Ji serî heta dawiyê li ser temayekê hatiye sekinîn ev jî xurafe ne. Vegêr dixwaze ji xwendevanên xwe ra bibêje tu rastiya xurafeyan tune ye.

Dayîna vê agahiyên navborî berhem qels kiriye, vegêr destûr nedaye ku xwîner li ser fikr-peyama berhemê biponije. Sedem, eşkere ye. Dibêje bawerî bi xurafeyan neynin, wextê bûyerên wiha qewimîn hinekî xwînsar bin hûnê rastiyê bibînin.

**2.3.2.Hêmanên Teknîkî**

Di çîroka "Terşê Şevê" de ji teknîkên vegotinê; teswîr, diyalog û rêbaza vegotinê derdikevin pêş.

**2.3.2.1.Rêbaza Vegotinê**

Di Terşê Şevê de vegêr derdikeve pêş. Carna vegotina çîrokê dide sekinandin û di vê navberê de agahiyan dide xwîner. Ev awa jî ji aliyê teknîk û hunerê ve berhemê qels dike. Lewre bala xwîner divê her dem li ser metnê be û ne li ser vegêr. Lê vegêr bêyî dudulî bûyer daye rawestandin û agahî dane. "Gundî li odeyê rûnistî bûn. Gava me bi serpêhatiya Oso û kaztîna sê ji wan ra got, hînga em ji xelkê gund serwextî rastiyê bûn."[201]

**2.3.2.2.Teswîr**

Di Terşê Şevê de teswîrên bi hûrgilî hene, "Dargir navê goristana gundê me Narincê ye. Darên gelekî mezin û kevin di wê goristanê hene ko bi şev gelekî bi suhîn û tirs e."[202]

"Pênc saniye derbaz nebûn ko, terşê sevê, herwekî Oso gotî xewinî; lê ne bi bilindiya minarekê, bi tenê bi bilindiya zilamekî dirêj..."[203]

---

[200] "Terşê Şevê", r.5-6

[201] "Terşê Şevê", r.6

[202] "Terşê Şevê", r.7

[203] "Terşê Şevê", r.7

“Serê mihîna min giha bû ser dîwarê hewşo. Gava terş rabû devê tifingê digehêşte pêsîrê.”[204]

**2.3.2.3.Diyalog**

Terşê Şevê çîrokeke kurt e, digel vê yekê jî nivîskar bi hostetî cih daye diyalogan. Bi rêya van diyalogan metn ketiye dirûvekî din û kelecana xwîner zêdetir kiriye. Herweha bi alîkariya xalbendî û nivîsê ev kelecan li ser metnê nivîskî jî daye der. Wextê gotin ji devê lehengî derdikevin, em dizanin ku zaf tirsiyaye; ew kîte bi kîte derdikevin;

“-Min ter… Şê şe… Şe… Vê dî.”[205]

-“Te li ku û çito dît?”[206]

-“Di… Di hew… Şo… Yê Ziya… Reta Dar… Girê da… Î spî bû… Serî li ber ez… Ma… Nan bû.”[207]

**2.3.2.4.Teknîka Otobiyografîk**

Vegêrê çîrokê di heman demê de lehengê sereke yê çîrokê ye. Vegêr, ji bîranînên xwe çîrokek honandiye.

Li ser teknîka otobiyografik fikrên cuda hene; hin nivîskar û rexnegir vê yekê wekî kêmasiyek dibînin û dinirxînin. Wekî nimûne; Baydar ji bo vê yekê dibêje, “Romanên otobiyografîk azadiya me ya afirandinê bi sînor dike.”[208]

Herweha hin nivîsar û rexnegir jî vê yekê wekî tevgereke sempatîk dibînin. Wurmser di vê mijarê de dibêje, “Çîrokbêjê berhemeke ku wekî kesê yekê hatiye nivîsandin, teqez xwîngerm e.”[209]

---

[204] “Terşê Şevê”, r.7

[205] “Terşê Şevê”, r.7

[206] “Terşê Şevê”, r.7

[207] “Terşê Şevê”, r.7

[208] Mustafa Baydar, *Edebiyatçılarımız Ne Diyorlar?* A.Yaşaroğlu Kitapevi, İstanbul 1960, r.145.

[209] A. Wurmser, Romanda Ben, *İstanbul*, Sayı 69, 1.10.1946

## 2.4. ŞÊXÊ BARZAN ÇAWA FIRANDIN [210]

Ev çîrok ji sê rûpelan pêk tê. Osman Sebrî ev çîrok ji Şêxê Garisî Şêx Evdirehman bihîstiye, paşê bi ziman û şêweya xwe, ji bo neyê jibîrkirin û winda nebe, nivîsiye.

Osman Sebrî di destpêka çîroka "Şêrek Bi Darekî"yê de behsa Şêx Evdirehmanê Garisî dike dibêje "Di sala 1930yî de li Barzan, min rehmetî Şêx Evdirehmanê Garisî nas kiribû û serekî dirêj bi rehmetî ra bûbûm heval."[211]

**Kurteya Çîrokê**

Bi navê Şêx Mihemedê Barzan Şêxek heye. Li qezaya Zîbarê di nav eşîrên Mizûrî, Şêrwan û Berojiyan de navê wî belav dibe. Mirîd û xelkê herêmê ji şêx hez dikin. Şêx, her roj piştî nimêja êvarê şîretên dînî li murîden xwe dike.

Şêx rojekê ji rojan behsa rabûna Mehdî dike û salixê Mehdî dîde;

"- Mehdî, piştî pêxember pêyayê Xwedê ê qenctir e. Navê wî Mihemed, milên wî ji ên hemû kesan dirêjtir in û hinarokên rûyê wî nûr jê dibarin. Çawan ko şûr wî nabire tifing jî pê de naçe. Dema rabûna wî, wehareng e gelekî nîzîk e. Heye ko îro hatibe dinê û rêya roja ko Xwedê jê ra ferman kirî dipêye."[212]

Di vê navberê de ji mirîdan yek radibe dibêje biqasî ku me ji şêx bihistiye wextê ku Mehdî radibe Decal jî pê re tê. Wextê ku Şêx behsa Decal kiriye awayê xilasbûna Mehdî jê nefikiriye. Şêx wextê ku li dorbera xwe dinêre ku çavên hemûyan li devê wî ye hema dibêje:

"-Difire… difire kurê min difire…"[213]

Gava Şêx ji mizgeftê diçe dîwanê mirîd jî di nav xwe de li ser rûçikên Mehdî diaxivin; lê li hevûdin nakin. Birek dibêje şêx Mehdî ye, yek dibêje ne ew e. Ji nav wan yek derdikeve dibêje:

---

[210] Osman Sebrî, "Şêxê Barzan", *Ronahî*, j. 17, 1 Tebax 1943, r.22-23-24.

[211] Osman Sebrî, "Şêrek Bi Darekê", *Ronahî*, j. 14, 1 Gulan 1943, r.8.

[212] Şêxê Barzan, r.22.

[213] "Şêxê Barzan", r.23.

“-Ma cihê ko eqil hebe, hewceye ko hûn holê zikên hev diêşînin. Ma nayê bîra we ko şêx got: Tifing bi Mehdî de naçe.”[214]

Li ser vê şeş peya bi tifingan diçin dîwanê. Şêx wextê wan dibîne dizane ku wê gulê berî wî bidin, direve. Mirîdên li ber derî yên ku dibînin gule li cilên wî ketine lê can sax e, baweriyê pê tînin ku ew Mehdî ye. Lê hinekên din dîsa naxwazin jê bawer bikin. Li ser vê mirîdê ku di serî de rê nîşanî yên din dabû, dibêje: “Eger ku Şêx Mehdî be wê karibe bifire û divê em vê biceribînin. Hîn gotina eqilmendê Barzan ne qediye ko mirîd bi dest û lingên şêx digirin û bê ko guh bidin qîr û zariyên wî rebenî, li ser xaneqê davêjin.”[215]

Şêx bi selametî nagihîje hewşê. Her du dest û lingek, stû û pişt bi şeş cihan dişikên û şêx bi rastî dibe Mehdî, dotira rojê dimire.

**2.4.1.Hêmanên Materyal**

**2.4.1.2. Vegêr**

Hemû çîrok an roman ji aliyê yekî vê tên vegêran, vegêr duh jî hebû îro jî heye wê sibê jî hebe. Di çîroka “Şêxê Barzan” de vegêr “ew” e, bereksê çîrokên din ên me heta niha tehlîlkirin, div ê çîrokê de nivîskar vegêr “ez/min”ê ji holê rakiriye.

Vegêr “derfetên vegotinê yên berfireh dide nivîskar.”[216] Vegêr, hemû bûyerê ji derve ve wekî îlahekî dibîne, dinirxîne. Lê di çîrokê de xwe venaşêre, di destpêka çîrokê de derbarê bûyerê de agahiyan dide xwîner, berdewamiyê de bûyerê dide sekinandin û agahiyan dide û heta şîroveyan dike.

“Vî eqilmendê Barzan nafikire ko heke şêx ne Mehdî be dê bimire. Ev yeka han nayê bîra mirîdên her du biran jî. Gotina hemiyan li ser vê tevdîrê dibe yek û şeş peya li tifingên xwe radikin û diçin dîwanê. Ji nişka va devê her şeş tifingan didin pêsîra şêx û tiliyên xwe davêjin lingên tifingan. Bi dengên tifingan û rabûna dû ra, şêx dizane ko evana bi bêbextî wî dikujin. Ew jî dide xwe û direve. Mirîd wî di devê dêrî da digirin ko hemû berik li cilan ketine û bicên neketine. Li ser vê tecrîba han

---

[214] “Şêxê Barzan”, r.23.

[215] “Şêxê Barzan”, r.24.

[216] Tekin, *h.b.,* r.41.

êdî şika wan namîne ko şêx Mehdî ye"[217] Vegêr bûyerê dide sekinandin agahiyan dide xwîneran.

#### 2.4.1.3. Awayê Nêrînê

Her nivîskar, ji bo fikra ku dixwaze bide, bûyera ku dixwaze neqil bike û şiklê ku dixwaze bide berhema xwe vegêrekê diafirîne. Dinya îtîbarî ya berhemê li gor awayê nêrînê ya vegêr dikeve şiklekî. "Awayê nêrînê, di metnên ku li ser vegêranê hatine avakirin de honaka bûyerê û ûnsûrên wekî dem, cih û şexs ên di honaka bûyerê de tên bikaranîn diyar dike bê ka ji aliyê kê ve tên dîtin, tên îdraqkirin û ji aliyê kê ve ji kê re tên gotin."[218]

Çîrok ji devê kesê sêyem ango "ew" ve tê neqilkirin. Nivîskar vegêr e. Em bûyerê li gor dîtin, bihîstin û nêrîna vegêr dibînin. "Nivîskar bi zanetî di nav sîstema çîrokê de bi cih dike û ûnsûrên sîstemê (fîgûr, dem, cih û rêzebûyerê) bi nêrîna wî pêşkêş dike."[219]

"Şêx Mihemedê Barzan yek ji şêxên terîqê bû. Ji wan şêxên ko nizanin şêxîtî û mirîdîtî çi ye; bi tenê ji nezaniya milet destkewtî dibin û xwe di bin navê şêxîtiyê de li ser serê Kurdên reben dikin mezin û rêya debareke şahane ji xwe ra, rêya mezinahiya cihê ko tê de jî ji kurên xwe ra pêk tînin. Lê bi ser vê yeka han da; Şêx Mihemed ne mirovekî beradayî bû; teqez ji gelek Şêxan qenctir û çaktir bû. Qe ne wekî şêxên mayî di rêya bêemirêya Xwedê de pêş de ne diçû. Eger gunehekî wî hebû, bê ko qeweleke manewî li cem hebe, xwe xwedî manewiyet dabû zanîn û di qezaya Zîbarê de gelek m mirov bi mirîdî li serê xwe civandibûn. Ji xwe ev gunehê han bû ko bûbû sebebê firandina wî."[220]

#### 2.4.1.4. Rêzebûyer

Herçiqas ev çîrok ne çîrokeke afirandî be jî tevna çîrokê baş hatiye vegirtin. Di destpêkê de behsa Şêxê Barzan tê kirin. Paşê nelihevkirina mirîdan tê neqilkirin. Di vê çîrokê de nivîskar-vegêr, girêkê bi xwe venake bi xwînerên xwe re meraqê çê

217 "Şêxê Barzan", r.23.

218 Aktaş, *Edebi Metinlerin Tahlili,* r.72.

219 Tekin, *h.b.*, r.59.

220 "Şêxê Barzan", r.22.

dike. Xwîner, wexta ku çîrokê dixwîne dibêje gelo dê mirîd ji Şêx bawer bibin an na? Gelo dê Şêx bimire an ji destê wan bifilite? Ev pirs dibin sedema meraqê û ev jî serketina berhemê nîşan dide.

Çîrok, herçiqas bi xwîneran ra meraqê peyda bike jî ji aliyê nivîskar ve sekinandina bûyerê, herikbariya çîrokê xerab dike. Nivîskar di destpêkê de li ser çîrokê agahî dane, di nava çîrokê de jî bûyerê daye sekinandin. Paşê, wekî ku ev têrê neke dest bi şîroveyan kiriye;

"Şêx Mihemedê Barzan yek ji şêxên terîqê bû. Ji wan şêxên ko nizanin şêxîtî û mirîdîtî çi ye; bi tenê ji nezaniya milet destkewtî dibin û xwe di bin navê şêxîtiyê de li ser serê Kurdên reben dikin mezin û rêya debareke şahane ji xwe ra, rêya mezinahiya cihê ko tê de jî ji kurên xwe ra pêk tînin."[221]

#### 2.4.1.5. Leheng

**Şêx Mihemedê Barzan:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Li qezaya Zîbarê dimîne. Navê wî di nava eşîrên Mizûrî, Şêrwan û Berojiyan de belav bûye. Li dora wî mirîd hene ku jê hez dikin. Di çîrokê de ji bo Şêx tê gotin ku "xelkê wî, ewçend jê hez dikirin ko di rêya şêx de û ji bo daxwazên wî mirin, bextiyariyeke mezin dizanîn. Ji dilpaqijiya xelkê wî pêva, dilçakî û rûnermiya şêx jî ev hezkirina han roj bi roj zêde dikir. Her roj piştî nimêja êvarê, şêx şîretên dînî li mirîdên xwe dikirin û dijwariya roja pişdawiyê û agirê digihejê jî diêxist bîra wan."[222]

Mirîdên wî, ew wekî Mehdî dibînin. Ji ber vê qebûla mirîdan Şêx, di nav destê wan de dimire.

**Mirîd:** Li dora Şêx Mihemedê Barzan gelek mirîd kom bûne. Di çîrokê de navê wan nayê gotin.

Em ji axaftin û tevgerên mirîdan fêm dikin ku ew pir ehmeq û nezan in. Wisa ehmeq in ku dibin du bir; birek dibêje Şêx, Mehdî ye; yek dibêje na ji wan yek (qaşo aqilmendê wan e) derdikeve dibêje em biceribînin. Ev ceribandineke ewqas bê hisab e ku dibe sedebê mirina Şêx.

---

[221] "Şêxê Barzan", r.22.

[222] "Şêxê Barzan", r.22.

Di berhemê de qezaya Zîbarê, eşîrên Mizûrî, Şêrwan û Berojiyan wekî fon hatine bikaranîn.

Di çîrokê de raman û hîsên lehengan basît in, vegêr behsa derûniya wan nake, em tenê tevgerên wan dibînin. Nivîskar jî behsa derûniya wan nake û agahiyên dide xwîner serveyî û sathî ne.

Hişmedî û zimanê mirîdan li gor civatê ye ku di nav de dijîn. Diyar e ku mirîden nezan û kêmaqil in. Aqilê wan ewqas kêm e ku nikarin li ser encamên planê xwe bifikirin. Dibêjin "werin em ê herin dîwanê û bestek tifing berdine şêx, heke Mehdî be, berik tê naçin."[223] lê bereksê vê fikre naynin hişê xwe nabêjin ku Mehdî nebe wê bimire.

### 2.4.1.6. Dem

Di çîrokê de diyardeyên demê yên wekî "rojekê", "piştî şîretan", "dotira rojê" hene. Di destpêka çîrokê de jî tê gotin, "Di serê babilîska bîstan de li qezaya Zîbarê Şêx Mihemedê Barzan di nav eşîrên Mizûrî, Şêrwan û Berojiyan de navekî baş birîbû."[224]

### 2.4.1.7. Mekan

Mekan cihê ku lê bûyer diqewime yanê dika bûyerê ye, girîng e. Ev sehne bi taybetiyên xwe, xwe dide nîşan. Eger ne li gor hêmanên wekî mijar, dem û şexsan be dirûvekî derewîn dide berhemê. Yanê divê bi ûnsûrên din re têkildar be.

Şêxê Barzan li ser Şêx û mirîdan e helbet wê mekan jî mizgeft û dîwana Şêx bin. Em Şêx li mizgeft û dîwanê dibînin, bûyer jî li vir diqewime.

Di çîrokê de dîwana Şêx wekî avahiyeke sê qat hatiye teswîrkirin "Ên ko mala Şêxê Barzan dîtine dizanin ko cihê dîwana şêx çiqasî bilind e. Tayê binî mizgeft û yê duduyan xaneqe (tekiye) û yê sisiyan dîwan e.[225]"

Ev dîwan li qeza Zibarê ye. Bûyer li vir diqewime. Mirîdên Şêx ên ku wî wekî Mehdî dihesibînin her dem li vê derê kom dibin, li vê derê Şêx şîretan li wan dike û li vê derê bi tifingê berî Şêx didin wî dikujin.

---

[223] "Şêxê Barzan", r.22.

[224] "Şêxê Barzan", r.22.

[225] "Şêxê Barzan", r.23.

"Sêx Mihemedê ko cendekê wî zexim bû, bi selametî nagehê hewşê. Her du dest û lingek, sto û pişt bi şeş cihan dişkên û şêx bi rastî dibe Mehdî. Piştî ko me got, pişt û stoyê şêx jî şikesti bûn, êdî ne hewce ye ko em bêjin roja dûtirê cane xwe siparte ruhistîn û cendekê xwe jî siparte gorê."[226]

### 2.4.1.8. Ziman û Şêwe

Ziman û şêwe li gor leheng û honaka berhemê ne. Vegêr, cih daye axaftina lehengan. Axaftina lehengan jî li gor statuya wan a civakî û bûyerê ye.

"-Qurbanî piraniya me bawer in ko şêx Mehdî ye. Lê hinekên bêîman di me da hene ko bi vê yekê bawer nabine. Me divê şêx vê şika han di dilê wan da bi derxîne."[227]

"-Ma ez çawan dikarim vê şikê di dilê wan da bi derxim û kê ji we ra gotiye ko ez Mehdî me?"[228]

"-Qurban, dilê me hemiyan dibêje tu Mehdî yî. Ma şêx negotiye ko dilê çel misilmanî li ser çi tiştî bibe yek, ew tişt rast e û nabe derew. Herçî şika di dilê hin mirîdan da heye tu bi firînê jê biderxî."[229]

"-Kuro ma hûn ehmeq in, ez çawan dikarim bifirim?!. Hînga eqilmendê Barzan, ew mirîdê ko berê riya tecriba tifingê şanî hevalên xwe daye dibêje:

"-Gelî mirîdan ji ber ko dema rabûna Mehdî hîn ne hatiye, şêx xwe eşkere nakiye. Lê em dikarin biceribînin. Werin emê dest û lingên şêx bigirin û li ser xaneqê bavêjin jêr. Hînga wê bi kotekî bifire."[230]

Ziman zimanekî sade, siruştî û herikbar e. Diyalogên mirîd û şêx hene ku me li jorê cih da wan. Axaftina wan li wan tê û rewşa wan a trajî-komîk, haletî rûhiyeta wan nîşan dide.

---

[226] "Şêxê Barzan", r.24.

[227] "Şêxê Barzan", r.24.

[228] "Şêxê Barzan", r.24.

[229] "Şêxê Barzan", r.24.

[230] "Şêxê Barzan", r.24.

#### 2.4.1.9. Raman-Tema

Ev çîrok, li ser xurafeyên di nav civata Kurd de belav bûne ye. Vegêr, ev xurafe bi awayekî trajî-komîk neqilkiriye. Lê derfet nedaye ku xwîner li ser ramana bûyerê bifikire. Berî vegotina bûyerê li ser ramanê bi dorfirehî agahî dane.

Em di nav hevokên çîrokê de rewşa civaka Kurdan a wê serdemê dibînin ku vegêr di destpêkê de li ser vê rewşê dibêje: "Şêx Mihemedê Barzan yek ji şêxên terîqê bû. Ji wan şêxên ko nizanin şêxîtî û mirîdîtî çi ye; bi tenê ji nezaniya milet destkewtî dibin û xwe di bin navê şêxîtiyê da li ser serê Kurdên reben dikin mezin û riya debareke şahane ji xwe ra, riya mezinahiya cihê ko tê da jî ji kurên xwe ra pêk tînin."[231]

Vegêr tevî agahiyên destpêkê çar caran bûyerê dide sekinîn. Agahiyan dide, rewşê şîrove dike, bi xwînerên xwe re diaxive. Yanê dikeve navbera metna "dinya îtibarî" û nahêle xwedevan ji serî heta dawiyê bêyî rawestin bixwîne, li ser bifikire. Lê girêka bûyerê venaçirîne, meraqa di dilê xwîner de heta dawiyê dewam dike. Xwîner her ku dixwîne dibêje gelo wê çi bînin serê Şêx?

Di çîrokê de peyvên wekî Mehdî, Şêx, mirîd, decal, kerê beza, firîna kerê hwd. derbas dibin ku ev bêje bi xwe ramana çîrokê didin xwîner.

### 2.4.2. Hêmanên Teknîkî

#### 2.4.2.1.Diyalog

Em dikarin bibêjin ku ev çîrok li ser diyalogan hatiye honandin. Eger em qismên agahî û şîroveya nivîskar-vegêr ji berhemê derbixin bi tenê diyalog dimînin. Bi taybetî jî diyalogên şêx bi mirîdan re û diyalogên di navbera mirîdan de derdikevin pêş.

"-Qurbanî piraniya me bawer in ko şêx Mehdî ye. Lê hinekên bêîman di me de hene ko bi vê yekê bawer nabine. Me divê şêx vê şika han di dilê wan de biderxîne."[232]

---

[231] "Şêxê Barzan", r.22.

[232] "Şêxê Barzan", r.24.

“-Ma ez çawan dikarim vê şikê di dilê wan de biderxim û kê ji we ra gotiye ko ez Mehdî me?”[233]

**2.4.2.2.Teswîr**

Di çîrokê de teswîr ne ewqas xurt bin jî, hene. Wextê Şêx behsa Mehdî dike dibêje: “Mehdî, piştî pêxember pêyayê Xwedê ê qenctir e. Navê wî Mihemed, milên wî ji en hemû kesan dirêji vir û hinarokên rûyê wî nûr jê dibarin.”[234]

**2.4.2.3.Leîtmotîv**

Di çîroka Şêxê Barzan de “Mehdî” wekî leîtmotîv tê bikaranîn. Ji serî heta dawî mijar li ser vê motîfa mehdî hatiye honandin û ev nav bîst û çar caran di çîrokê de derbas dibe.

---

[233] “Şêxê Barzan”, r.24.

[234] “Şêxê Barzan”, r.22.

## 2.5. ŞEYTANQÛNÎ-1[235]

Ev çîrok ji du rûpelan pêk tê. Di destpêka çîrokê de Osman Sebrî behsa Şeytanqûnî dike. “Şeytanqûnî: Wekî her miletî li nik me Kurdan jî li ser xerafatan de baweriyek heye. Li goreyî wê baweriyê, hin mirî piştî mirinê radibin. Gava ew mirî navê kîjan mirovî hildin, ew jî dimire. Ji bo vê yekê kîjan miriyê ko şeytanqûnî bibe bi merê dikujin. Ji ber ko dibêjin, şeytanqûnî bêmerê bi tu tiştî nayê kuştin.”[236]

### Kurteya Çîrokê

Li Serhedê feqeyên Kurdan gelek hene, dema ev feqe digihîjin Mela Camiyê, ji bo bipêşvebirina xwendin û zanîna xwe diçin Îranê. Feqe Emer û Feqe Hesen jî Mela Camiyê xwendin û ji bo bipêşvebirina xwendina xwe berê xwe didin Îranê. Li gundekî dibin mêvan û ev bûyer tê serê wan.

Dema feqe digihîjin gundekî ser sînorê Îranê êvar e û li wê derê dibin mêvan. Ji ber ku odeya gund tune ye, gundî mêvanên xwe dibin mizgeftê. Feqeyên ku li vê derê bêhna xwe vedidin û nan dixwin, bi dengê gundiyan re radibin ser xwe. Feqe ji axaftina gundiyan fêm dikin ku kurê yekî çûye ber rehma Xwedê.

Demek bi şûn de rîspiyek tê cem wan dibêje, eger hûn îşev di ser cendekê kurê mixtar de bixwînin wê du diravan (pere) bidine we. Feqe ji ber ku ji wan re pere lazim in vê qebûl dikin. Tabûta kurê mixtar tînin cihê ku lê dimînin. Feqe dest bi xwendina Quranê dikin. Nîvê şevê xirtîniyek bi cendek dikeve. Feqe Emer ditirse û derdikeve derva derî jî di ser Feqe Hesen ra digire. Li cihekî disekine û bala xwe dide tabûta textinî û Feqe Hesênê ku çavekî wî nabîne. Bîstek şûn de Feqe Hesen jî livîna tabûtê dibîne. Feqe Hesen hema radibe destê xwe diavêje derî ku derbikeve derva lê derî girtî ye, di vê navberê de cendekê di tabûtê de jî radibe û kefen hetanî binçengên xwe dadixîne. Feqe Hesen dibêje cendek şeytaqûnî bûye û bi ser de dixwîne, lê tu feyde tune ye. Bang li Feqe Emer dike ku li wî temaşe dike û dikene. Feqe Emer alîkariyê dide û wî ji hundir derdixe. Feqe Hesenê ku ricf lê dikeve nema zane çi bike; lê Feqe Emer baweriya xwe pê aniye ku kurê mixtar nemiriye, şeytanqûnî bûye. Feqe Emer hinekî Feqe Hesen rihet dike û bang li cendek dike dibêje;

---

[235] Osman Sebrî, “Şeytanqûnî 1”, j. 55, 15 Hizêran 1943, r.7,8.

"- Te xêr e û çi dixwazî?"[237]

"- Bira, ez tiştekî naxwazime. Bi tenê min divê tu werî cem min. Ez nemirime. Xweya ye ez bi xûnê ketime. Werin yek torpan bidin ko ez li xwe kim û mizgîniyê bidine bavê min û bêjin, kurê te nemiriye. Dê bexşîşeke hêja bide we."[238]

"- Ezê çawan bawer bibim ko tu şeytanqûnî nebûye?"[239]

"- Te çi divê, ezê welê bikim."[240]

"- Qurana min bi tûrê nên va li wê derê ne, eger te dane min, dê zanibim ko tu şeytanqûnî nebûye."[241]

Piştî ku dest diavêje nan û Quranê pê bawer dibin ku ne şeytanqûnî ye, diçin cem, her yek çend kincan ji xwe dikin û didinê. Wextê ku gundî serê sibehê ji bo anîna cendekê tên, dibînin ku mirî di nav her du feqeyan de rûniştî ye. Bav fêm dike ku lawê wî nemiriye û feqe tevdîr sitandine. Mixtar feqeyan sê rojan dike mêvan û pênc zêran dide her yek ji wan, wan bi rê dike.

### 2.5.1.Hêmanên Materyal

#### 2.5.1.1. Vegêr

Vegêr, ew kes e ku çîrokê radigihîne xwîner. "Di romanekê de kesê yekem yê ku em dengê wî dibihîzin, yê ewil diaxive ew e."[242]

Di vê çîrokê de nivîskar-vegêr ewil hin agahî dane, lehengên çîrokê (Feqe Hesen-Emer) dane nasîn û paşê rayeya vegotinê daye leheng-vegêr.

Nivîskar-vegêr, piştî kurteagahiyekê rayeya vegêranê dide serleheng. Serleheng dibêje: "Dema em gihêştin sinorê Îranê bi êvara dereng ra em li gundekî bûne mîvan. Ji ber ko di gund de ode nîne, gundî mîvanên xwe dibin mizgeftê û her yek ji gundiyan jê ra nan û şîvê dibe. Em jî rast çûbûn mizgeftê."[243]

---

237 "Şeytanqûnî 1", r.7.

238 "Şeytanqûnî 1", r.8.

239 "Şeytanqûnî 1", r.8.

240 "Şeytanqûnî 1", r.8.

241 "Şeytanqûnî 1", r.8.

242 Demir, *Anlatılar Tipolojisi*, r.31.

243 "Şeytanqûnî 1", r.7.

Vegêrê çîrokê “ew” e, lê vegêr “ez” jî di destpêk û nav çîrokê de xwe nîşan dide.

“Bokeyên vê çîrokê Feqe Emer û Feqe Hesen, piştî ko Mela-camî xwandibûn, ji bo pêşvebirina zanîn û standina destûra xwe berê xwe dabûn Îranê, li gundekî bûbûn mîvan û ev çîrok li wan qewimî bû. Ji bo ko xwandevan qenc serwext bibin emê rê bidin gotina Feqî Emer.”[244] Vegêr berî neqilkirinê derheqê bûyerê de agahiyan dide, bi kurtasî qala şexsan dike, paşê erka vegotinê dide ji lehengan Feqe Emer (leheng-vegêr).

**2.5.1.2. Awayê Nêrînê**

Her cure bûyer, leheng, cih ên di dinya îtibarî ya roman û çîrokê de li gor awayê nêrînê watedar dibin. Lewre “li ser heman însan, heman bûyer, heman mijar, heman tiştî berhemên cuda hatine nivîsîn, ev cudabûn encax bi awayê nêrînê yên ji hevûdin cuda dikare were ravekirin.”[245]

Ji bo berhemekê awayê nêrînê girîng e lewre, “Tiştê ku romanên giranbiha dike giranbiha awayê nêrînê ye ku bi serkeftî hatiye bikaranîn. Awayê nêrînê çi dibe çawa dibe bila bibe. Ya girîng ew e ku nivîskar dixwaze romanek çawa bîne pê û awayê nêrînê ya ku hatiye hilbijartin li vê hedefe tê an na.”[246]

Di vê çîrokê de nivîskar-vegêr “ez” û leheng-vegêr “ew”, her du bi hev re derdikevin pêş. Di destpêk û navbera çîrokê de nivîskar-vegêr derheqê bûyerê de agahiyan dide, paşê erka gotinê dide leheng-vegêr û xwe dida paş, “Bokeyên vê çirokê Feqe Emer û Feqe Hesen, piştî ko Mela-camî xwandibûn, ji ho pêşvebirina zanîn û standina destûra xwe berê xwe dabûn Îranê, li gundekî bûbûn mîvan û ev çîrok li wan qewimîbû. Ji bo ko xwandevan qenc serwext bibin emê rê bidin gotina Feqî Emer:”[247]

Heta li vir nivîskar-vegêr agahiyan dide. Paşê dibêje rê bidin gotina Feqe Emer ku ji lehengên çîrokê yek e. “Dema em gihêştin sinorê Îranê bi êvara dereng ra

---

244 “Şeytanqûnî 1”, r.7.

245 Çetişli, *h.b.*, r.83.

246 Tekin, *h.b.*, r.67.

247 “Şeytanqûnî 1”, r.7.

em li gundekî bûne mîvan. Ji ber ko di gund da ode nîne, gundî mîvanên xwe dibin mizgeftê û her yek ji gundiyan jê ra nan û şîvê dibe."[248]

### 2.5.1.3. Rêzebûyer

Di metnên edebî de ji ûnsûreke eslî jî "bûyer/vaka'a" ye, "lewre ev metn di nav bûyer an honaka bûyerekê de dertên holê."[249]

Aktaş bûyeran bi vî awayî dabeşkiriye:

1.Bûyer dibe ku wekî zincîrek bê neqilkirin.

2.Bûyera berhemê dibe ku ji du zincîran an ji duduyan zêdetir be.

3.Dibe ku bûyerek di nav bûyerekê de hatibe bicihkirin.[250]

An bûyerek dibe çarçoveya bûyerekê din, an hin bûyer wekî xelekên zincîrekê li dû hevûdin rêz dibin, an bûyerek dibe sedema bûyereke din metnên edebî bi vî awayî tên honandin. "Mirov dikare bibêje eger metn hevokek be, her bûyerek, peyvek an komepeyveke vê hevokê ye."[251]

Di çîroka "Şeytanqûnî 1"ê de rêzebûyer (*plot*) serpêhatiya lehengê sereke yê çîrokê ye. Rêzebûyer wekî xelekên zincîrekê bi hev ve girêdayî ye û wisa diherike. Feqe Emer û Feqe Hesen ji bo perwerdeya dînî ya xwe temam bikin berê xwe didin Îranê, êvarê xwe digihînin gundekî li ser sînor û bi mecbûrî wê şev li wê derê dihêwirin. Di odeya kêleka mizgeftê de ne, dengê gundiyan tê. Serwext dibin ku kurê mixtarê gund mirî ye. Cinaze tînin mizgeftê, gundî ji feqeyan dixwazin ku heta serê sibê li ser mirî Quranê bixwînin. Feqe ji bo ku pêdiviya wan bi pere heye, dixwînin. Lê nîvê şevê mirî ji tabûtê derdikeve. Feqe piştî tirs û xofekê dûvdirêj fêm dikin ku kesê ku wekî mirî dizanibûn nemiriye û serê sibê hemû gundî bi rastiyê dihesin.

Bûyer bi awayekî trajî-komîk hatiye vegotin û kelecana di dilê xwîner de zindî dihêle. Guhê xwîner li diyaloga feqeyan e ku ew Şeytanqûnî ye an na. Bi lehengan re heta dawiyê geh ditirsin geh dikenin geh diponijin.

---

248 "Şeytanqûnî 1", r.7.

249 Aktaş, *h.b.*, r.41

250 Aktaş, *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, r.76-77

251 Aktaş, *Edebi Metinlerin Tahlili*, r.42.

"- Gelî biran hûn ku da çûne?.. Ji bo Xwedê be werin cem min."[252]

Hîn min dikirî lê vegerînin ko Feqe Hesen destê xwe da ser devê min û got:

"- Kuro, ma tu ji riya Xwedê ketiye?... Ev cendekê han şeytanqûnî bûye. Ma qey tu nizanî ko şeytanqûnî çi ye? An te divê bibe sebeba serê me."

"Feqe Hesen di gotina han da ne neheq bû. Tirsa ko bi ser ketî, ev gotina wî ne digihande warê şermê. Lê tirsa min ne ewçend bû. Ji xwe dema wî û mirî (cendek) hevûdin di nava mezelê da dibirin û tanîn, li derve ji pir kenînê zikê min êşiya bû."[253]

#### 2.5.1.4. Leheng

**Feqe Emer:** Vegêr-serleheng e. Feqeyek e dixwaze derbasî Îranê bibe û li wê derê xwendina xwe bi bi pêş ve bibe. Digel hevalê xwe Feqe Hesen ber bi Îranê ve bi rê dikeve. Karakterekî wêrek e.

**Feqe Hesen:** Hevalê Feqe Emer e. Ji bo xwendina xwe bi pêş ve bibe, digel hevalê xwe ber bi Îranê ve bi rê dikeve. Çavekî wî nabîne û tirsonek e. Baweriya wî bi xerefatan heye ku di nav civatê de berbelav bûne.

**Kurê Keya:** Nexweş e, lê dibêjin qey miriye. Tînin cem feqeyan, wextê tê ser hemdê xwe, hewl dide ku ji tabûtê derkeve, ji ber vê yekê dibêjin ew şeytanqûnî bûye. Paşê bi saya serê Feqe Emer fêm dikin ku xwûnî bûye.

Muxtarê gund, gundî wekî fon karakter hatine bikaranîn.

Ji ber ku nivîskar girîngî daye mijarê zêde li ser taybetiyên lehengan nesekiniye lê diyaloga di nav her du lehengan de nîşan dide ku baweriya wan bi "şeytanqûnî" heye. Tirsonek in. Atmosfer, çand, gundîtî, nezanî hemû li gor mijarê ne.

#### 2.5.1.5. Dem

Dem, hêmaneke girîng a çîrokê ye. Em di destpêk, dewam û dawiya çîrokê de diyardeyên demê dibînin.

---

[252] "Şeytanqûnî 1", r.7.

[253] "Şeytanqûnî 1", r.7.

“Dema em gihêştin sinorê Îranê bi êvara dereng ra em li gundekî bûne mîvan.”[254]

“Şev gîha bû nîvî ko dengê xirtîniyekê li pêş min hat.”[255]

“Piştî ko sê rojan em li nik xwe kirin mîvan, bi dilxweşî û rûmet bi rê kirin.”[256]

Lê bûyera esil ku dilê xwîneran dike ku bide sekinîn nîvê şevê rû dide.

Şev nîvê şevê ye, du feqe di odeyek bêyî pace de li ser tabûtekê dixwînin. Ev tablo xofek berî dilê mirov dide. Dema ku qepaxê tabûtê dileqe ji feqeyan yek ferq dike û derdikeve derve yê din li hundir dimîne. Vê kêliyê kelecan zêdetir dibe û xwîner bi meraq dibêje gelo wê çibibe? Serê sibê bi roniyê re hemû rastî derdikeve holê. Her tişt eşkere dibe.

Bûyer bi şev dest pê dike û dane sibê bi dawî dibe.

Wekî me li jorê jî dît, dem ne wekî tarîxekî teqez bi diyardeyên wekî “dema em gihiştin sînor”, “bi êvarê dereng”, “şev gihabû nîvî”, “sê rojan” tê nîşandan.

### 2.5.1.6. Mekan

Mekan, sehne ye ku bûyer li ser diqewime. Mekan ji bo nîşandana jiyana sosyal a serdem û lehengan girîng e. Lewre “ûnsûreke esas ya ku karakterê însan diyar dike cih e ku mirov lê dijî/dimîne.”[257]

Di navbera nasnameya mirov û erdnîgariyê de peywendiyeke xurt heye, “romanivîs ji bo diyarkirina nasnameya lehengên xwe ji ûnsûra mekanî sûdê werdigirin.”[258]

Herweha “digel diyarkirina nasnameya leheng bo teswîrkirina jiyana civakî/çandî ya cihê ku lê bûyer rû dide jî mekan sûd wergirtine.”[259]

Di Şeytanqûnî de mekan odeyeke biçûk a ser mizgefta gundekî ser sînorê Îranê ye. Di tevna çîrokê de weha qala mekan tê kirin: “Cihê em tê de, mezeleke biçûk di

[254] “Şeytanqûnî 1”, r.7.

[255] “Şeytanqûnî 1”, r.7.

[256] “Şeytanqûnî 1”, r.8.

[257] Çetişli, *h.b.*, r.77.

[258] Tekin, *h.b.*, r.158.

[259] *H.b.*, r.164.

rex mizgeftê de bû. Ev mezela ku ji du kunên biçûk pê ve tiştek di dîwarên wê de tune bû. Bi tenê ji bo raketina mêvanan hatibû çêkirin. Pixêrî di nîveka dîwarê eniya derî da vêketîbû."[260]

Berê li gundan (ku hê jî li hin gundan ev dewam dike) odeya ku mêvan lê diman, hebûn. Mêvanên ku dihatin li vê odeyê diman û gundiyan ji wan re xwarin dibir. Di çîrokê de jî ev heye: "Dema em gihêştin sinorê Îranê bi êvara dereng ra em li gundekî bûne mîvan. Ji ber ko di gund da ode nîne, gundî mîvanên xwe dibin mizgeftê û her yek ji gundiyan jê ra nan û şîvê dibe."[261] Ev jiyana civakî ya serdemê û çanda Kurdan ya "ode-mazûvanî"yê nîşan dide.

Di navbera mekan û bûyerê de jî têkilî heye, Şeytanqûnî di odeyek biçûk a bê pace de radibe. Em dikarin bibêjin ku xurafeyek encax di mêjiyên tarî û nezan de dikare bi cih bibe. Ev odeya biçûk mêjiyên tarî sembolîze dike.

### 2.5.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê zimanekî sade û herikbar e. Ziman û mijar bi hostatî hatine honandin. Çîrok bi diyalog û axaftinê ketiye dirûveke siruştî û herikbar.

Di tevna çîrokê de biwêj (kevir li ber dibûne kerî), cotepeyv (lez û bez) hatine bikaranîn û bi şibandinên orjînal asta edebîtiyê ya metnê bilindtir bûye.

Şibandinên resen hene di nav metnê de: "Xûneke ecêb di dev û bêvilên cendek ra avêt û Feqe Hesen jî ji tirsan wekî sofiyê bi cerbeze diricifî", "Ji tirsan dilê min, wekî teyrê ko bi dafan dikeve û hol dibe, xwe li ber devê min dixist"

Ziman, zimanekî giran nîne, li gor asta lehengan, gundiyan e lê ne basît e; zimanekî sade, dewlemend û xurt e.

### 2.5.1.8. Raman-Tema

Çîrok, wekî ku ji navê wê jî diyar dibe, li ser baweriyên pûç e ku di nav civata Kurdan de berbelav in. Ev bawerî şeytanqûnî ye. Di destpêka çîrokê de tê gotin: "Wekî her miletî li nik me Kurdan jî der heqê xerafatan da baweriyek heye. Li goreyî wê baweriyê, hin mirî piştî mirinê radibin. Gava ew mirî navê kîjan mirovî hildin, ew

---

260 "Şeytanqûnî 1", r.7.

261 "Şeytanqûnî 1", r.7.

jî dimire. Ji bo vê yekê kijan miriyê ko şeytanqûnî bibe bi merê dikujin. Ji ber ko dibêjin, şeytanqûnî bêmerê bi tu tiştî nayê kuştin."[262]

Nivîskar, mebest û fikra xwe ya sebebê nivîsîna vê çîrokê di destpêkê de rave kiriye.

Gund cihê nezanîn ye, gundî nezan in, li cihê ku nezanîn hebe xurafe jî hene û merivên bi van xurafeyan bawer dikin jî hene. Lê wextê mirov di bûyerên wiha diqewimin bi xwînsarî tevbigere dikare bigihê rastiyê.

Divê wexta bûyerên derasayî diqewimin ne bi xwîngermî û kelecanî mirov bi xwînsarî tevbigere heta ku rastiya bûyerê derdikeve meydanê.

**2.5.2.Hêmanên Teknîkî**

Di çîroka "Şeytanqûnî 1"ê de ji teknîkên vegotinê; teswîr, diyalog û rêbaza vegotinê derdikevin pêş.

**2.5.2.1.Diyalog**

Diyalog, dirûvekî siruştî didin metnê. Di çîrokê de diyalog hene. Bi taybetî diyaloga di navbera feqe û mirî de balkêş û trajî-komîk e.

"- Te xêr e û çi dixwazî?"[263]

"- Bira, ez tiştekî naxwazime. Bi tenê min divê tu werî cem min. Ez ne mirime. Xweya ye ez bi xûnê ketime. Werin yek torpan bidin ko ez li xwe kim û mizgîniyê bidine bavê min û bêjin, kurê te ne miriye. Dê bexşîşeke hêja bide we."[264]

"- Ezê çawan bawer bibim ko tu şeytanqûnî ne bûye?"[265]

"- Te çi divê, ezê welê bikim."[266]

---

[262] "Şeytanqûnî 1", r.7.

[263] "Şeytanqûnî 1", r.8.

[264] "Şeytanqûnî 1", r.8.

[265] "Şeytanqûnî 1", r.8.

[266] "Şeytanqûnî 1", r.8.

"- Qurana min bi tûrê nên va li wir in, heke te dane min, dê zanibim ko tu şeytanqûnî ne bûye."[267]

**2.5.2.2.Teswîr**

Çîrok herçiqas kurt be jî, cihê qewimîna bûyerê bi dorfirehî hatiye teswîrkirin.

"Cihê em tê da, mezeleke biçûk, di rex mizgeftê de bû. Ev mezela ko ji du kunên biçûk pê va tiştek di dîwarên wê de tine bû, bi tenê ji bo raketina mîvanan hatibû çêkirin. Pixêrî di nîveka dîwarê eniya dêri de veketi bû. Cendek di nava tabûteke textînî da, serî berve agir û ling bi deri de bûn. Me her du hevalan weke kewê nêçîrê li pêşberî hev bi dengekî nîvbilind quran dixwend."

**2.5.2.3.Leîtmotîv**

Di çîroka "Şeytanqûnî 1"ê de peyva "şeytanqûnî"ya ku navê xwe daye çîrokê, yazdeh caran hatiye ducarekirin.

**2.6.ŞEYTANQÛNÎ-2[268]**

Çîroka Şeytanqûnî ya duyem ji du rûpelan pêk tê. Mijara Şeytanqûnî-1 û Şeytanqûnî-2yê yek e; lê leheng, mekan, dem ji hevûdin cuda ne. Vegêr di destpêkê de behsa Şeytanqûnî nekiriye, bi kurtasî qala Mala Ebês û çar kurên wî kiriye.

**Kurteya Çîrokê**

Li bin hêla Îzolê, li quntarên çiyê gelek gundên biçûk hene. Di van gundan yekê de bi navê mala Ebês çar bira hene. Bira hertim qenciya hevûdin dixwazin, malên wan ji hevûdin cuda ne; lê hertim bi hevûdin re radibin rûdinên. Rojekê ji çar birayan yê bi navê Elo dimire. Birayên Elo wî dibin vedişêrin, ji ser gora wî vedigerin û bi şîna birayê xwe re mijûl dibin.

Jina Elo Zêzê tevî biçûkê xwe yê yek salî ji hemûyan pirtir li ber mirina Elo dikeve. Şîna wê ji ya hemûyan girantir e. Mêvan diçin, Zezê heta nîvê şevê li ber êrgûn rûdinê, dirame. Nîvê şevê dengek ji derî tê. Yek li ber derî navê Zêzê hildide, Zêzê mat dibe û dibêje ku mêrê min şeytanqûnî bûye.

---

[267] "Şeytanqûnî 1", r.8.

[268] Osman Sebrî, "Şeytanqûnî 2", *Hawar,* j. 56, 15 Tîrmeh 1943, r.3-4.

Darek mezin dike pişt derî ku mêrê wê nekeve hundir. Elo, dinêre ku Zêzê jê bawer nake ji pixêriyê re xwe berdide hundir. Zezê jî di vê navberê de derî vedike û bi nava gund re dibeze. Hemû xizm û cîranan kom dike. Birayên Elo her yekî merek di dest de xwe di pixêriyê re berî hundir didin. Elo derfeta revê nabîne û fêm dike ku tu kes jê bawer nake, hema biçûkê xwe yê di dergûşê de ji xwe re dike sîper û bang li Qasimê cîran dike. Qasim tê. Elo ji Qasim hêvî dike ku guh bidê. Serpêhatiya xwe jê re vedibêje û hemû fêm dikin ku Elo ne şeytanqûnî bûye, Elo bi xwînê ketiye.

### 2.6.1.Hêmanên Materyal

#### 2.6.1.1. Vegêr

Di destpêka çîrokê de nivîskar, li ser herêma lê bûyer diqewime, agahiyan dide. Ne wekî ku mirov dest bi xwendina çîrokekê bike, wekî ku mirov ji rûpelên tarîxê rûpelekê bixwîne.

> **"**Di binhêla îzolê-bendê û serhêla Şîroyê de li pal û qûntarên çiyê gelek gundên biçûk hene ko rûniştmanên van gundan ji 10-13 malan pirtir nabin. Di van gundên han yekî de bi navê mala Ebês çar bira hebûn ko bi qencîhya ji hev ra, di nav gundên dorhêlê de hatibûn nasîn. Ên ko çakî û dilovaniya wan ji hev ra dîtî, tevlî zîvarêya wan dikaribûn bêjin ko her çar kurên Ebês bextiyartirên xelkê wî cihî ne. Tevlî ko ev birayên han ji hev cuda rûdiniştin, malên wan ji hev nedihatin nasîn. Mirov bîçûya mala kijanî ji wan; birayê din lê de didît, an bi hev ra li nav zeviyekê di xebatê de didîtin."[269]

Dû re serleheng-vegêr "Alo", dest bi neqilkirina serpêhatiyê dike. Xwîneran dikişîne nav bûyerê, bi xwîner re meraq çêdibe û kelecanek dikeve nav dilê xwîner, lê ev pir dewam nake. Leheng-vegêr, çîrokê dide rawestandin û vegera ji gorê ya Alo vedibêje: "Ji bo ko em bizanibin, Alo çawan ji gorê bi derketiye û piştî ko hatiye paş dêrî çilo gazî jina xwe kiriye, çi lê qewimiye; divê em rê bidin gotina wî."[270] Ev tevger sebebê qelsbûna berhemê ye.

Vegêr "ez/min" e. Em di hevokan de dibînin ku ev, serpêhatiya serlehengê çîrokê ye.

---

[269] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[270] "Şeytanqûnî 2", r.3.

“Bêşik min bîra mirina xwe û kûrayiya gorê nedibir. Hew min dît, bêvilên min şewitîn û aveke germ û nerm bi ser dev û sînga min de herikî. Min hinekî xwe tev da, cihê ko ez î tê de î teng û tarî bû.”[271]

### 2.6.1.2. Awayê Nêrînê

Vegêr “ez”; ango lehengê sereke yê çîrokê ye. Çîrok, serpêhatiya leheng-vegêr e. Ji serî ta dawiyê em bûyerê, bi çavên wî dibînin bi guhên wî dibihîzin. “Vegêr-leheng bi ziman û şêweya xwe bûyerê neqil dike û bi zimanê kesê yekem diaxive. Di vegêranê de rasterast xwe û serpêhatiyên xwe dike binyad, rasterast ziman û şêweya xwe bi kar tîne, nasnava mirovekî ji rêzê bi kar tîne, vegêrên ku bi xwînerên xwe re diyalogeke wiha germ, ji dil û pêbawer datînin, ev vegêr vê keysê didin xwandevanên xwe.”[272]

Digel erêniyên ku me li jorê qala wan kir, dîsa jî ev nêrîna vegêr-leheng, berhemê ji hin aliyan ve sînordar dike. Lewre xwîner her tiştî li gor dîtina wî dibîne, dinirxîne. Ji bilî tiştên ku vedibêje tiştekî din nabîne.

### 2.6.1.3. Rêzebûyer

Bûyer, serpêhatiya vegêr-leheng e. Eger em agahiyên ku vegêr di destpêkê de dide ji çîrokê derxin, em dikarin bibêjin ku bûyerên pêşî û yên dawî wekî xelekên zîncîrekê bi hevûdin ve girêdayî ne.

Mirina Alo, şîn û vegera wî, hemû li gor rêzê bi hevûdin ve hatine girêdan. Her xelekek bi ya din ve li gor sedem-encamê hatiye girêdan.

Di tevna çîrokê de hin girêk hene ku kelecana xwendevan zindî dihêlin, bûyerê dikin dirûvekî balkêş û didin xwendin. Vegêr di serî de girêkê venaçirîne, Alo wextê behsa serpêhatiyê dike, paşve vedigere û bûyerê vedibêje. Haya xwendevan heta vir ji rastiyê nîne. Di dawiyê de rastî derdikeve holê û girêka çîrokê tê veçirîn.

### 2.6.1.4. Leheng

**Alo:** Lehengê sereke ye, ji çar kurên mala Ebês yek e. Bûyer ji serî ta dawiyê serpêhatiya wî ye. Malbata wî, wî dike gorê paşê ew ji gorê derdikeve. Dibêjin şeytanqûnî bûye lê ne wisa ye, xwînî bûye.

---

[271] “Şeytanqûnî 2”, r.4.

[272] Çeşitli, *h.b.*, r.86

Gundiyek ji rêzê ye, bi cotkariyê re mijûl dibe. Jin û zarokeke wî heye.

**Zêzê:** Xanima Alo ye. Dergûşeke wê ya yek salî heye. Ji ber mirina Alo xemgîn e.

Bira û xizmên Alo, ji gundiyan Qasim û gundî wekî fon hatine bikaranîn.

Lehengên çîrokê li gor bûyerê ne û vegêr ew di nav çîrokê de li gor taybetî û bawerêya wan, bi kar anîne.

Di çîroka "Şeytanqûnî 1"ê û "Şeytanqûnî-2"yan de lehengê ku tê gotin şeytanqûnî bûye xwe bi awayekî xilas dikin. Ji kuştinê difilitin. Herweha di her du çîrokan de jî rastî derdikeve holê û ev bûyera tarî tê ronîkirin.

### 2.6.1.5. Dem

Di çîrokê de dem bi peyvên wekî "nîvê şevê", "êvarê" tê nîşandan. "Hîn ro negîhabû nîveka ezmên ko bi arîkarêya cîhnaran cendekê Alo sipartibûn axa sar û kêleke bilind di hêla sêrî de daçikandibûn."[273]

"Şev gîha bû nîvî ko Ii paş dêrî dengek bi guhê Zêzê ket; navê wê hildidan û digot:"[274]

Di çîroka Şeytanqûnî 1ê de jî şev nîvê şevê ye wexta şeytanqûnî radibe. Di vê çîrokê de jî wexta ku şeytanqûnî radibe şev nîvê şevê ye.

Şeytanqûnî, xurafeyeke ku di nav civaka Kurdan de belav bûye. Bûyereke wiha dema ku di tariyê de diqewime, li atmosfer û dema çîrokê re li hev tê û bi mijarê re jî dibe palpişt. Wexta ku dibe sibe ango piştî ku dinya ronî dibe rastiya bûyerê derdive meydanê.

Tevna çîrokê, bûyer û dem li hev tên. Ev jî biserketina çîrokê nîşan dide.

### 2.6.1.6. Mekan

Di Şeytanqûnî 2yê de cih, gundekî li quntara çiyê, li binhêla Îzolê ye. Gundekî biçûk ku ji deh-panzdeh malan pêk tê.

Bûyer li goristanê û mala serleheng Alo diqewime.

---

[273] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[274] "Şeytanqûnî 2", r.3.

"Min hinekî xwe tev da, cihê ku ez tê de bûm teng û tarî bû."[275]

Mekan li gor mijara çîrokê ye, lewre dibêjin Elo şeytanqûnî bûye ev bûyer encax dikare li goristanekê biqewime. Cihê ku Elo tê de ye ciyekî tarî û teng e, ev teswîra mekan di heman demê de rewşa Elo ya tê de ye jî diyar dike.

Heta ku dinya ronî dibe, rastî derdikeve meydanê Elo jî ji wê tarî-tengasiyê xelas dibe.

### 2.6.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê sade, herikbar û siruştî ye. Bi gotinên pêşiyan, nifir, biwêj, cotepeyvan dagirtî ye. Şibandinên xurt û orîjînal hatine bikaranîn.

"- Wey qeda bi te û bavê te keve; tu bi mirinê nemayî, şeytanqûnî jî bûyî!"[276]

"Çira kesî heya sibê vêketî nemaye…"[277]

Zimanê çîrokê li gor bûyer, kadroya şexsan û cihê çîrokê ye. Ziman, zimanê lehengê sereke Alo ye. Alo, gundiyek e û wekî gundiyekî diaxive.

Diyalog hatine bikaranîn û bi saya diyalogê metn ketiye dirûvekî siruştî.

"- Zêzê, were dêrî veke ez hatim."[278]

"- Tu kî yî ko ez dêrî vekim?"[279]

"- Ez Alo me. Ma tu dengê min nas nakî?"[280]

### 2.6.1.8. Raman-Tema

Di nav hemû civakan de xurafe hene. Nivîskar xwestiye xurafeyên di nav civaka Kurdan de nîşan bide.

Armanca vegêrana çîrokê di destpêkê de hatiye ravekirin ku vegêr dixwaze baweriyên pûç, xurafeyên di nav civaka Kurdan de nîşan bide, rexne lê bigire û pûçiya wan bide ber çavan. Ji destpêkê heta dawiya bûyerê vegêr, "şeytanqûnî"

[275] "Şeytanqûnî 2", r.4.

[276] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[277] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[278] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[279] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[280] "Şeytanqûnî 2", r.3.

derdixe pêş û di guhên xwînerên xwe de dibêje heke hûn wextê bûyerên bi vî awayî diqewimin hinekî bi xwînsarî tevbigerin hûnê rastiyê bibînin.

Ev çîrok bi agahîdayîna nivîskar-vebêr dest pê dike û bi vegotina leheng-vegêr bi dawî dibe. Di destpêkê de agahiyên ku vegêr dide meraqa di dilê xwendevan de qels dike.

Bikaranîna diyalogan dirûvekî siruştî daye bûyerê û bûyer bi diyalogê dawî bûye. Lê dawî bi yek hevokekê hatiye dayin û diyar e ku nivîskar nexwestiye zêde dirêj bike.

Ji bilî navê Elo-Zêzê-Qasim em navê lehengên din ên çîrokê nizanin herweha ev leheng jî ne bi awayekî psîkolojîk û kûr, bi rengekî sathî hatine ravekirin. Vegêr ne ji aliyê psikolojîk ne jî ji aliyê taybetiyên fizîkî ve tu agahî nedaye. Ev jî kêmasiyeke çîrokê ye. Lehengên din bira û gundî ne tenê em vê zanin. Ji tevger û baweriyên wan em fêm dikin ku ji aliyê bawerî, çand û jiyana civakî ve hemû dişibin hevûdin.

Mekan ango sehna bûyer lê diqewime û mijara bûyerê pir li hevûdin tên û leheng jî li gor vê hatine hilbijartin ewqas li hevûdin tên ku mirov nikare ne cih, ne leheng, ne jî herikbariya çîrokê tevbide ku ev jî digel kêmasiyan serkeftina vegêr dide ber çavan.

Di çîrokê de em dibînin şîn di çanda Kurdan de çawa tê kirin. Nivîskar wekî tabloyekê şîna Elo nîşanî xwendevan daye. Hemû gundî li mala Elo kom dibin, gotina diavêjin ser mirî, digirîn, alîkariye didin mala şînê.

**2.6.2.Hêmanên Teknîkî**

**2.6.2.1.Teswîr**

Di çîrokê gor û kêliya ku Elo ji gorê derdikeve hatiye teswîrkirin. Teswîreke xurt, herikbar û trajî-komîk e.

> "-Bêşik min bîra mirina xwe û kûrayiya gorê ne dibir. Hew min dît, bêvilên min şewitîn û aveke germ û nerm bi ser dev û sînga min da herikî. Min hinekî xwe tev da, cihê ko ez î tê da î teng û tarî bû. Tu ne çû min dît bêhna min jî çikiya. Hînga min bîr bir ko ez î di gorê da me. Min zûka qerqes bi ser xwe va anî ko di jêr va bi vekirina gorê mijûl bibim. Lê gava Xwedê bixwaze yekî ji tengiyê bi derxe, bê west jî dike. Hîn min destên xwe li tehtên ser xwe negerandi bû ko pê ra teqayek di tala serê min da

vebû û bayekî sar di pê ra li nav çên min ket. Ronahiya hîvê siya cinawirekî bi ber çavên min xist. Ji ber ko teqa di ser serê min ra e fereh bû, min nîvê cendekê xwe tê ra bi der xist. Cinawir ji min tirsî û baz da. Heke ez ne şaş bim, hirç bû."[281]

#### 2.6.2.2.Diyalog

Di Şeytanqûnî 2yê de herçend diyalog kêm bin jî, hene. Em axaftina Alo, Zêzê û Qasim dibînin.

Diyalog dirûvekî siruştî didin vegêranê. Bi saya diyalogan; axaftin, kultur û şêweya lehengan eşkere dibe.

"- Zêzê, were dêrî veke ez hatim."[282]

"- Tu kî yî ko ez dêrî vekim?"[283]

"- Ez Alo me. Ma tu dengê min nas nakî?.."[284]

"- Wey qeda bi te û bavê te keve; tu bi mirinê nemayî, şeytanqûnî jî bûyî!"[285]

---

[281] Şeytanqûnî, r.3.

[282] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[283] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[284] "Şeytanqûnî 2", r.3.

[285] "Şeytanqûnî 2", r.3.

## 2.7. ŞÊYTANQÛNÎ-3 [286]

Çîrokek kurt e, ji rûpelekê pêk tê. Ev çîrok jî wekî “Şeytanqûnî-1”, “Şeytanqûnî-2”, “Terşê Şevê” û “Şêxê Barzan” li ser xurafeyan e. Çîrok di nav realîzmeke xurt de bi awayekî trajî-komîk hatine nivîsîn. Herçiqas mijara çîrokan yek be jî ji aliyê honak, dem, cih, leheng, ziman û şêweyê ve ji hevûdin cuda ne. Çîrokek kurt e lê tesîra wê zêde ye.

**Kurteya Çîrokê**

Di sala 1941ê de kamyonek ji Şamê bi rê dikeve û ber bi Dêrayê ve diçe. Di kamyonê de malên ticaran û tabûtek heye. Ev tabût li ser daxwaza gundiyekî hatiye çêkirin.

Gundiyên Dêrayê jî wekî hemû gundiyan xwe didin ser rê û li hatina otomobîlekê dipên. Hîn wesayît ji Şamê bîst kilometre dûr nakeve, kesek destê xwe li ser rê ji ajokar re radike. Ji ber ku di hundirê kamyonê de cih tune ye, ajokar rêwî dişîne ser pişta kamyonê. Dinya sar û ewrayî ye. Pir naçe baran lêdike. Rêwiyê li ser pişta kamyonê, ji bo xwe ji ber baranê bide alî, deriyê tabûtê radike û tê de vedizele. Rêwî bi vezelînê re bi xew re diçe.

Piştî bixewreçûnê li cihekî sê rêwiyên din û dû wan re jî duduyên din li ser pişta wesayitê siwar dibin.

Gava digihîjin Horanê, wesayît, ji nebaşiya rê bê hemdî dileqe. Bi leqîna wesayîtê re, ê di tabûtê de şiyar dibe. Her pênc rêwiyên dora tabûtê ku yê di tabûtê de mirî dizanin ji tirsa xwe ji ser wesayîta ku bi leza 40-50 kîlometreyî diçe, diavêjin. Yê şeşan jî li pey wan xwe diavêje.

Her pênc rêwiyên dest û lingên wan şikestî gava dibînin miriyê ku wî wekî şeytanqûnî zanibûne xwe li pey wan avêtiye, dixwazin birevin lê ne mimkin e. Di vê navberê de ajokar disekine û li rêwiyan vedigere. Dema sebebê xwe avêtinê ji wan dipirse; her pênc dibêjin mirî şeytanqûnî bûye. Ajokarê bi rastiyê dizane, diçe ser ên şeşan dibêje lê te çima xwe avêt? Ew jî dibêje ‘min dît her pêncan xwe avêt û wesayît dileqe, min got dibe ku agir pê ketibe û min de dû yên din.

---

[286] Osman Sebrî, “Şeytanqûnî 3”, *Hawar*, j. 57, 15 Tebax 1943 r.2.

Şofêr, her şeşan li dora tabûta ji bo miriyekî çêkirî ve girê dide û diçe nexweşxaneya Dêrayê. Tabûta ku ji bo yekî çêkirî 6 cendekan li dora xwe dicivîne.

### 2.7.1. Hêmanên Materyal

#### 2.7.1.1. Vegêr

Vegêr ew kes e ku bûyerê neqil dike. Wezîfeya "vegêrê di dinya çîroksaziyê de, di dinya metnê îtîbarî de ew e ku di navbera metn û xwîner da peywendiyê çêdike, şahidiya bûyer û lehengan dike, bûyera ku diqewime vedibêje an neqil dike, herî dawî rave û nirxandinê dike."[287]

Nivîskar-vegêr bi hêzeke îlahî dikare bikeve mêjiyê lehengên xwe daxwaz û hestên wan ên herî veşartî derxe meydanê.

Di vê çîrokê de nivîskar-vegêr e. Bûyerê neqil dike. Her tiştî dibîne ango şahidiya her tiştî dike ne wekî lehengek çîrokê ye wekî çavdêrekê bûyerê ye:

> "Piştî di xewvaçûna rêwiyê pêşîn bi hinekî, sê rêwiyên din siwar dibin û di pê wan ra jî dudu. Lê ev her pênc rêwiyên han, hezra miriyekî di nava tabûtê da dikin. Dizanin ko gundiyek di xestexanê da miriye û di nav tabutê da li xelkê wî vedigerînin. Bi vê ramana han, di dorhêla tabûtê da pal didin û dipeyivin."[288]

#### 2.7.1.2. Awayê Nêrînê

Çîrok ji devê kesê sêyem tê neqilkirin. Em bûyerê li gor dîtin, bihîstin û nêrîna wî dibînin.

Nivîskar-vegêr bûyerê bi ziman û şêweya xwe vedibêje.

"Nemaze di bin peşkên baranê û li ser pişta kemyonê. Wek zarokên di landikê de mirov bêhemd ji xwe diçe. Rêwiyê dêlalî jî bi vezelînê ra dikeve xew."[289]

#### 2.7.1.3. Rêzebûyer

Ji serî heta dawiyê bi tenê bûyerek heye. Nivîskar-vegêr, bûyera ku hevok bi hevok bi hevûdin ve girêdayî ye, vedibêje.

---

[287] Tekin, *h.b.*, r.27-28.

[288] "Şeytanqûnî 3", r.2.

[289] "Şeytanqûnî 3", r.2.

Gundî derdikevin ser wesayitê, gundiyê berî hemûyan ê ji ber baranê dikeve tabûtê derî vedike, gundî dibêjin mirî şeytanqûnî bûye, xwe ji ser wesayîtê diavêjin, ajokar her şeş rêwiyan dibe nexweşxaneyê.

Bûyer, wekî xelekên zincîrekê; ku jê re dibêjin “rêzebûyera yekxelek” bi hevûdin ve girêdayî ye. Lê nivîskar-vegêr wekî çîrokên me dahurandî, di vê çîrokê de jî bûyerê li du cihan dide rawestandin û haydariyan dide xwîner: “Gundiyên li ser rêya Derayê, wek hemû gundiyên li ser şehrahan, ji bo gihana cihê çûyînê, pir caran xwe didin ser rê û çavnêriya hatina otomobîlên barkêş dikin, da ku xwe bi bihayeke hindik bigihînin qesdegeha xwe.”[290] Ev yek herikbariya çîrokê xerab dike.

Di çîrokê de girêkên divê xwîner vebikin, tune ne. Vegêr hemû girêkan yek bi yek ji hevûdin vedike. Hêmana meraqê bi xwîneran re nahêle. Ev jî dibe sebebê qelsiya berhemê.

### 2.7.1.4. Leheng

Di çîroka “Şeytanqûnî 3”yê de lehengên li ser bi dorfirehî agahî hatibin dayin tune ne. Heta navê tu lehengî nehatiye gotin. Ajokarekî kamyona rêwiyan heye. Em ji seranserê bûyerê fêm dikin ku baweriya her pênc gundiyên li ser pişta kamyonê bi şeytanqûnîbûnê heye.

### 2.7.1.5. Dem

Her bûyer di demekê de diqewime. “Di her romanê de saetek heye.”[291] Ev bûyer di kanûna pêşîna sala 1941ê de qewimiye. Bûyer bi rêwîtiyekê dest pê dike û di nav çend saetan de diqewime.

Çîrok weha dest pê dike: “Di serê Kanûna Pêşîna sala 1941 de kemyonek ji Şamê bi derket û berê xwe de Derayê.”[292]

Di dewama çîrokê de hêmanên demê yên wekî “pir neçû”, “hîn otomobil ji Şamê bîst kilometre bi dûr neketibû…” hene.

[290] “Şeytanqûnî 3”, r.2.

[291] Foster, *h.b.*, r.68.

[292] “Şeytanqûnî 3”, r.2.

#### 2.7.1.6. Mekan

Ji ber ku bûyer di rê de diqewime, cih jî kamyon bi xwe ye ku ji Şamê derdikeve û ber bi Dêrayê ve diçe. Tabûtek li ser kamyonê heye. Gundiyek dikeve tabûtê û bi barîna baranê re di xew ra diçe. Gundiyên ku piştî wî li kamyonê siwar dibin zen dikin ku di tabûtê de miriyek heye.

Peywendiya di navbera cih, bûyer û leheng de peywendiyeke xurt e. Mekan ne ciheke xeyalî cihekî rasteqîn e.

#### 2.7.1.7. Ziman û Şêwe

Ziman, zimanê nivîskar-vegêr e. Zimanek sade, zelal û herikbar e. Zimanekî xurt û edebî ye şibandinên orîjînal hene. "Wek zarokên di landikê da" û cotepeyv "pel pel" hene.

Nivîskar bi tenê di dawiya çîrokê de bi du-sê hevokan cih daye axaftina lehengan.

"-Me miriyek di tabtê de dizanî. Gava wesayit çengiya û derê tabutê vekir, me got qey Sêytanqûnî bûye û me xwe avêt."[293]

"-Ev camêrên han ji te tirsîn û xwe avetin; lê te ji bo çi xwe avêt?!.."[294]

"-Çaxa wesayit çengiya û ez hişyar bûm, min nizanî bû ko çi qewimiye."[295]

Ev diyalog jî li gor çand, perwerde, jiyana civakî, himendiya lehengan e ku tevgerê wan jî vê nîşan didin.

#### 2.7.1.8. Raman-Tema

Ev çîrok jî wekî Şeytanqûnî-1, Şeytanqûnî-2yê li ser xurafeyan e. Vegêr, ev xurafe bi awayekî trajîkomîk neqil kiriye.

Kamyonek di rê de ye, li ser pişta wê tabûtek heye ku rêwiyek tê dikeve tabûtê û tê de bi xew re diçe. Baranek hûrik hûrik dibare, ji ber ku rê xirab e û kortên ser rê tîjî av bûne, wesayît diçenge, yê ku mirî tê zanîn ango şeytanqûnî derê tabûtê vedike

---

293 "Şeytanqûnî 3", r.2.

294 "Şeytanqûnî 3", r.2.

295 "Şeytanqûnî 3", r.2.

dibîne ku rêwiyên li dorê yek bi yek xwe ji ser wesayîtê diavêjin jêrê û ew jî dide dû wan.

Wextê xwîner di nav vê atmosferê de bûyerê dixwîne bişîrînek li ser rû çêdibe û wê tabloya ku vegêr bi peyvan bi hostatî honandiye dide ber çavên xwe. Ev hostetiya vegotinê ya nivîskar-vegêr nîşan dide.

Çîrokeke kurt e ji ber vê tu hurgilî di nav çîrokê de nehatine dayîn. Xwendevan çend rêwî, ajokarek û tabûtek li ser wesayitekê dibîne; ne nav ne jî taybetiyên fizîkî yên lehengên çîrokê hene. Tenê em ji tevgera wan fêm dikin ku ev gundî ji şeytanqûnî bawer dikin û yanê baweriya wan yek e ji ber vê yekê çîrok ji aliyê hunerê ve pir xav maye, nepijiyaye û tehmeke xweş di hişê xwendevan de nahêlê.

**2.7.2.Hêmanên Teknîkî**

**2.7.2.1.Diyalog**

Di dawiya çîrokê de ev kurte-diyaloga derdikeve pêş xwîner:

“-Me miriyek di tabutê de dizanî. Gava wesayit çengiya û derê tabutê vekir, me got qey Sêytanqûnî bûye û me xwe avêt.”[296]

“-Ev camêrên han ji te tirsîn û xwe avetin; lê te ji bo çi xwe avêt?!..”[297]

“-Çaxa wesayit çengiya û ez hişyar bûm, min nizanî bû ko çi qewimiye.”[298]

[296] “Şeytanqûnî 3”, r.2.

[297] “Şeytanqûnî 3”, r.2.

[298] “Şeytanqûnî 3”, r.2.

## 2.8. SEYÊ KO GUR TANÎ FÊZA PÊZ[299]

Ev çîrok ji sê rûpelan pêk tê. Ji hemû çîrokên Osman Sebrî yên din cuda ye. Lehengê sereke yê vê çîrokê seyekî xiniz e. Bi vî awayî çîrok dişibe çîroka bi navê *Sancho'un Sabah Yürüyüşü* (Meşa Serê Sibê ya Sancho) ya Haldun Taner û *Güvercin* (Kevok) a Erdal Öz.

Se wekî heywanekî dilsoz û sadiq tên nasîn. Însanan diparêzin, raçav dikin herweha taybetmendiya wan a parastinê derdikeve pêş.

Ev çîrok serpêhatiya nivîskar Osman Sebrî ye û di çîrokê de ji lehengek jî ew bi xwe ye.

**Kurteya Çîrokê**

Rojekê li odeya rûniştinê, xortek dibêje gurê Osman Sebrî dîsa berî keriyekî daye û miyek biriye. Di wê navberê de serşivan Mislimê Qucûl deriye odeyê vedike û serê miyekê li ber piyên Osman Sebrî datîne. Bêhna Sebrî teng dibe û bi ser şivên de diçe. Dibêje: "Kuro Mislim êdî nema ez dikarim li ber vê pîsiya we şivanan xwe ragirim. Eger miyeke din bête kuştin, divê hon her çar şivan jî terka pêz bidin û ezê her çaran jî bidim kuştin."[300] Mislimê ku Osman Sebrî baş dinase, dizane ku wê bi ya xwe bike. Lewre jê re dibêje îşev tifinga xwe bigire û were cem pêz, tu yê rastiyê hîn bibî.

Mislim ji odeyê derket. Osman Sebrî êvarê piştî şîvê sê peyan digire û diçe fêza pêz. Dibîne ku her çar şivan jî bi tifingin û li çar hêlên pêz rûniştine. Çaryekek bi şûn de Mislim dibêje;

"-Tu zanî gur dike were."[301]

"-Tu ji çi dizanî?"[302]

"-Ev e, seyê mezin dike gaziyê ke."[303]

---

[299] Osman Sebrî, "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", *Ronahî*, j. 15, 1 Hezîran 1943, r.5-6-7.

[300] "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.6.

[301] "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.6.

[302] "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.6.

[303] "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.6.

“-Ma qey seyê mezin î xiniz e?”[304]

“-Erê, tu niha bala xwe bidê, ezê her tiştî paşê ji te ra bêjim.”[305]

Li ser gotina Mislim dibîne ku seyê mezin ji pêz dûr ket. Hê çaryeyekek nebûrî ku zûriya li pey vê zûrîna gur jî bihîst. Mislim dibêje, baş bala xwe bidê lê hê gotina xwe neqedandibû qêrîn kete nav pêz. Dibînin ku gur li stûyê miyekê xistiye û dibe. Di wê kêliyê de gur dikujin.

Osman Sebrî li vê derê fêm dike ku seyê mezin gur tîne fêza pêz, paşê şopa gur dide windakirin. Sebrî vedigere ji Mislim re dibêje;

“-Ma ne seyê mezin gur tîniye fêza pêz û arikarêya wî dikiye?”[306]

“-Erê ezbenî haya min ji vê yekê heye.”[307]

“-Mafir ko haya te jê heye, te çima ji min ra ne digot?!”[308]

“-Ez ditirsiyam ko tu sê bikujî, lewre min ne digot.”[309]

“-Ma gelo tu bê ji vî seyê xiniz ra kuştin navê?”[310]

“-Belê divê lê ne niha.”[311]

“-Piştî ko pêz hemû bide gur û hînga em wî bikujin?”[312]

“-Ezbenî, ev se seyekî ecêb xurt û jêhatiye. Dêla me di van rojan de tê ye se. Min dil hebû ez carê, duduyan wî berdim ser dêlê û paşê te serwextî çîrokê bikim û heta em wî bikujin.”[313]

---

304 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.6.

305 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.6.

306 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

307 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

308 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

309 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

310“Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

311 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

312 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

313 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

Lewre Mislim dixwaze piştî cewrikên wê çêbin vî seyî bikuje. Lê Osman Sebrî piştî ku rastiyê hîn dibe nasekine û se dikuje. Dibêje wê çêliyên wê jî xiniz bin. Çîrok bi pêşgotina “Giya li ser koka xwe şîn dibe”[314] bi dawî dibe.

### 2.8.1.Hêmanên Materyal

#### 2.8.1.1. Vegêr

Di berhemên otobiyografîk de vegêr nivîskar bi xwe ye, cih daye jiyan, fikr û ramanên xwe. Di berhemên edebî de mimkin e ku em vegêr bi awayekî di nav berhemê de bibinin, ev ne kêmasiyeke mihim e, ya mihim ev e ku “tişta ku dixwaze vebêje çawa vedibêje.”[315]

Ji ber ku nivîskar dixwazin jiyana xwe têxin nav metna edebî rêbaza otobiyografîk derdikeve holê. “Rêbaza otobiyografîk şêweyeke vegotinê ye ku bingeha wê otobiyografî ye.”[316]

Çîrokeke otobiyografîk e, nivîskar-vegêr; lehengê çîrokê ye. Vegêr, bêyî dudilî navê xwe jî bi kar aniye, yê ku bûyerê neqil dike, ew e. Bûyer serpêhatiyeke Osman Sebrî ye.

#### 2.8.1.2. Awayê Nêrînê

Di berhemên otobiyografîk de vegêr “ez/min” e. Yanê yê ku qala wî tê kirin û yê ku vedibêje heman kes e. Xwîner hemû bûyerê bi çavên vegêr dibîne, ji ber vê yekê “çarçoveya awayê nêrînê pir teng e.”[317]

Vegêr “ez/min” e: “Di tebaxa sala 1923an de gurek hînî keriyê pezê min bû bû.”[318]

Di çîrokên bi wî awayî de hemû bûyer li gor dîtina vegêr ango leheng tên nîşandan. Xwîner, her tiştî li gor dîtin û gotina nivîskar-vegêr dibîne û dibihîse: “Vegêr, ziman û şêweya xwe bi kar tîne.”[319]

---

314 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

315 Tekin, *h.b.*, r.270.

316 Tekin, *h.b.*, r.271.

317 Aytür, *h.b.*, r.31

318 “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.5.

319 Çetişli, *h.b.*, r.79.

#### 2.8.1.3.Rêzebûyer

Osman Sebrî di paragrafa pêşîn a çîrokê de dibêje berî vê çîroka min di jimara buhurî ya *Haware*ê de Qedrî Can çîrokên weha nivîsîbû. Min jî xwest çîrokekê di vî warî de binivîsim. Û dibêje şahide çîrokê ew bi xwe ye. Em jê fêm dikin ku ev çîrok yek ji bîranînên wî ye.[320] Dû vê paragrafê re behsa gur dike ku hînî pezê wî bûye. Dibêje ji ber ku hemû xelkê Mirdêsê bi serdestiya şivan û seyên wî yên baş dizane û ji ber vê yekê ya ku tê serê pezê wî ji xelkê re ecêb tê, êdî gur li pezê kê dixe dibêjin gurê Osman Sebrî li pezê filan kesî xist.[321] Piştî van agahiyan bûyera sereke bi vê hevokê dest pê dike: "Rojekê dîsa em li odeyê rûniştî bûn, ko xortekî digot: du gurê O. Sebrî berdaye keriyê Bîdosê (navê gundekî min e) û mihiyek biriye."[322]

Em dibînin ku nivîskar berî vegotina çîroka eslî, ji bo xwînerên xwe serwext bike hin agahdarî dane. Ev yek jî destpêkirina bûyera eslî (ku çîrok ev e) paşve xistiye.

Bûyera sereke bi vê hevoka jorê dest pê dike. Paşê Osman Sebrî vegêr-leheng diçe fêza pêz. Digel şivanan dibîne ku seyê wî yê xiniz gur tîne nav pêz, seyê dikuje û bûyer bi dawî dibe.

Bûyer ne ji paragrafên destpêkê be ku wekî beşeke serbixwe xuya dikin, bi hostatî hatiye honandin, bi diyalog û teswîran hatiye ristin. Bûyer li gor rêzê hatiye vegotin.

#### 2.8.1.4.Leheng

**Seyê ku gur tîne fêza pêz:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Seyekî xurt û jêhatî yê Osman Sebrî ye. Ewqas xurt e ku şivên, xiniziya wî ji Sebrî re nabêjin ku Sebrî wî nekuje. Piştî ku Sebrî serwext dibe seyek xiniz e, wî dikuje.

**Osman Sebrî:** Vegêr, nivîskar û lehengekî çîrokê ye. Bûyer bîranîneke wî ye û yê bûyerê vedibêje ew e.

---

320 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

321 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

322 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

**Mislimê Qucûl:** Şivanekî Osman Sebrî ye. Sebrî, ji bo wî dibêje: "Mislim, di şeran de mêrekî çak bû; hindik dipeyivî û pir dikir. Ji bo vê min gelekî rûmeta wî digirt û gotinên wî dibihîstim."[323]

Sê şivan û xelkê Mirdêsê wekî fon hatine bikaranîn.

Osman Sebrî cara pêşîn di çîrokeke xwe de heywanek kiriye lehengê sereke.

Di çîrokê de em jiyana civakî ya Kurdên li gundan dijîn, dibînin.

**2.8.1.5.Dem**

Rojek ji rojên sala 1923yê ye. "Di tebaxa sala 1923an de gurek hînî keriyê pezê min bû bû."[324] Çîrok rojekê dest pê dike û bi şev, bi kuştina seyê bi dawî dibe.

**2.8.1.6. Mekan**

Di navbera mekan û însan de peywendiyeke xurt heye, hema hema hemû nivîskaran ev peywendî di berhemên xwe de bi kar aniye, di berheman de "mekan wekî ûnsûrekî derketiye pêş ku nasnameya kesan diyar dike."[325]

Di çîroka **"**Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz" de mekan ew cih e ku lê pez tê çêrandin. Bûyer li vê derê diqewime. Mirdês, odeya Osman Sebrî û fêza pêz wekî mekan derdikevin pêş.

Di tevna çîrokê de cih, bûyer, leheng, vegotin û şêwe bi serkeftî hatine honandin, ev yek jî hostatiya nivîser nîşan dide.

Em çanda Kurdan jî dibînin. Ode, di çanda Kurdan de cihekî girîng e. Cihê ku lê gundî kom dibin, cihê ku mesele lê têne vegotin, cihê ku çanda gelêrî/devkî tê neqilkirin, ev der e.

Di çîrokê de em Osman Sebrî digel gundiyan li odeyê dibinin: "Rojekê dîsa em li odê rûniştî bûn ko xortekî digot: du gurê Osman Sebrî berdaye keriyê Bîdosê (navê gundekî min e) û mihiyek biriye."[326]

**2.8.1.7. Ziman û Şêwe**

---

323 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

324 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

325 Tekin, *h.b.*, r.160.

326 "Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz", r.5.

Zimanê çîrokê zimanekî sade û herikbar e. Zimanê jiyana rojane ye. Ji serî heta dawiyê zimanekî siruştî hatiye bikaranîn. Ziman û mijar li hevûdin tên û baş hatine honandin.

Di tevna çîrokê de şibandinên orîjînal ên hene. Bo nimûne; “Mîna ko serşivan rastî arê cinan were”[327]

Nivîskar lehengên xwe, li gor civat, kultur, perwerde û derûniya wan dane axaftin.

“-Ma ne seyê mezin gur tîniye fêza pêz û arikarêya wî dikiye?”[328]

“-Erê ezbenî haya min ji vê yekê heye.”[329]

“-Mafir ko haya te jê heye, te çima ji min ra ne digot?”[330]

**2.8.1.8. Raman-Tema**

Mijara çîrokê xinizî ye, xinizî bi rêya seyekî xiniz hatiye vegotin. Nivîskar seyên ku bi dilsozî û sedeqetê tên zanîn bereksê vê yekê nîşan daye. Lê di çîrokê de seyek xiniz balê dikişîne.

Nivîskar-vegêr Osman Sebrî di dawiya çîrokê de bi gotinên pêşiyan û ayetan derheqê ramana çîrokê de nivîsiye.

“Ma tu nizanî ko çi canawirê xiniz çêliyên wî jî xiniz dibin.”[331] Û vê gotina xwe bi Sûreya Nûh pesend dike: “Xwedê, li ser erdê çêlikekî jî ji kafiran nehêle. Eger tu bihêlî wê ebdên te ji rê derxin; ji ber ko ji gelekan bê çêliyên kafir ti tiştek çênabe.”[332] Di dawiyê de jî wekî ku bixwaze tevahiyê bûyerê bi gotineke pêşiyan bide dibêje: “Giya li ser koka xwe şîn dibe.”[333]

Bi rastî jî giha li ser koka xwe şîn dibe, eger mirovek nebaş be pirî caran zarokên wî jî nebaş in yanê mirov çi be, çawa be zarokên mirov jî wisa ne.

---

[327] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.5.

[328] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[329] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[330] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[331] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[332] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[333] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

### 2.8.2.Hêmanên Tekînîkî

### 2.8.2.1.Teswîr

Di çîrokê de bangkirina seyê, hatina gur, rûniştina şivanan li çarmedorê pêz xweş hatiye teswîrkirin. Bi teswîran bûyer li ber çavên xwîner tê xêzkirin.

### 2.7.2.2.Diyalog

Di çîrokê de diyalog hene. Nivîskar ji serî heta dawiyê cih daye diyalogan. Bi saya van diyalogan em têkiliya Osman Sebrî ya bi şivanên wî re dibînin. Em ne wekî serekeşîrekî ye ku neheqiyê li kesên derûdora xwe bike. Ew wekî serekeşîrekî bi edalet rûmeta şivanên xwe digire. Herweha zana ye û li pey rastiyê ye. Heta rastî dernekeve meydanê tu heqaretê li şivanên xwe nake. Li ser gotina xwe ye.

Ev diyaloga li jêrê zanetî û hişmendiya wî û dilpakiya şivan nîşan dide.

“-Ezbenî, ev se seyekî ecêb xurt û jêhatiye. Dêla me di van rojan da têye se. Min dil hebû ez carê, duduyan wî berdim ser dêlê û paşê te serwextî çîrokê bikim û heta em wî bikujin”[334]

“-Heke li hêviya ehmeqiya te bimama ji bo tovê seyekî xiniz, dê te hîn gelek pez bidana der. Ma tu nizanî ko çi canawirê xiniz çêliyên wî jî xiniz dibin. Çê ko dêl ji wî nehate se, an na min ew jî dikuşt.”[335]

[334] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

[335] “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, r.7.

### 2.9. NÊÇÎRA HIRÇAN[336]

Nêçîra Hirçan ji rûpelekê pêk tê. Bûyer serpêhatiya lehengê sereke yê çîrokê ye. Mela Elî, nêçîrvanekî ji gundê Xêştûrê ye. Rojekê diçe nêçîra kewan, piştî nêçîrê wextê vegere mal ev bûyer tê serê wî. Ew jî li dîwana axayê Mirdêsan Hecî Ebûzer axa vedibêje. Sebrî vê serpêhatiyê jê guhdar dike, wekî çîrokekê bi ziman û şêweya xwe dinîvîse.

**Kurteya Çîrokê**

Mela Elî rojekê diçe nêçîra kewan. Sê kewan dikuje, di vegerê de li ser kaniyekê rûdinê. Hew dinêre ku hirçekî nêr li pêşiya wî sekiniye. Dibêje heye ev hirç birçî ye û kewên di tûrê xwe de yek bi yek diavêje berê. Lê hirçê nêr kewan yek bi yek dide ber pozê xwe, bêhn dike û diavêje.

Mela Elî zane ku xelasiya ji destê hirçê ne pêkan e, berê tifingê dide sînga hirçê. Pê re borînek bi hirçê dikeve û tifingê ji destê Mela Elî distîne duta dike û diavêje. Heta demekê ew û hirç hevûdin dibin û tînin. Elî, dibîne ku felat jê tune xwe bi mirîkî diavêje erdê. Hirç dibêje ku ev miriye, tê serê, wî bêhn dike: "Dawî ko bawerêya xwe bi mirina min anî, hema di rex min de bi çepolan gorek di nav xîçikan da, veda û ez rakişandim ê. Dîsa bi kevir û xilika ser min por kir. Qey ko bi wê jî dilê wî rihet ne bûbû ko, dixwast zinarekî mezin jî bi ser min de wer ke; de ko ji derketina min bê qisawet bimîne."[337]

Piştî ku hirç diçe, Mela Elî radibe berê xwe dide malê. Nîvê şevê digihîje malê. Birînên xwe dide dermankirin. Sê roj bi şûnde tevî birayê xwe tê ser gora ku hirç wî kiribûyê ji bo tolhildanê. Çend rojan li vê derê digel birayê xwe disekine: "Roja heştan piştî rohelat bi du saetan hirç di gaza çiyê de bi derket û berê xwe de gora min. Tifingên me di dest me de bûn; lê ne wek berê ji bo nêçîra kewan dagirtî, vê carê ji bo kuştina hirçekî nêr."[338]

Hirçê dikujin û postê wî tînin di dîwana Ebûzer Axa de radixin.

---

[336] Osman Sebrî, "Nêçîra Hirçan", *Hawar*, j. 48, 15 Tebax 1942, r.4.

[337] "Nêçîra Hirçan", r.4.

[338] "Nêçîra Hirçan", r.4.

### 2.9.1.Hêmanên Materyal

#### 2.9.1.1. Vegêr

Vegêr, lehengê sereke ye. Lehengê sereke serpêhatiya xwe ji devê kesê yekem (ez/min) neqil dike.

"Di vegerê da ji bo vehêsinê ez li ser kanîkê rawestiyam. Hîn ez nuh rûnişti bûm ko min hirçekî nêr li pêşberî xwe dît.[339]

#### 2.9.1.2. Awayê Nêrînê

Nivîskar-vegêr, di destpêka çîrokê de derheqê çîrokê de hin agahiyan dide û paşê erka vegotinê dide lehengê sereke.

Di bûyera sereke de vegêr serleheng e. Em ji hevokên çîrokê fêm dikin ku bi şêweya "ez"ê hatiye nivîsîn: "Wê rojê ez çûbûm nêçîra kewan û min sê kew kuşti bûn."[340] Lehengê sereke li gor dîtina xwe bûyerê vedibêje.

#### 2.9.1.3. Rêzebûyer

Çîrok ji bûyera sereke û destpêkekê pêk tê. Di destpêkê de vegêr derheqê çîrokê de agahiyan dide. Bûyera sereke bi awayekî têkûz hatiye honandin. Honak basît e, tevlihev nîne û bûyer li gor rêzê hatiye dayîn.

Rojekê Mela Elî diçe nêçîrê, hirçek lê dixe. Ew jî dixwaze tola xwe hilîne. Tevî birayê xwe diçin cihê ku hirç ew kiribû gorê. Li wê derê çend rojan nobetê digirin. Piştî heşt rojan hirç tê û hirçê dikujin. Paşê postê hirçê tînin di dîwana axa de radixin. Mekan û lehengên bûyerê rast in.

#### 2.9.1.4. Leheng

**Mela Elî:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Gundiyekî ji rêzê û nêçîrvan e, çîrok serpêhatiya wî ye. Em ji vê axaftina wî fêm dikin ku mêrekî gir e: "Erê çiqas ko neyarê min hirçekî nêr bû; lê ez bi ged û hêlên xwe jê ne kêmtir bûm. Min jî dest di nava wî ra bir û me hevûdin kut kir. Eger mikûna hirçî hebûya ko min ji xwe bi durxe; teqez wê bi çeplên min bigirta û ez li kûçekî bidama."[341]

---

339 "Nêçîra Hirçan", r.4.

340 "Nêçîra Hirçan", r.4.

341 "Nêçîra Hirçan", r.4.

**Hirç:** Hirçekî nêr e. Derdikeve pêşiya Mela Elî, dixwaze wî bikuje û goştê wî bixwe. Di dawiyê de bi guleyên Mela Elî û yên birayên wî dimire.

Dîwana Hecî Ebûzer Axa û gundî wekî fon hatine bikaranîn.

### 2.9.1.5. Dem

Bûyer, pêşî diqewime paşê tê vegotin û herî dawî jî tê nivîsîn. Diyardeyên demê yên di berhemê de yên wekî "rojekê", "nîvê şeve", "heşt roj in".

Çîrok, bi rojekê dest pê dike: "Wê rojê ez çûbûm nêçîra kewan û min sê kew kuşti bûn."[342].

Leheng nîvê şevê digihîje malê. "Bi nîvê şevê gihame mal û min birînên xwe dane derman kirin û pêçandin. Roja sisiyan ez di Nîvênê de bi derketim û tevlî birayê xwe hatime ser gora ko hirçî ji min ra çêkirî."[343]

Vegêr-leheng, tevî birayê xwe, heşt roj li çiyê li hêviya hatina hirçê dimînin: "Roja heştan piştî rohelat bi du saetan hirç di gaza çiyê de bi derket û berê xwe de gora min."[344]

### 2.9.1.6. Mekan

Bûyer li Xêştûra Mirdêsê diqewime. Osman Sebrî bixwe ji Mirdêsê ye û di bîranîn û çîroka Terşê Şevê de dibêje. "Wê rojê diviyabû ez herim ber bênderên xwe yên gundê Xêştûrê."[345]

Cihê bûyer lê diqewime nêzî kaniyekê ye. Wekî ku vegêr jî neqil dike: "Di vegerê de ji bo vehêsinê ez li ser kanîkê rawestiyam."[346]

### 2.9.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanekî sade û herikbar e. Zimanê çîrokê zimanekî giran nîne, zimanê jiyana rojane ye. "Sed xêra Xwedê ko zora wî li zinêr ne hû û dev ji min berda û çû." Vegêr zimanekî ewqas tebiî bi kar tîne ku em wisa hîs dikin ku li hemberî me gundiyek bi

---

342 "Nêçîra Hirçan", r.4.

343 "Nêçîra Hirçan", r.4.

344 "Nêçîra Hirçan", r.4.

345 "Terşê Şevê", r.6

346 "Nêçîra Hirçan", r.4.

me re diaxive. Di çîrokê de teswîrên xurt û diyalog tune ne. Çend şibandinên orîjînal hene ku ziman û şêweya metnê ji hêla edebî ve xurt dikin.

"Cendekê min herwekî bi mîrkut bête kutan, cihekî rihet tê nema bû."[347]

"Vê carê wek bijîşkê ko dixwaze nexweşiya nexweşê xwe fêr bibe dûr û dirêj cendekê min palmisand û guhê xwe da ser difna min."[348]

### 2.9.1.8. Raman

Ramana çîrokê ya sereke tolhildan e. Lehengê sereke rastî êrîşa hirçekî tê paşê ji bo tolhildanê leheng diçe cihê ku hirç lêdabû û hirçê dikuje. Herweha em di çîrokê de seydvanî û mêrxasiya Mela Elî jî dibînin û radibe bi hirç re gulaşê digire. Di vê çîrokê de "nêçîr", "dîwana axa" çanda Kurdan nîşan didin.

---

[347] "Nêçîra Hirçan", r.4.

[348] "Nêçîra Hirçan", r.4.

### 2.10.MIST-AWIK[349]

Ev çîrok, çîrokeke kurt a li ser lehengiya Mist-Awik e ji rûpelekê pêk tê. Nivîskar di destpêka çîrokê de li ser eşîra Bûcaxan bi dorfirehî agahî dane. Ev agahiyên tarîxî û coxrafî ji çîrokê re bûne bingeh.

**Kurteya Çîrokê**

Eşîra Bûcaxan eşîreke mezin e li dora Sêwregê ye. Li bakur û rojavayê herêmê li quntara çiyê rûdinên. Piştî ku mala Hecî Elî dibin mezinê eşîrê, rîsipî û mezinên eşîrê bi alîkariya vê malê hêdî hêdî ji quntara çiyê dadikevin gundên deştê yên berfireh. Mala Hecî Elî ku dihatine deştê bi piştgiriya eşîra Bûcax cihê lê û gundên derdorê dikin bindestê xwe. Eşîrên herêmê ji ber vê yekê aciz dibin, dibin yek. Di vê navberê de bi navê Mist-Awik rîsipiyekî Bûcêx dadikeve deşta jêrîn û li ber Feratê bi navê Beremaniyê gundekî ava dike. Gundavakirina Mist-Awik di vê demê û wî cihî de bi carekê eşîrên dorê radike ser lingan. Piştî ku di navbera Mist-Awik û gundên dorê de çend şerên biçûk dibin, rojekê ji nişka va, gund û eşîrên dorê, bi qasî çar sed peyayî dicivînin û bi ser Beremaniyê de digirin.

Di gundê nû de Mist-Awik û çar xulam hene. Mist-Awik li ser vê êrîşa bêzeman xulaman dike hewşê derî di ser xwe de digire. Xulam jê re tifinga dadigirin û ew jî guleyan di ser dijmin re dibarîne. Neyar dike nake nikare Mist-Awik bigire. Li ser vê agir bi hewşê ve datîne. Mist-Awik xwe nade destê neyar û dişewite. Paşê neyar di nav şewatê de li hestiyên Mist-Awik digerin.

#### 2.10.1.Hêmanên Materyal

#### 2.10.1.1 Vegêr:

Vegêrê çîrokê nivîskar e, bi şêweya kesê sêyem “ew” bûyerê neqil dike. **“**Di gundê nû da ji Mist-Awik û çar xulaman pê va, kes tine bû. Li pêş vê tevdîra neyar a bê eman, Mist Awik tevî xulamên xwe, derê hewşê li ser xwe; dada û di xênî da asê bû.”[350]

---

[349] Osman Sebrî, “Mist-Awik”, *Ronahî*, j. 12, 1 Adar 1943, r.21.

[350] “Mist-Awik”, r.21.

### 2.10.1.2. Awayê Nêrînê:

Vegêrê çîrokê “ew” e. Xwîner bûyerê, tevgerên leheng û neyar bi çavên vegêrê sêyem dibîne.

Ev çîrok ji aliyê nêrînê ve dişibe çîroka Halide Edip Adıvar a bi navê “Himmet Çocuk”[351]. Di çîrokê de em hemû tiştî bi dîtina vegêr-nivîskar dibînin, her tişt bi realîteyekê hatiye teswîrkirin.[352] Em “Mist-Awik”, bi çavên vegêr dibînin û ew jî leheng di nav çanda eşîrî, tarîx û cografyayê de teswîr dike. Vegêr wextê leheng teswîr dike ji realîzmê dûr nakeve wekî Omer Seyfettin “Başını Vermeyen Şehid” lewre “lehengê vê çîrokê wekî lehengekî xwedî hêzek menewî ne û dişibin lehengên destanan.”[353] Jixwe mijara vê çîrokê jî ji Tarîxa Peçewî hatiye wergirtin.

### 2.10.1.3. Rêzebûyer

Nivîskar di destpêkê de wekî ji berhemeke tarîxî agahiyan bide, li ser eşîra Bûcax bi dorfirehî agahî dane. Ev beşa destpêkê ne wekî beşek ji çîrokê, wekî beşek serbixwe xuya dike. Ji ber vê yekê tevna çîrokê xurt nîne.

Piştî vê beşa destpêkê avakirina gundê Beremaniyê dû re jî şerê di navbera Mist-Awik û neyar de hatiye dayîn. Destpêka şer û encam bi hevûdin ve bi awayekî baş hatine girêdan. Pêşî sedem, paşê encam hatiye dayîn. Bûyer wekî xelekên zincîrekê bi hevûdin ve hatine girêdan.

Mist-Awik dixwaze gundekî ava bike, lê axa ku li ser gund ava dike li tenişta Çemê Feratê ye. Çavên hemû eşîrên li derûdorê li vê axê ye. Ji ber vê dibin yek di carêkê de di ser gundê Mist-Awik da digirin. Mist-Awik digel çar xulaman li gund e, dikin û nakin nikarin wî bigirin. Ji şevê heta sibê şer dikin, nikarin Mist-Awik bigirin, hemû esker dimirin li ser vê ew jî agir bi dorbera mala Mist-Awik ve datînin. Mist-Awik xwe nade destê neyarê xwe û dişewite.

---

[351] Kaplan, h.b., r.95.

[352] Kaplan, h.b., r.95.

[353] Kaplan, h.b. r.79-80.

### 2.10.1.4. Leheng

**Mist-Awik**: Lehengê sereke yê çîrokê ye. Ji Eşîra Bûcax e. Ji quntara çiya tê deştê û gundek bi navê Beremaniyê ava dike. Di çîrokê de ji bo Mist Awik "Bi qasî ko Mist-Awik mêrekî çê bû; ewçend jî nîşandarekî xedar bû. Bi wê nîşandariyê bû ko kes, ji erişvaniyan negihandi bû xwe."[354] Ji vê hevokê em serwext dibin ku lehengê sereke mirovek baş û şervanekî xurt e. Neyar tevî çar sed peyayî ve di ser gundê wî de digirin ew tevî çar xulaman xwe nade destê neyar û şer dike.

Vegêr-nivîskar ji bo vê dilêriya Mist-Awik nîşan bide di dawiya çîrokê de leheng bi neyar re dide axaftin.

"-Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te nakujin; lê emê te hêsîr bigirin."[355]

"Mist-Awik bi dengekî box li wan vegerand û got: Ma ji we ra ne şerm e ko hon vê reya teres didin ber min!. Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî îro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî sernizmiya dîliyê ne dijwar e..."[356]

Mist-Awik, xwe nade destê neyar û di nav agir de dişewite.

Xulam, neyar, eşîr wekî fon karakter hatine bikaranîn.

### 2.10.1.5. Dem

Nivîskar di destpêka çîrokê de li ser Eşîra Bûcax agahî dane, lê tarîx nedaye. Eşîra Bûcaxan eşîreke mezin e li dora Sêwregê ye. Bûyer berî dused salan qewimiye, nivîskar-vegêr ev bihistiye û nivîsiye. Di çîrokê de hêmanên demê bi peywên wekî "rojekê", "wê rojê", "şev ronî bû" derdikevin pêş. "Rojekê di nişka va, gund û eşîrên dorê, biqasî çar sed peyayî civandibûn û bi ser Beremaniyê de girtibûn."[357]

"Wê rojê heya êvarê û bi şev jî heya sibê êrişên neyaran li pê hev bi ser Mist-Awik de diçûn."[358]

---

354 "Mist-Awik", r.21.

355 "Mist-Awik", r.21.

356 "Mist-Awik", r.21.

357 "Mist-Awik", r.21.

358 "Mist-Awik", r.21

“Dema şev ronî bû û tîrijên royê xwe berdane ser xaniyê Mist-Awik, mîna ko keriyek pezê reş li dora xêni mexel be, cendekên êrişvaniyên neyaran welê deverû ramediya bûn.”[359]

Bûyer rojekê dest pê dike, dotira rojê bi şewitandina Mist-Awik diqede.

### 2.10.1.6. Mekan

Bûyer li gundê Beremeniyê diqewime ku ji aliyê Mist-Awik ve hatiye avakirin. Li gund ji bilî Mist-Awik û çar xulamên wî tu kes tune ye.

Şer li dora xaniyê Mist-Awik gur dibe. Neyar agir diavêjin goma pêz û xanî. Mist-Awikê teslîmî neyar nabe di xanî de dişewite.

Mekanê lê bûyer qewimiye û bûyer li hevûdin tên, lewre gundê ku Mist-Awik ava kiriye li keraxê Çemê Feratê cihekî avî û xweş e. Çavên eşîrên derûdorê lê ye: “Di vî deraxî da bû ko bi navê Mist-Awik rîspiyekî Bûcêx daketibû deşta jêrîn û di ber Ferêt da bi navê Beremaniyê gundek ava kiribû. Gund avakirina Mist-Awik di vê demê û wî cihî da bi carekê eşîrên dorê rakiribûn ser lingan.”[360]

### 2.10.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê zimanê nivîskar-vegêr e. Zimanekî herikbar û zelal e. Vegêr ji bo mêranî, mêrxasî û wêrekiya lehengê sereke û nemerdiya dijmin nîşan bide cih daye diyalogan jî û ev diyalog jî li bûyer û lehengên çîrokê tên. Em dikarin bibêjin ku piştî agahiyên berfireh bûyer bi awayekî herikbar bi rengekî edebî hatiye vegêran.

“-Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te nakujin; lê emê te hêsîr bigirin.”[361]

“Mist-Awik bi dengekî box li wan vegerand û got: Ma ji we ra ne şerm e ko hon vê reya teres didin ber min!. Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî îro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî sernizmiya dîliyê ne dijwar e...”[362]

Bi vê diyalogê va em mêranî, mêrxasî, jîrî û jêhatîbûna Mist-Awik dibînin. Mist-Awik civaka Kurdan temsîl dike. Ev gotinên wî nîşan didin ku bi tu awayî sernizimiyê qebûl nake û mirinê ji serîdanînê çêtir dibîne.

---

[359] “Mist-Awik”, r.21

[360] “Mist-Awik”, r.21.

[361] “Mist-Awik”, r.21

[362] “Mist-Awik”, r.21

Di nav çîrokê de şibandin kêm bin jî hene û edebî ne. Dijminê ku li dor malê mirî ne dişibîne keriyek pezê reş ku li dor malê mexel ketine û xwe jî dişibîne şêrekî dora wî hatiye girtin.

“Dema şev ronî bû û tîrijên royê xwe berdane ser xaniyê Mist-Awik, mîna ko keriyek pezê reş li dora xêni mexel be, cendekên êrişvaniyên neyaran welê deverû ramediya bûn.”[363]

“Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî îro bigirin?”[364]

Herweha raveka hevalnavî ya “gurê qol” jî orjînal e. Ev şibandin û ravek xurtiya zimanê çîrokê nîşan didin.

**2.10.1.8. Raman-Tema**

Mijara çîrokê şervanî, dîlgirtin û azadî ye. Mist-Awik şervanekî xedar, nîşangirekî jîr û jêhatî ye. Herweha ji bo nebe bindestê neyar bi neyar re şerê man û nemanê dike û di encamê de di nav agir de dişewite.

Vegêr xwestiye şervaniya Kurdan nîşan bide. Mist-Awikê lehengê sereke yê çîrokê bi şervanî, dilêrî û mêraniya xwe derdikeve pêş, civaka Kurdan temsîl dike.

Di nav eşîrên Kurdan de ji bo cih û desthilatdariyê car caran şer derketiye, ev bûyer jî di atmosfereke wiha de qewimiye.

Vegêr ji bo dilêrî û şervaniya Mist-Awik baştir nîşan bide di dawiya çîrokê de cih daye vê diyalogê:

“-Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te nakujin; lê emê te hêsîr bigirin.”[365]

“Mist-Awik bi dengekî box li wan vegerand û got: Ma ji we ra ne şerm e ko hon vê rêya teres didin ber min! Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî îro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî sernizmiya dîliyê ne dijwar e...”[366]

---

363 “Mist-Awik”, r.21

364 “Mist-Awik”, r.21

365 “Mist-Awik”, r.21.

366 “Mist-Awik”, r.21.

"Lê sed mixabin ko gaziya Bûcêx di demê de negihîşte Beremaniyê û paşê di nav şewatê de li hestiyên Mist-Awik digerin."[367]

Mist-Awik xwe nade destê neyar û di nav agir de dişewite. Bi vê tevgera xwe dibêje ku mirin ji dîlîtiyê çêtir e.

**2.10.2. Hêmanên Teknîkî**

**2.10.2.1.Teswîr**

Herçiqas Mist-Awik çîrokeke kurt be jî di navê de teswîr heye. Teswîr, hunera vegotinê û bikaranîna zimanê vegêr nîşan dide.

"Dema şev ronî bû û tîrijên royê xwe berdane ser xaniyê Mist-Awik, mîna ko keriyek pezê reş li dora xêni mexel be, cendekên êrişvaniyên neyaran welê deverû ramediya bûn."[368]

**2.10.2.2. Diyalog**

Di dawiya çîrokê de diyalogeke kurt heye. Lehengê sereke û neyar diaxivin.

"- Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te nakujin; lê emê te hêsîr bigirin."[369]

"Mist-Awik bi dengekî box li wan vegerand û got: Ma ji we ra ne şerm e ko hon vê reya teres didin ber min!. Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî îro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî sernizmiya dîliyê ne dijwar e..."[370]

[367] "Mist-Awik", r.21.

[368] "Mist-Awik", r.21.

[369] "Mist-Awik", r.21.

[370] "Mist-Awik", r.21.

## 2.11.ŞÊREK BI DAREKÎ[371]

Çîrokek kurt e, wekî çîrokên din ên Osman Sebrî di destpêka vê çîrokê de jî derbarê herêma Kurdan de agahî daye, paşê Kurd şibandiye şeran. Heta ev ramana xwe bi gotineke pêşiyan pesend û rave kiriye: **"**Serê du beranan di beroşekê da nakele, Kurd û şêr jî di erdekî da najîn."[372]

Herweha di dawiya çîrokê de jî bi paragrafeke dirêj mijara çîrokê hatiye ravekirin.

**Kurteya Çîrokê**

Di dema Bedir-Xan Beg de şêrek rêya xwe şaş dike û tê dora Cizîrê. Du sê caran pez û dewaran dikuje. Bedir-Xan Beg bi vê yekê dihese birek siwaran digire û derdikeve rawa şêr. Lê şêr dernakeve pêşiya wan. Li ser vê Bedir-Xan Beg delalan dide bang kirin dibêje yê ku şêr bikuje wê bê perûkirin.

Rojekê koçerekî garisî ji bo peydakirina mecîhdiyekî (ku bide Mîr) tê Cizîrê. Di dest de darekî zexm heye. Şêr derdikeve pêşiya koçer. Koçer bêyî dudilî dar li nav çavên şêr dixe. Şêr dimire. Lê mêrikê koçer ditirse dibêje dibe ku ev dirinde seyê Mîr be û ji bo nekeve destê peyayên Mîr bîstekê ji wê herêmê dûr dikeve.

Li pey koçer botiyekî şareza ji herêmê derbas dibe. Gava şêr bêcan li erdê dibîne hema devê tifinga xwe dide ber goyê şêr, paşê cendekê şêr li kerê dike û tê Birca Belek.

Xulam xeberê didin Mîr. Lê Mîr wextê guh dide mêrikê botî û bala xwe dide cendekê şêr fêm dike ku wî ev şêr nekuştiye.

Di vê navberê de mêrikê koçer çîroka xwe ji yekî dikançî re dibêje. Dikançî fêm dike ku yê ku şêr kuştî ye ev koçer e jê re dibêje zû rabe here hafa Mîr. Mêrikê koçer tê Birca Belek. Xulamên Mîr xeberê didin Mîr. Mêrikê Koçer zûka derdixin pêş Mîr. Mîr jêre dibêje:

---

[371] Osman Sebrî, "Şêrek Bi Darekî", *Ronahî*, j. 14, 1 Gulan 1943, r.8-9.

[372] "Şêrek Bi Darekî", r.8.

"Mîr: Kuro te ev şêr kuşt?"[373]

"Koçer: Ezbenî eger ne ev birîna li serî bûya, min ê bigota erê min kuşt."[374]

"Mîr: De bêje, ka te çawan kuşt?"[375]

"Koçer: Ezbenî, herwekî tu şêr bi û ez jî ez bim, gava xwast xwe bavêje ser min, min darê xwe holê rakir û di nav çavê wî de lê da (hingê eger xulaman destê koçer ne girti bûna, ne dur bû ko di nav çavê mîr de ji danîna)."[376]

Bedir-Xan Beg dixwaze koçer perû bike lê koçer dibêje bi saya serê Mîr tu kêmasiyeke me nîne. Mîr dîsa jî emir dide xulaman ku koçer bibin sûkê ji wî û zarokên wî re cil û bergan, ji şexsê wî re jî şûr û tifingeke zîv bistînin.

**2.11.1.Hêmanên Materyal**

**2.11.1.1. Vegêr**

Osman Sebrî vê bûyerê ji Şêxê Garisî guhdar dike lê bi ziman, şêwe û honakeke nû ve bi zimanê şexsê sêyem vedibêje.

"Di dema Bedir-Xan begî da şêrekî riya xwe saş kiribû û hatibû dora Cizîrê. Du-sê caran li ser riyan pez û dewar kuşti bû."[377]

Vegêr-wekî temaşevanekî bûyerê bi realîzmeke xurt ve vedibêje. Midaxaleyî lehengan nake.

**2.11.1.2.Awayê Nêrînê**

Vegêrê çîrokê "ew" e. Xwîner bûyerê, tevgerên leheng û neyar bi çavê kesê sêyem neqil dike. Vegêr wekî îlahekî nakeve hiş û dilê lehengên xwe hemû tevger û hîsên wan ranagihîne xwîner. Bi tevger û diyalogan hîsên wan dide der û dide nasîn.

**2.11.1.3. Rêzebûyer**

Eger em agahiyên ser û binê çîrokê hatine dayîn bidin aliyekê, çîroksaziyeke têkûz û zexm derdikeve meydanê. Bûyer wiha diqewime:

---

[373] "Şêrek Bi Darekî", r.9.

[374] "Şêrek Bi Darekî", r.9.

[375] "Şêrek Bi Darekî", r.9.

[376] "Şêrek Bi Darekî", r.9.

[377] "Şêrek Bi Darekî", r.8.

1.Rojekê şêrek riya xwe şaş dike û tê Cizîrê.

2.Bedirxan Beg digel birek siwaran ji bo kuştina şêr derdikeve nêçîra şêr lê nikarin şêr bigirin.

3.Rojekê koçerek tê Cizîrê û şêr derdikeve pêşiyê. Koçer bi darê dest xwe ve şêr dikuje.

4. Koçer ditirse ku şêrê ku kuşt seyê mîr be û xwe ji cihê lê bûyer qewimî dide alî.

5.Serpêhatiya xwe ji dikandarekî re dibêje ku haya wî ji hatina şêr heye û dizane kesê ku şêr bikuje wê were perûkirin.

6.Dikandar ji koçer re behsa rastiya bûyerê dike û koçer dişîne cem mîr.

Di vê navberê de botiyekî şareza termê şêr ê kuştî dibîne û diçe cem mîr dêbêje ku wî ev şêr kuştiye lê mîr bûyerê baş dinirxîne û fêm dike botî derewan dike.

7. Rastî derdikeve holê, mîr dixwaze koçer perû bike, koçer tiştekî qebûl nake û çîrok bi encam dibe.

Tevna çîrokê xurt e, hemû bûyer li gor sedem-encamê bi hevûdin re hatine girêdan.

#### 2.11.1.4. Leheng

**Koçer:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Koçerekî Garisî ye. Ji diyaloga wî ya bi Mîr re em fêm dikin ku mirovekî wêrek, camêr û çavtêr e. Ewqas wêrek û biqewet e ku şêrekî bi darekî ve dikuje. Herweha rastgo û mêrxas e.

Nivîskar navê koçer eşkere nekiriye, bi navekî gelemperî ku civaka koçeran temsîl dike, lehengê xwe derxistiye pêş.

Nivîskar ji bo nîşandana mêrxasî û wêrekiya koçer, mêrikê botî derdixe pêş ku ew jî derewkar e.

**Mîr:** Bedir Xan Beg di serdema Osmaniyan de li Cizîra Botan jiyaye. Wekî Mîrê Cîzîra Botan tê zanîn. Mîrekî camêr û hêzdar e. Li Birca Belek dimîne, xulamên wî hene.

Dixwaze şêr bikuje lê şêr dernakeve pêşiyê, paşê gundiyek dibêje min kuştiye lê biaqil e û zû naxape, gundî guhdar dike tê derdixe ku kesê şêr kuştiye ne ew e. Heta rastî eşkere dibe, bi telalê xwe dide bangkirin. Yê ku şêr kuştiye jî perû dike.

Mîr û koçer her du lehengên erênî ne. Di çîrokê de lehengê dijraber botî ye.

**Botî:** Yê ku şêrê mir dibîne û diçe hizûra mîr dibêje ku wî ev şêr kuştiye. Derewkar e.

Botiyek, telal, xulam û dikandar wekî karekterên fonê derdikevin pêş.

### 2.11.1.5. Dem

Dem, serdema Bedir Xan Beg e. Bedirxan Beg di sedsala 19ê de li Cizîra Botan jiyaye. Di destpêka çîrokê de dem **"**Di dema Bedir-Xan Begî de şêrekî rêya xwe saş kiribû û hatibû dora Cizîrê."[378]

Wekî din diyardeyên demê ên wekî "wê rojê, demek şûnda" di nav çîrokê de hene.

"Wê rojê, ji bo peydakirina mecîdiyekî (dayîna mir) koçerekî garisî dihat Cizîrê."[379]

Di tevna çîrokê de dem, cih, leheng, bûyer bi ziman û şêweyeke edebî bi honekeke xurt cih digirin.

Bûyer di serdema Bedirxan Begî de qewimiye, di nav çîrokê de qala serdemê, rewşa gundî û koçeran, peywendiya gundî û beg jî hatiye nîşandan.

### 2.11.1.6. Mekan

Mekanê lê bûyer diqewime, ango sahneya bûyerê Cizîr e. Ji bilî vê, Birca Belek a ku Bedir-Xan Beg lê dimîne, derdikeve pêş.

**"**Di dema Bedir-Xan Begî de şêrekî rêya xwe saş kiribû û hatibû dora Cizîrê."[380]

---

[378] "Şêrek Bi Darekî", r.8.

[379] "Şêrek Bi Darekî", r.8.

[380] "Şêrek Bi Darekî", r.8.

“Di pê koçer ra, botiyekî şareza di wî cih ra derbas dibe. Gava şêr bêcan li erdê ramediyayî dibîne, devê tifinga xwe dide bin guhê şêrê bêcan û dileqîne. Paşê cendekê şêr di ker dike û dibe Birca-belek nik mîr.”[381]

Dem, mekan û bûyer li hevûdin tên, baş hatine honandin.

**2.11.1.7. Ziman û Şêwe**

Ziman, zimanê nivîskar-vegêr e, herweha di dewama çîrokê de lehengê çîrokê jî daye axaftin. Axaftina Mîr û koçer jî li gor ast, kultur û jiyana wan a rojane ye.

“Mîr: Erê camêr te ev şêra kuştiye. De bêje, ka çi dixwazî ez bidime te.”[382]

“Koçer: Ezbenî, bi saya serê mîr tiştekî min kêm tine. Bi tenê ez hewceyî mecîhdiyekî me, ko ew jî ji bo berevkerê dayîna mîr e.”[383]

“Mîr: Koçerê min, ji îro bi şûn de nema berevker dayinê ji te distîne Ji vê pê ve tu çi dixwazî?”[384]

“Koçer: Mîrim, min tifing heye, min pez û dewar heye û zad û xwarina min jî heye; ji van pêva ji min tiştek navê.”[385]

Ev axaftin rengekî siruştî daye çîrokê. Bi vê axaftinê em mîr û koçer jî dinasin.

Ev diyalog rewşa civaka Kurdan ya wê serdemê nîşan dide. Li gor ku em ji çîroksaziyê hîn dibin mîr ne ew kes e ku xwîna civaka xwe bimije û çi di destê wan de heye ji wan distîne, bereksê vê ew rûmeta civaka xwe digire, alîkarî dide wan.

**2.11.1.8. Raman-Tema**

Mijara çîrokê mêrxasî, mêranî û dilnizmî ye. Nivîskar di destpêk û encama çîrokê de bi kurteagahî, gotinên pêşiyan ve ramana çîrokê vegotiye û rave kiriye. Derfet nedaya xwîner li ser bifikire ku vegêr xwestiye bi vê çîrokê ji xwînerên xwe re çi bibêje.

---

381 “Şêrek Bi Darekî”, r.8.

382 “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

383 “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

384 “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

385 “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

Nivîskar di destpêkê de dibêje: “Di vê çîrokê de ji mêraniyê pirtir nefsiyeta Kurdan bi ser û berê xwe va xweya dike.”[386] Di encamê de jî behsa mêranî, mêrxasiya Kurdan dike ji xwe di çîrokê de jî koçer ne wekî şexsekî wekî sembola civaka Kurdan bi kar aniye.

Wextê em bala xwe didin erdnîgariya Kurdan, em serwext dibin ku deşt û çiya zêde ne. Kurd bi heywandariyê re mijûl in ku koçerî jî encameke vê yekê ye. Lewre qedera însana bi erdnîgariyê re girêdayiye. Kurdên ku bi heywandariyê re mijûl bûne bi mecbûrî havînê heywanên xwe birine zozanên bilind û payîza dereng jî ji zozanan dageriyane aranan.

> “Ji vê çîroka han qenc xweya dike ko rûyê Kurdan ji xwastinê pir diêşe. Ji vê pêva, mêrê Kurd çi mêraniyeke mezin bike, pê dilgir nabe. Çima ko kirina tu tiştî ji mêran ra ecêb nayête ditin. Mafir ko di nav Kurdan de ji bo mêran û mêraniyê ev raman heye, “tûya ko mêr nikarin nîn e” li her tişt û kirin wek-xwe dixweye. Bila ji vê gotina min neyête zanîn ko Kurd heqê mêraniyê nizanin. Di vî warî de ramana Kurdan jî hîkmetê ne dûr e. Mafir ko mêr e; bi her tiştî dikare. Herwekî comerdî jî şahan ra nabe pesin; çima ko şah ne comerd (çikos) nabin. Kurd jî welê bê mêranî nabin. Li nav gel û miletên din ji bo mêraniyek holê şiîr û kilêban dinivîsin; lê me Kurdan; Eger ne şêxê Garisî bûna, ev çîrok jî wenda dibû.”[387]

Di nav Kurdan de Beg hebûne, Bedirxan Beg jî ji wan yek e. Beg ne bi taybetiyên neyînî bi camêrî, qehremanî, zanebûna xwe derdikevin pêş. Herweha nivîskar li ser taybetiyên şahan jî sekiniye gotiye divê şah zana, comerd, bihêz in. Gotiye mêr dikarin her tiştî bikin qesda wî ji mêr (ne wekî cinsiyet, bo însanên jîr û jêhatî) tiştek tune ye ku nikaribin bikin. Însanekî/e jîr, jêhatî rast bi xebat û lebata xwe çi bixwaze dikare pêk bîne.

Comerdî yek ji taybetiyên şahan ên siruştî ye, şah bi comerdî, camêrî dilêriya xwe dibe şah. Mirovek çikûs nikare bibe şah, ji ber vê yekê dibêjin “comerdî jî ji şahan ra nabe pesin”.

Perûkirin di çanda Kurdan de heye. Di vê çîrokê de em dibînin ku Bedirxan Beg bi telalan dide bankirin “yê ku şêr bikuje wê bê perûkirin.” Paşê yê ku şêr dikuje perû dike.

---

[386] “Şêrek Bi Darekî”, r.8.

[387] “Şêrek Bi Darekî”, r.9

Mîr dixwaze koçer perû bike lê koçer çavtêr e û tu tiştî qebûl nake, rûmeta Mîrê xwe digire…

Herî dawî em dikarin bibêjin ku ev çîrok li ser şerê rastî-derawan hatiye nivîsîn. Nivîskar rastî, camêrî, hêz û qeyremaniya koçerekî û derew û qelsiya botiyekî dide ber hev. Leheng nikarin ji binê vî şerî derkevin, di vê navberê de Mîr derdikeve meydanê bi zanetî û maqûliya xwe pirsgirêkê çareser dike.

**2.11.2. Hêmanên Teknîkî**

**2.11.2.1.Diyalog**

Di çîrokê de diyalog hene. Axaftina di navbera koçer û Mîr de rengekî siruştî daye çîrokê û çîrok herikbartir kiriye.

“Mîr: Kuro te ev şêr kuşt?”[388]

“Koçer: Ezbenî eger ne ev birîna li serî bûya, min ê bigota erê min kuşt.”[389]

“Mîr: De bêje, ka te çawan kuşt?”[390]

“Koçer: Ezbenî, herwekî tu şêr bi û ez jî ez bim, gava xwast xwe bavêje ser min, min darê xwe holê rakir û di nav çavê wî de lê da (hingê eger xulaman destê koçer ne girti bûna, ne dur bû ko di nav çavê mîr de jî danîna).”[391]

---

[388] “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

[389] “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

[390] “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

[391] “Şêrek Bi Darekî”, r.9.

### 2.12. WARÊ MIN NE Î KOR E[392]

Çîrokeke zaf kurt e, ji rûpelek pêk tê. Navê çîrokê bûye neynika naveroka berhemê. War ji bo "law, kur" hatiye bikaranîn ku yê ku navê bav radike kur e. "Warê kor", ji bo zarokên ku tu awayî bi kêrî malbat û welatê xwe nayên tê bikaranîn.

**Kurteya Çîrokê**

Rojekê Mistefa ji bo derbasbûna Feratê li keştiyê siwar dibe, di keştiyê de rastê neyarê xwe Seyîd Weqas tê. Mistefa û Seyîd Weqas li hevûdin re çekan dikişînin lê guleya ji çekê Seyîd Weqas derdikeve digihîje pêsîra Mistefa û li wê derê dimire.

Seyîd Weqas çêm derbas dike xwe digihîne malê. Qadir Axa jî tê cendekê lawê xwe dibe malê. Dost û nasên wî hemû tên serxweşiya wî. Seyîd Weqasê ku bi mêraniya Qadir Axa dizane, dizane ku rêya revê jê re tune ye û ji ber vê yekê berê xwe dide mala Qadir Axa. Xulam li dora malê Seyîd Weqas dibînin, xeberê didin Qadir Axa û kurê wî Hemê. Bav û law radibin ber bi Qadir Axa ve diçin, lê kur ji bo bavê, bav ji bo kurê ditirse ku Seyîd Weqas bikuje. Qadir axa di dilê xwe de dibêje: "Hemo î serhişk e, heye ko gotinine sar bide rûyê Seyîd Weqas, an tiştinê lêde. Hemo jî dizanî ko Qadir Axa bi mihrivaniya bavitiyê dexaleta xwiniyê kurê xwe qebûl neke û bi wê yekê navê camêrî û dilgirsiyê li ser mala Ûsiv axa rake."[393]

Di navbera qesra odeyê û malê de bav û kur rastî hev tên. Ji devê her duyan bi hev re ev gotin derdikevin:

"-Ev e Seyîd Weqas têye û xwe diavêje mala me. Divê em tê biborin."[394]

Piştî Qadir Axa van gotinan dibihîse, hêsir ji çavan dibarin. Hemê dibêje:

"-Bavo! ma evçend ji te ra giran e ko tu di xwîna kurekî xwe bibuhurî? Ma ji bo vê digirî?"[395]

Qadir Axa dibêje efûkirin ne zor e ya ku ez hestewar kirim; mêranî û camêrêya lawê min e.

---

392 Osman Sebrî, "Warê Min Ne î Kor e", *Hawar*, j. 51, 15 Çiriya Paşîn 1942, r.5.

393 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

394 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

395 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

"-Na Hemo, di buhurîna xwîna kurekî ji min ra ne ewçend dijwar e. Lê gava min tu li ser vê reya camêrî dîtî ji kêfxweşiyan ev hêsir bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşiya min ev e ko, min zaniye warê min ne î kor e…"[396]

### 2.12.1.Hêmanên Materyal

#### 2.12.1.1. Vegêr

Vegêrê çîrokê nivîskar e, çîrokê bi devê kesê sêyem vedibêje. "Seyid Weqas jî, berî ko gazî bi ser gihê li Ferêt derbas dibe û diçe mala xwe."[397]

#### 2.12.1.2. Awayê Nêrînê

Vegêr bi çavê kesê sêyem bûyerê vedibêje. Vegêr berî neqilkirina bûyerê derbarê eşîra Bêzikan de bi dorfirehî agahiyan dide.

"Di Kurdistana roava û wilayeta Meletiyê da eşîra Bêzikan heye. Nivê vê eşîrê yê pirtir li nîvroyê Ferêt di wilayeta Rihayê da dimîne ko je ra Bêzikê Omaxacê dibêjin. Ji her ko Ferêt ev esir kiriye du cihan, malmezinên her du cihan cuda ne. Pir caran neyarî jî di navbera van malmezinan da çêdibe."[398]

Vegêr wekî şahide bûyerê her tiştî neqil dike. Dikeve hişê lehengên xwe û fikrên wan ji xwîner re radigihîne: "Qadir axa di dilê xwe da digot, Hemo î serhişk e, heye ko gotinine sar bide rûyê Seyid Weqas, an tiştinê lêde. Hemo jî dizanî ko Qadir axa bi mihrivaniya bavitiyê dexaleta xwiniyê kurê xwe qebûl neke û bi wê yekê navê camêrî û dilgirsiyê li ser mala Ûsiv axa rake."[399] Em ji vê fêm dikin ku vegêr çi di dilê lehengên wî re derbas dibin wekî îlahekî dizane û ji xwîneran re vedibêje.

#### 2.12.1.3. Rêzebûyer

Vegêr wekî çîrokên din ên ravekirî, di destpêka vê çîrokê de jî ramana çîrokê vegotiye. Herweha li ser milên êşîra Bêzikê; Bêzikê Jorîn û Bêzikê Omacaxê agahî dane. Dû re Qadir Axa û lawê wî Hemê, Emer û Mistefa daye nasîn û behsa mêraniya Hemê kiriye.

---

396 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

397 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

398 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

399 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

Çîrok, bi hevoka “Rojekê Mistefa ji bo derbazbûna Ferêt diçe ser gemiyê û li wê derê rastê Seyîd Weqas tê, ko ew jî ji malmezinên Bêzikê Omaxacê ye”[400] dest pê dike. Bûyerên dû re hemû girêdayî hevûdin e. Li gor sedem û encamê bi hevûdin ve hatine girêdan. Lê çîrok ji nişka va encam daye. Wekî ku hê berdewamiya wê hebe lê vegêr ew ne gotibe, xuya dike.

Ji ber ku “dinya vegêranê ji dinya rasteqîn sînordartir e, ji dinya rastîn biçûktir e”[401] her metn mecbûr e ku sînorên xwe xêz bike. Ji ber vê yekê nivîskarê çîroka kurt heta dikare “hûrgiliyên ku tu wezîfeya wan tune nade, ji tiştê hewceyî zêdetir tu tiştî venabêje.”[402]

Di vê çîrokê de vegêr-nivîskar girêka çîrokê bo xwîneran hiştiye. Xwîner bi xwendinê fêm dikin ku ne Hemê ne jî Qadir Axa xwîniyê nekuştine, her duyan jî ew efû kiriye.

Di çîrokê de ûnsûra “meraq”ê heye. Xwîner bi meraq çîrokê dixwînin.

#### 2.12.1.4. Leheng

**Hemê Qadir Axa:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Di destpêka çîrokê de vegêr behsa wî dike, dibêje: “Vê paşiyê di vê malbatê de bi navê Hemê Qadir axa mêrek rabû bû ko di wî welatî de rû bi mêran va ne hişti bû.”[403]

Hemê bi mêraniya xwe di nav eşîrên dorê de bi nav û deng bûye. Ewqas ditirse ku bavê wî xwîniyê wan bikuje û navê camêrî û dilgirsiyê ji ser mala Ûsiv Axa rabike.

Neyar jê ditirse nizane ku çi bike. Lê ji ber ku bi mêraniya wî dizane tê efûkirina xwe jê dixwaze. “Lê çiqas ko Seyid Weqasê çû bû mal jî ji tirsa Hemê xew ne ketibû çavan û ji mala xwe jî bazdabû. Mêraniya Hemê ewçend deng dabû ko Seyid Weqas rêya revê jî şaş kiri bû. Piştî çar rojan Seyid Weqas ji xwe bê hêvî bû û

---

400 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

401 Umberto Eco, *Anlatı Ormanlarında Altı Gezinti*, (Wer. Kemal Atakay) Weş. Can, İstanul 1995, r.98.

402 Yıldız, *h.b.*,101.

403 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

berê xwe da mala Qadir axa xewinî. Kesek bi xwe re ne anî bû, ko ev şarta xwe avêtinê bû.”[404]

**Qadir Axa:** Bi navê Hemê, Emer, Mistefa sê kurên wî hene. Kurê wî yê biçûk Mistefa tê kuştin. Lê xwîniyê kurê xwe efû dike.

Hemêyê navdar kurê wî ye. Di dawiya çîrokê de bi tevgera kurê xwe digirî, şad dibe dibêje “warê min ne î kor e”.

**Seyid Weqas:** Ji milê Bêzikê Omacaxê ye. Di navbera vî milî û milê Bêzikê Jorîn de neyarî heye. Kurê Qadir Axa yê biçûk Mistefa dikuje, paşê ji tirsa nizane çi bike tê lêborîna xwe dixwaze. Hemê wî efû dike.

Dost û nas, eşîr wekî fon hatine bikaranîn

**2.12.1.5. Dem**

Bûyer rojekê dest pê dike. **“**Rojekê Mistefa ji bo derbazbûna Ferêt diçe ser gemiyê û li wê derê rastê Seyîd Weqas tê, ko ew jî ji malmezinên Bêzikê Omaxacê ye.”[405]

Piştî kuştina Mistefa Seyîd Weqas diçe malê çar roj derbas dibin. Roja pêncan tê lêbuhurîna xwe dixwaze.

**2.12.1.6. Mekan**

Vegêr di destpêka çîrokê de derheqê cih de agahî dane. Bûyer di nav du milên neyar ên Eşîra Bêzikan de diqewime. **“**Di Kurdistana roava û wilayeta Meletiyê da eşîra Bêzikan heye. Nîvê vê eşîrê yê pirtir li nîvroyê Ferêt di wilayeta Rihayê da dimîne ko je ra Bêzikê Omaxacê dibêjin. Mala Ûsiv axa ji malmezinên Bêzikê jorîn û mala mêrxasên eşîrê ne.”[406]

Weqas û Mistefa di heman gemiyê de li ser Feratê seferan dikin û li wir rastî hevûdin tên. Ev gemî ew cih e ku Mistefa lê tê kuştin.

Paşê di mala bavê Mistefa Qadir Axa de şîn heye. Cihê ku lê Weqas tê efû kirin jî ev der e.

---

[404] “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

[405] “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

[406] “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

### 2.12.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê zimanê jiyana rojane ye. Zimanekî sade, herikbar û edebî ye. Ziman, li gor mijar û atmosfera çîrokê ye. Herweha axaftina lehengên çîrokê li gor statuya wan e.

"- Ev e Seyîd Weqas têye û xwe diavêje mala me. Divê em tê biborin."[407]

Piştî Qadir Axa van gotinan dibihîse, hêsir ji çavan dibarin. Hemê dibêje:

"- Bavo! ma evçend ji te ra giran e ko tu di xwîna kurekî xwe bibuhurî. Ma ji bo vê digirî?"[408]

Qadir Axa dibêje efûkirin ne zor e ya ku ez hestewar kirin mêranî û camêriya lawê min e.

"- Na Hemo, di buhurîna xwîna kurekî ji min ra ne ewçend dijwar e. Lê gava min tu li ser vê reya camêr dîtî ji kêfxweşiyan ev hêstir bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşiya min ev e ko, min zaniye warê min ne î kor e…"[409]

### 2.12.1.8. Raman-Tema

Çîrok li ser mêrxasî, lehengî û dilnizmiya mezinên eşîrên Kurdan e. Mezinên eşîrên Kurdan ewqas camêr û merd in ku dikaribûn neyarên xwe jî efû bikin. Di destpêkê de vegêr pesnê Bêzika Jorîn dide û li ser Hemê dibêje: "Mala Ûsiv axa ji malmezinên Bêzikê jorîn û mala mêrxasên eşîrê ne. Vê paşiyê di vê malbatê de bi navê Hemê Qadir axa mêrek rabû bû ko di wî welatî de rû bi mêran va ne hişti bû."[410]

Herweha em di çîrokê de jî serwext dibin ku Hemê tevî bavê xwe Qadir Axa xwîniyê kurê xwe nakuje û efû dike.

Jixwe ev diyaloga di navbera bav û kur de derbas dibe ramana çîrokê pir xweş dide xwîner:

"-Ev e Seyid Weqas têye û xwe davêje mala me. Divê em tê biborin."[411]

---

407 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

408 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

409 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

410 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

411 "Warê Min Ne î Kor e", r.5.

“-Bavo! ma evçend ji te ra giran e ko tu di xwîna kurekî xwe biborî?!.. Ma ji bo vê digirî?”[412]

“-Na Hemo, di borîna xwîna kurekî ji min ra ne ewçend dijwar e. Lê gava min tu li ser vê reya camêr dîtî ji kêfxweşiyan ev hêstir bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşiya min ev e ko, min zaniye warê min ne î kor e.”[413]

Bav bavekî mêrxas û zana ye, naxwaze navê mêrxasiyê ji ser mala wî rabe, ji ber vê yekê guman dike ku kurê wî xwîniyê wan bikuje, dilezîne ku pêşiya lawê xwe bigihê xwînî. Lê dibîne ku lawê wî jî bi heman gumanî ber ve tê fêm dike ku lawê wî jî wekî wî jîr û mêrxas e pê serbilind dibe ev yek wî hestiyar dike.

Di nav çîrokê de em şîn, di çanda Kurdan da çawa ye dibînin: “Qadir axa jî tê cendekê kurê xwe dibe mal û ji her alî dost û nasên wan berê xwe didin Semsatê, mala Qadir axa ji bo serxweşiyê.”[414]

### 2.12.2. Hêmanên Teknîkî

#### 2.12.2.1. Diyalog

Di çîrokê de diyalog hene. Vegêr, lehengên xwe dane axaftin. Ev axaftin li gor statuya lehengan e; herikbar û siruştî ye.

“- Ev e Seyîd Weqas têye û xwe diavêje mala me. Divê em tê biborin.”[415]

Piştî Qadir Axa van gotinan dibihîse, hêsir ji çavan dibarin. Hemê weha dibêje:

“-Bavo! ma evçend ji te ra giran e ko tu xwîna kurekî xwe bibuhurî? Ma ji bo vê digirî?”[416]

---

412 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

413 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

414 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

415 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

416 “Warê Min Ne î Kor e”, r.5.

## 2.13.PIRA GENDERÊ Û HEMÛŞÊ KULIK[417]

Ev çîrok jî çîrokek kurt e. Wekî "Mist-Awik", "Şêrek Bi Darekî", "Warê Min Ne î Kor e", "Beraz û Berazî" û "Mijo û Xane" çîrokeke lehengiyê ye. Lehengiya Hemûş û nemerdiya dijmin di nav çîrokê de bi hostatî hatiye ristin.

Di destpêka çîrokê de bi dorfirehî pira Genderê hatiye teswîrkirin, herweha derbarê eşîran da jî agahî hatine dayîn behsa şerê eşîran hatiye kirin. Em dikarin bibêjin ku nîvê çîrokê ev agahî ne û nîvê mayî bûyera sereke ye.

**Kurteya Çîrokê**

Di navbera eşîra Teşikan, Alikan û Ziravikan de neyartî heye. Hemûşê Kulik ji Ziravikan e. Rojekê Alikan bihîstiye ku Hemûşê Kulik hatiye Teşikan û wê rêya wî bi Pira Genderê bikeve. Pira Genderê "Ne ji ber boşiya çêm, bi tenê ji ber bilindiya cîh, pire gelekî bilind hatiye çêkirin. Bê zêdeyî mirov dikare bêje ko sed mêtir bilindiya pira Genderê heye."[418] Peyayên Alikan li serê diçin cem rîsipiyên xwe û bi wan dişêwirin. Rîsipiyên Alikan dibêjin bila çil peyayên jêhatî herin li dora pirê xwe veşêrin, wextê Hemûş hat bila dorê lê bigirin.

Çil kes li dora pirê xwe di nav lat û zinaran de vedişêrin. Wextê Hemûşê Kulik tê, dorê lê digirin. Bang li Hemûş dikin, weha dibêjin,

"-Hemûşo vê carê tuyê çi bikî û bi kû de herî?"[419]

"-Vê carê jî vir da. Teqez ji destketina; neyar çêtir e."[420]

Hemûş berê hespê xwe dide çêm, xwe ji ser pireyê diavêje. Hesp dimire lê Hemûş difilite, herweha dengê mêraniya wî belavtir dibe.

### 2.13.1. Hêmanên Materyal

#### 2.13.1.1. Vegêr

Nivîskar-vegêr, di destpêka çîrokê de bi berfirehî behsa herêma Kextê (bi Tirkî, Kâhta], Meletiyê û Pira Genderê dike. Paşê li ser eşîrên herêmê û şerê di navberan eşîran de kurte-agahiyekê dide.

---

[417] Osman Sebrî, "Pira Genderê", *Hawar*, j. 52, 20 Kanûna Paşîn 1943, r.8.

[418] "Pira Genderê", r.8.

[419] "Pira Genderê", r.8.

[420] "Pira Genderê", r.8.

Ev wekî qismekî çîrokê hatiye dayîn lê di nav çîrokê de nehatiye honandin, ji ber vê yekê wekî beşeke destpêkê ya serbixwe xuya dike.

Herweha di dawiya çîrokê de jî ev hevok derdikeve pêş xwîneran ku vegêr xwestiye ramana çîrokê di encamê de ragihîne xwîneran: “Berê, ji bo ku ew nekevin destên neyaran, Kurdan xwe ji cihê holê jî diavêtin.”[421]

### 2.13.1.2. Awayê Nêrînê

Vegêr ji devê kesê sêyem diaxive. Di destpêka çîrokê de vegêr li ser eşîra Teşikan û Alikan haydariyan dide, behsa eşîra Ziravikan û mêrxasiya lehengê çîrokê Hemûşê Kulik dike. Dû re bi hevoka “Rojekê Alikan bihîsti bûn ko Hemûşê Kulik hatiye nava Teşikan û di vegerê de reya wî bi pira Genderê dikeve.”[422] dest bi vegotina çîrokê dike.

### 2.13.1.3. Rêzebûyer

Nivîskar-vegêr, heke di destpêka çîrokê de agahî nedana an ev agahî di nav çîroksaziyê de birista û di encama çîrokê de ev hevoka ku ramana çîrokê eşkere dike neda, me dikaribû bigota çîroksaziyeke serkeftî bi dest ketiye: “Berê, ji bo ku ew nekevin desten neyaran, Kurdan xwe ji ciyê holê jî diavêtin.”[423]

Rêzebûyer di çîrokê de wekî xelekên zincîrekê li pey hev li gor sedem-encamê hatiye dayîn.

1.Rojekê Alikan dibihîzin ku Hemûşê Kulik hatiye nava Teşikan û di vegerê de reya wî bi pira Genderê dikeve.

2.Alik, bi rîsipiyên xwe dişêwirin û biryarê didin ku li ser pira genderê Hemûş zeft bikin.

3.Li ser pirê dora Hemûş zeft dikin ku wî bigirin.

4. Hemûş berê hespê xwe dide çêm. Hesp dimire ew jî difilite.

[421] “Pira Genderê”, r.8.

[422] “Pira Genderê”, r.8.

[423] “Pira Genderê”, r.8.

Çîrok bi hevoka "berê, ji bo ku ew nekevin destên neyaran, Kurdan xwe ji ciyê holê jî diavêt"[424] dawî dibe.

Encama vê çîrokê jî dişibe encama çîroka bi navê "Warê Min Ne Î Kor E". Wekî ku ji nişka ve hatibe qedandin. Ev yek honaka çîrokê qels dike.

Di çîrokê de ûnsûra "meraqê" heye û ji serî ta dawiyê bala xwîner dikişîne. Pirsa gelo wê Hemûş ji destê neyarê xwe vê carê çawa bifilite, di serê xwîner de çêdibe û bi vê meraqê heta dawiyê dixwîne.

Çîrok li ser sedem-encamê hatiye ristin. Her bûyerek sedema wê heye û her tişt li gor rêzê li gor pergalekê diqewime.

### 2.13.1.4. Leheng

**Hemûşê Kulik:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Ji eşîra Ziravikan e. Vegêr-nivîser Hemûş wiha dide naskirin: **"**Lê Hemûşê Kulik, mêrê qenc, siwarê rimbaz û şûrhingêv. Her carê di van rêbirînan de du sê mêr ji Alikan dikuşt û bi selametî ji nav neyaran bi derdiket."[425]

Di navbera eşîran de neyarî heye. Ji ber vê hertim rê li Hemûş tê birîn lê Hemûş mêrxasekî wêrek, şervanekî serkeftî ye, neyar tu carî nikare zora wî bibe.

Wextê li ser Pira Genderê çil peya dora wî digirin, berê xwe bêyî dudilî dide çêm û xwe tevî hespê xwe diavêjê. Bindestî, ketina nav destê neyar qebûl nake. Ev diyaloga di navbera Hemûş û neyar de dilêrî û mêrxasiya wî bêtir dide der.

"-Hemûşo vê carê tu yê çi bikî û bi ku de herî?..."[426]

"-Vê carê jî vir da. Teqez ji destketina; neyar çêtir e."[427]

Tu aliyên neyînî yê leheng nehatine nîşandan. Wekî mirovekî mînak e û vegêr di encamê de destnîşan kiriye ku Hemûşê Kulik civata Kurdan dinimîne. Hemûş û Mist-Awik dişibin hevûdin, her du jî ne mirovekî civaka Kurdan sembolize dikin û ramana her duyan jî yek e, ew bindestiya dijmin naxwazin.

---

[424] "Pira Genderê", r.8.

[425] "Pira Genderê", r.8.

[426] "Pira Genderê", r.8.

[427] "Pira Genderê", r.8.

Rîsipiyê Alikan, çil peya û eşîr wekî fon hatine bikaranîn, peyayên Alikan diçin bi rîsipiyên xwe dişêwirin.

Ev şêwr çand-rêzaniya eşîran jî nîşan dide, wê serdemê bi rîspiyên xwe şêwirîn hebûye ku hê jî ev dewam dike. Lewre rîspî zana ne bi zanebûn û tecruba xwe rê nîşanî eşîrên xwe didin. Biqîmet in û eşîr rûmeta wan digire.

Herweha tolhildan jî wekî hemû miletan di nav eşîrên Kurdan da jî hebûye. Wextê tolhildanê hinek serekeşîr, mîr, koçer ewqas mêrxas, jîr, jêhatîbûne ku bûne mijara edebiyatê.

Osman Sebrî eşîrên dorbera Kexte, Meletî û Rihayê nas dike. Ew bixwe di nav rêzaniya eşîrê de mezin bûye. Qenc zanîna wî ya li ser wan eşîran di çîrokên wî de jî xuya ye.

**2.13.1.5. Dem**

Di çîrokê de dem bi teqezî nehatiye destnîşankirin. Wextê vegêr di destpêkê de behsa eşîran dike, dibêje: “Beri heştê-nod salî, di navbera Ziravikan û Alikan de şerine dijwar çêbû bûn.”[428] Ev çîrok di sala 1943yê de hatiye nivîsandin. Bûyer heştê, nod sal berê qewimiye, vegêr bûyerê bihîstiye û bi ziman û şêweya xwe û bi çîroksaziyeke nû ve nivîsiye.

Bûyer “Rojekê Alikan bihîsti bûn ko Hemûşê Kulik hatiye nava Teşikan û di vegerê de reya wî bi pira Genderê dikeve.”[429] dest pê dike û du roj dikişîne.

Rojekê Hemûşê Kulik tê Teşikan, dotira rojê eşîr çil peyayên xwe dişînin ser Pira Genderê, Hemûş xwe nade destê neyar, berê hespê xwe dide çêm. Hesp dimire, Hemûş xelas dibe.

**2.13.1.6. Mekan**

Mekanê ku bûyer lê diqewime Pira Genderê ye. Vegêr, di destpêka bûyerê de li ser pirê bi berfirehî agahdarî dane.

> “Di nivroyê Meletiyê û qezaya Gextê de bi navê Hilofê çiyayek heye. Çemên Gextê û Genderê di rohelatê wî de dikevin ser hev. Berî têkilbûna her du çeman, di wexta Romaniyan da, li ser çemê Genderê, bi navê çêm, pirek hatiye çêkirin ko îro jî;

[428] “Pira Genderê”, r.8.

[429] “Pira Genderê”, r.8.

hemberê wê pirê di welatê Kurdan de tune. Pire di ziqurekî welê teng de hatiye çêkirin ko navbera du çiyan gihandiye hev. Bi xêra vê pirê mirov bê dijwarî ji çiyayê Hilofê derbasî hêrikên Alikan dibe. Ne ji ber boşiya çêm, bi tenê ji ber bilindiya cih, pire gelekî bilind hatiye çêkirin. Bê zêdeyî mirov dikare bêje ko sed mêtir bilindiya pira Genderê heye."[430]

Herweha di naverokê de hûrgiliyên pirê hatine vegotin: "Çima ko ser pire ne rast e û di her hêlekê va heya nîvî hevraz û ji nivî şûn de sernişûv e. Ji ber vê dewar gelekî bi dijwarî li ser dimeşin."[431] Ev ji bo nîşandana mêrxasî û dilêrêya leheng hatiye bikaranîn.

Piştî nîşandana lehengî, em dikarin bibêjin ku bûyer, bi awayekî serkeftî hatiye honandin. Leheng, dem, cih û bûyer li hevûdin tên.

**2.13.1.7. Ziman û Şêwe**

Ziman, zimanê nivîskar-vegêr e. Zimanê jiyana rojane ye. Hevok kurt û zelal in. Ziman, zimanê jiyana rojane ye, sade ye.

Herçend kêm be jî, vegêr cih daye axaftina lehengên berhemê jî. Vê yeke jî tehmeke edebî daye berhemê. Zimanê lehengan li gor kesayetî û statuya wan a civakî ye.

Di çîrokê de ravek û şibandinên orîjînal ên wekî "siwarê rimbaz, şûrhingêv", "agirê hildana tolê" hene.

**2.13.1.8. Raman-Tema**

Di şexsê Hemûşê Kulik de civata Kurdan hatiye nîşandan. Hemûşê Kulik şervanê jîr, jêhatî, bêtirs û wêrek rastî êrîşa neyaran tê, hertim ji destê neyaran difilite û bindestiyê qebûl nake.

Vegêr li gor realîteyê tevgeriyaye. Lehengê serek Hemûş herçiqas bihêz be jî ne wekî lehengên destanan xwedî taybetiyên derasayî ye. Ji hemû aliyan ve mirovekî ji jiyana rasteqîn e.

Di çîrokê de bi qasî ku pire û Hemûş hatine teswîrkirin ewqas dijmin nehatiye teswîrkirin. Divê hinekî derheqê dijmin de jî agahî hebûna, herweha em bi dilêrî û

---

[430] "Pira Genderê", r.8.

[431] "Pira Genderê", r.8.

wêrekiya Hemûş jî bi tevgerên wî haydar dibin; vegêr lehengê xwe ji aliyê fizîkî û psikolojîk ve bi hurgîlî nîşanî xwendevanê xwe nedaye.

Çîrok bi hêvokeke ji rêzê û agahiyeke serveyî bi dawî bûye ku ev jî xwînerên xwe metel dihêle. Xwîner dibêje gelo wê çi bibêje: "Berê, ji bo ku ew nekevin desten neyaran, Kurdan xwe ji ciyê holê jî diavêtin"[432]

### 2.13.2.Hêmanên Teknîkî

#### 2.13.2.1. Teswîr

Pira Genderê bi berfirehî hatiye teswîrkirin. Xwîner dizane ku Pira Genderê li ku derê ye, bilindiya wê çiqas e, çawa ye.

"Pire di ziqurekî welê teng de hatiye çêkirin ko navbera du çiyan gihandiye hev. Bi xêra vê pirê mirov bê dijwarî ji çiyayê Hilofê derbasî hêrikên Alikan dibe. Ne ji ber boşiya çêm, bi tenê ji ber bilindiya Cîh, pire gelekî bilind hatiye çêkirin. Bê zêdeyî mirov dikare bêje ko sed mêtir bilindiya pira Genderê heye."[433]

#### 2.13.2.2. Diyalog

Di dawiya çîrokê de diyalogek heye. Ji neyaran yek bang li Hemûş dike, Hemûş lê vedigerîne;

"-Hemûşo vê carê tuyê çi bikî û bi kû de herî?"[434]

Hemûş bere hespê bê tirs dide çêm dibêje;

"-Vê carê jî vir da. Teqez ji destketina; neyar çêtir e."[435]

---

432 "Pira Genderê", r.8.

433 "Pira Genderê", r.8.

434 "Pira Genderê", r.8.

435 "Pira Genderê", r.8.

### 2.14. BERAZ Û BERAZÎ[436]

Ev çîroka li ser mêrxasiyê di rûpeleke *Ronahi*yê de hatiye weşandin. Mijara "Beraz û Berazî" û "Warê Min Ne î Kor e"yê yek e. Di heman demê de her du çîrok jî di nav eşîra Bêzikê de diqewimin. Di nav lehengên çîrokê yên her duyan de jî Ûsiv Axa heye.

**Kurteya Çîrokê**

Rojekê Ûsiv Axa du siwarên xwe radike û diçe nêçîra berazan. Di kelekela nîvroyê de colekî beraz li pêş wan radibin. Ûsiv Axa û her du siwar yekê ji col diqetînin û birindar dikin. Ev berazê birîndar direve. Ûsiv Axa û her du siwar didene ser şopê. Dibînin ku li pêşiya berazê dane pey şopa wî peyayekî ebayê xwe bi ser xwe de kiriye û diçe. Bang dikine dengê xwe nake. Ûsiv Axa dibêje hebe ev peya kerr e, ji Hisên re dibêje hespê xwe bide çar gavan xwe bigînê ku xwe ji pêşiya beraz bide alî. Lê beraz berî Hisên digihîje vî peyayî. Hisên dibêje "berêz di paş ra xwe gihandê û dilê min jî xwe da ber devê min. Hew min dît, bê ko camêr li pişt xwe bizivire, destê wî li paş livî û şûrê wî biriqî; beraz kete erdê."[437] Peya piştî kuştina berazê birîndar li pişt xwe nanêre diçe.

Di vê navberê de Ûsiv Axa jî xwe digihîne şûna beraz dibîne ku vî mêrikî ew bi derbekî şûr kuştiye. Ûsiv Axa vedigere ji Hisên re dibêje xwe bigihîne peya. Peya tê, Ûsiv Axa dibêje;

"-Tu î çi kesî yî birazî?"[438]

"-Ez î berazî me ezbenî."[439]

"-Tu ji kû tê î û bi kû de diçî?"[440]

"-Ez xwînî bûme ji xwe ra li nik camêran li geştê digerim de ko xwîna xelkê bidim."[441]

---

436 Osman Sebrî, "Beraz û Berazî", *Ronahî*, j.16, 1 Tîrmeh 194, r.11.

437 "Beraz û Berazî", r.11.

438 "Beraz û Berazî", r.11.

439 "Beraz û Berazî", r.11.

440 "Beraz û Berazî", r.11.

441 "Beraz û Berazî", r.11.

Ûsif axa mêrikê Berazî bi xwe ra tîne mal, piştî sê rojan xwîna ku jê tê xwestin bi temamî dide û wî birê dike.

### 2.14.1.Hêmanên Materyal

#### 2.14.1.1.Vegêr

Di destpêka çîrokê de vegêr li ser eşîra Bêzikan agahiyan dide, paşê dest bi çîrokê dike: “Rojekê Ûsif axa du siwarên xwe rakiribûn û çû bû nêçîra berazan.” Lê çîrok bi vî awayî dewam nake. Nivîskar-vegêr careke din bûyerê dide rawestandin û dibêje ku wî ev çîrok ji siwarên Ûsiv Axa Hisên bihîstiye û li wê derê gotinê radestî lehengê çîrokê Hisên dike. Vegêr “ew” e.

Hisên, peyayê Ûsiv Axa ye, di çîrokê de roleke wî ya girîng tune ye.

#### 2.14.1.2. Awayê Nêrînê

Di destpêkê de vegêr-nivîskar “ew” agahiyan dide, paşê gotinê radestî lehengê çîrokê Hisên dike. Yanî nêrîna “ew”ê û “ez”ê bi hevûdin re hatine bikaranîn. “Berêz di paş ra xwe gihandê û dilê min jî xwe de ber devê min. Hew min dît, bê ko camêr li pişt xwe bizivire, destê wî li paş livî û şûrê wî biriqî; beraz kete erdê.”[442]

#### 2.14.1.3. Rêzebûyer

Honandina vê çîrokê jî dişibe çîroka bi navê “Warê Min Ne î Kor e”. Di vê çîrokê de nivîskar- vegêr girêka çîrokê ji xwîneran re hiştiye. Xwîner bi xwendinê fêm dikin ku Berazî berazê birîndar kuştiye û pê tiştekî nebûye. Ûnsûra meraqê ji destpêka bûyerê heta dawiyê dewam dike.

#### 2.14.1.4. Leheng

**Berazî:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Di çîrokê de wiha qala Berazî tê kirin “Hew me dît li pêş yek bi kîlometrekê peyakî eba xwe bi ser serê xwe da kiriye û diçe.”[443] Berazê birîndar bi derbeke şûr dikuje. Di berhemê de bi dorfirehî kêliya kuştina wî ya beraz tê gotin: “Hew min dît, bê ko camêr li pişt xwe bizîvire, destê wî li paş livî û şûrê wî biriqî; beraz kete erdê. Lê ev giştik di nava du saniyan da bû û

[442] “Beraz û Berazî”, r.11.

[443] “Beraz û Berazî”, r.11.

mêrik ne li xwe vesekinî û ne jî li paş xwe nihêrî. Her wekî tiştek ne bû be, bi riya xwe va diçû."[444]

Tevgerên wî nîşan didin ku mirovekî jêhatî, wêrek û biqewet e. Xwînî bûye bo dayina xwîna xelkê li cem camêra li geştê digere. Ûsiv Axa xwîna ku jê tê xwestin dide.

**Ûsiv Axa:** Yek ji malmezinên Eşîra Bêzikên Jorîn e. Bi mêranî û camêriya xwe li derdora herêmê hatiye nasîn. Axa ye. Ûsiv Axa, Berazî ji bo mêrxasiya ku nîşan dide, dike mêvan û xwîna ku jê tê xwestinê, dide.

**Hisên:** Peyayekî Ûsiv Axa ye. Vegêrê çîrokê ye. Nivîskar rayeya vegotinê teslîmî Hisên kiriye.

Siwarekî Ûsiv Axa û eşîr wekî fon hatine bikaranîn.

### 2.14.1.5. Dem

Bûyer rojeke havînê di kelekela nîvroyê de diqewime. "Rojekê Ûsif axa du siwarên xwe rakiribûn û çûbû nêçîra berazan. Di kelekela nîvro de colekî berazan li pêş wan rabûbû."[445]

Di dewama çîrokê de Ûsiv Axa û her du siwarên xwe ji ber germê nikarin li pey berazî bibezin. "Ji germa Havînê hesp li pê berêz westî û di hal de ketibûn. Ji hêla din xwe ne didan ser berêz."[446]

Bûyer di sedsala bîstî de diqewime lê paşê tê nivîsîn. Yanî di navbera qewimîn û nivîsînê de demeke dirêj heye. Dema nivîsandina çîroksaziyê û dema bûyerê yek nîne.

### 2.14.1.6. Mekan

Bûyer li herêma Feratê li ser rêbeja Semsûr-Semsatê çêdibe. Di dewama çîrokê de mala Ûsiv Axa jî heye. Ûsiv axa Berazî dike mêvan. Lê li ser vê malê agahî nayê berpêşkirin.

---

[444] "Beraz û Berazî", r.11.

[445] "Beraz û Berazî", r.11.

[446] "Beraz û Berazî", r.11.

2.14.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê zimanê jiyana rojane ye. Zimanekî sade, herikbar û edebî ye. Ziman, li gor mijar û atmosfera çîrokê ye. Di çîrokê de biwêjên wekî “dilê min jî xwe da ber devê min”[447] hene.

**2.14.2.Hêmanên Teknîkî**

**2.14.2.1.Teswîr**

Vegêr, kêliya Berazî şûrê xwe dikişîne û beraz dikuje teswîr kiriye. Bi vê teswîrê xwîner wan kêliyan tîne ber çavên xwe. Teswîreke kurt û xurt e.

“Hew min dît, bê ko camêr li pişt xwe bizivire, destê wî li paş livî û şûrê wî biriqî; beraz kete erdê. Lê ev giştik di nava du saniyan da bû û mêrik ne li xwe vesekinî û ne jî li paş xwe nihêrî. Her wekî tiştek ne bû be, bi riya xwe da diçû.”[448]

**2.14.2.2. Diyalog**

Vegêr-leheng, Ûsiv Axa û Berazî dide axaftin.

“-Tu î çi kesî yî birazî?”[449]

“-Ez î berazî me ezbenî.”[450]

Axaftina di navbera lehengên çîrokê de şêwazeke siruştî daye çîrokê û çîrok herikbartir kiriye.

---

[447] “Beraz û Berazî”, r.11.

[448] “Beraz û Berazî”, r.11.

[449] “Beraz û Berazî”, r.11.

[450] “Beraz û Berazî”, r.11.

## 2.15.MIJO Û XANÊ[451]

Ev çîrok ji 15 çîrokên din ên Osman Sebrî cuda ye. Lewre di çîrokên din de em "jin"ê wekî lehenga sereke ya çîrokê nabînin di vê çîrokê de jineke qelûnkêş, dewlemend, zana, jîr derdikeve pêş xwendevan ku ev taybetiyeke balkêş a çîrokê ye.

**Kurteya Çîrokê**

Rojekê Hemedoyê Birho tevî peyayên xwe diçe Bedlîsê. Xaneya ku nav û dengê Hemedo bihîstiye bi hatina wî dihise. Diçe xwe dide ber pencereyeke Qesrê, qelûna xwe vêdixe, her wekî ku haya wê ji hatina Hemedo tunebe, vedikêşe. Di vê navberê de peyayên Hemedo jî Xaneyê dibînin. Ji peyayên Hemedo yê ku bi nîşangeriya xwe navdar e ji Hemedo re dibêje ku ew vê bêrûmetiya li hemberî Hemedo hatî kirin qebûl nakin û dibêje destûrê bide ez qelûna di dev de bi guleyekê bifirînim.

Hemedoyê ku bi nîşandariya Mijo bawer e destûrê dide. Mijo bi guleyekê serê qelûna Xaneyê difirîne lê Xane, wekî ku tiştekî nebûye ya didoyan vêdixe. Mijo serê wê jî difirîne. Xane, ya sisêyan vêdixe, Mijo serê wê jî difrîne.

Xane fêm dike ku berberî bi Mijo re nabe û tu berîkên wî vala naçin. Ji cihê xwe radibe. Êvarê wextê Xane tê, ew behsa nîşangeriya vî Kurdî ji Xanî re dike û jê dixwaze ku Mijo perû bike. Xane, ji bo Hemedo û peyayên wî li qesra xwe ziyafetê dide û diyariyan dide wan.

### 2.15.1.Hêmanên Materyal

#### 2.15.1.1. Vegêr

Vegêr, nivîskar-vegêr e, di destpêka çîrokê de mijara çîrokê bi xwînerên xwe dide zanîn. "Dema yek li vê sernamê binêre, di nifşa pêşîn de tiştekî jê dernexê. Ji ber ko Mijo navê Kurdekî gundî û Xane jî, jina Xanê Bedlîsê ye. Lê gava bixwînin, ez bawer im ko dê gelekî kêfa xwe jê ra bînin. Çima ko wê tê de gelek rûçikên Kurdan en qenc û delalî bibînin."[452] Paşê bi kurtetarîxekê li ser serdema bûyer diqewime, agahiyan dide.

---

[451] Osman Sebrî, "Mijo û Xanê", *Ronahî*, j. 17, 1 Tebax 1943, r.5.

[452] "Mijo û Xane", r.5.

### 2.15.1.2. Awayê Nêrînê

Vegêr "ew" e. Bûyerê neqil dike. Berî neqilkirinê li ser tarîxa bûyerê û mijara çîrokê hin agahiyan dide.

### 2.15.1.3. Rêzebûyer

Nivîskar, wekî gelek çîrokên xwe, di destpêka vê çîrokê de jî ramana çîrokê eşkere kiriye; ev têrê nekiriye li ser serdema çîrok qewimiye agahiyên tarîxî dane. Ji bilî agahiyên destpêkê, bûyera sereke ya çîrokê li gor sedem-encamê bi awayekî serkeftî hatiye honandin.

Rojekê Hemedo tevî peyayên xwe diçe Bedlîsê, qesra ku ji bo wî ji aliyê hikûmetê ve li hemberî Qesra Xanê Bedlîsê hatiye çêkirin. Xane pê dihese û li ber paceyekê rûdinê. Mijo bi sê guleyan serê her sê qelûnên di destê Xanê de vêxistî, difirîne. Xanê Bedlîsê vê nîşangeriya hêja perû dike.

Eger vegêr bi tenê ev bûyer neqil bikira, lêkolîna tarîxî û li ser fikirîn û raman ji xwîner û lêkolîneran re bihişta, dê çîrok zêdetir bi ser keta.

### 2.15.1.4. Leheng

**Mijo:** Lehengê sereke yê çîrokê ye. Navê xwe daye çîrokê. Peyayê Hemedo, nîşangirekî xurt e. Bêrûmetiya Xaneyê ya li hemberî Hemedo qebûl nake. Ji vê diyaloga navbera wî û Hemedo de, em wî bêtir nas dikin. Jixwebawerî û nîşangeriya wî dibînin;

"-Axa xweya ye ko Xane hesabê me nake û li pêşberî te; qelûnê dikêşe. Eger destûra min bidî, ezê serikê qelûna wê bi tifingê bihingêfim."[453]

"-Law Mijo! Kira Xaneyê li min jî xweş nehat; lê ditirsim tu li wê bidî, paşê de ji me ra bibe şermeke giran û rûreşiyeke mezin!"[454]

"-Na ezbenî. Eger bê serikê qelûnê berika min li cîhekî din ket, serê min î li ber te ye."[455]

Xanê Bedlîsê ji bo perûkirina vî nîşangerî, ji bo wan ziyafetekê dide.

---

[453] "Mijo û Xane", r.5.

[454] "Mijo û Xane", r.5.

[455] "Mijo û Xane", r.5.

**Xane:** Jina Xanê Bedlîsê ye. Lehenga jin e ku derketiye li hemberî lehengê sereke. Bi saya tevgerên Xaneyê; leheng, nîşangerî û mêrxasiya Mijo derdikeve holê.

**Hemedoyê Birho:** Di nav çîrokê de bi tenê wekî serekekî xuya ye. Lê vegêr berî ragihandina bûyerê li ser wî haydariyên tarîxî dide;

"Di sala 1841an da, piştî kutabûna şerê Karmilêhayê, xelkê Sasûnê zora leşkerê fermandarê romî Hafiz Paşa bir. Hikûmeta Tirk ji bo aşkirina serxwerabûyan, di bin serekiya Hemedoyê Birho de geraneke xweser (îdare-î xisûsiyê) de bû xelkê Sasûnê. Li ser vê geraneka xweser, çi gava tiştek di navbera hikûmeta Tirk û xelkê Sasûnê de dibû; an hikûmetê peyayê xwe dişande nik, Hemedo an jî Hemedo diçû Bedlîsê û hevdin ser wext dikirin. Ji ber ko Hemedoyê Birho di çûyînên xwe en Bedlîsê de pir peya bi xwe ra dibirin, hikûmetê ji bo vê yekê qesrek raxistibû û hemû mesrefên wê mêvaniyê ji xezînê didan."[456]

**Xanê Bedlîsê:** Mêrê Xaneyê ye. Xaneyê nîşangeriya Mijo jê re vedibêje û dixwaze wî perû bike. Xan ji bo van şervanan ziyafetekê dide. Di çîrokê de ji bo Xan tê gotin; "Xanê Bedlisê ne ji wan mezinan bû ko di girtina rûmeta mêrên hêja de bi şûnda bimaya. Sibetirê Hemedoyê Birho tevlî peyayên wî vexwande mala xwe û jê ra xirêfeke (ziyafet) bitehm çêkir û hemû mezin û rîsipiyên Bedlîsê jî anîne ser. Piştî xwarinê, di dema xatirxwaziyê da, şûrekî pir î hêja danî ber Hemedo û Mijo jî ji serî heyanî lingan nuh kir û tifingeke zîvhilî jî dayê."[457]

Hafiz Paşa, Hikûmeta Tirk, rîsipiyên serdemê wekî fon hatine bikaranîn. Ne di nav bûyera sereke ya çîrokê de, di destpêka li ser tarîxê de qala wan tê kirin. Hikûmetê ji bo Hemedoyî qesrek daye çêkirin.

### 2.15.1.5. Dem

Hêmaneke girîng e. Di destpêka çîrokê de li ser serdema jiyana Hemedoyî zanyarî hatiye dayîn: "Di sala 1841ê da, piştî kutabûna şerê Karmilêhayê, xelkê Sasûnê zora leşkerê fermandarê romî Hafiz Paşa bir. Hikûmeta Tirk ji bo aşkirina serxwerabûyan, di bin serekiya Hemedoyê Birho de geraneke xweser (îdare-î

[456] "Mijo û Xane", r.5.

[457] "Mijo û Xane", r.5.

xisûsiyê) de bû xelkê Sasûnê."[458] Lê bûyer rojekê diqewime. "Rojekê di van çûyînên Bedlîsê da, Hemedo tevlî çend peyan bi derketibû şehnişîna (balkon) qesrê û li bajêr temaşe dikir."[459]

Bûyer bi rojekê dest pê dike û bi dotira rojê ziyafetdayîna Xanê Bedlîsê bi dawî dibe.

### 2.15.1.6. Mekan

Bûyer, li Bedlîsê li Qesra Hemedoyê Birho ya li hemberî Qesra Xanê Bedlîsê çêkirî, diqewime. Paşê em hemû lehengan tevlî rîsipiyan li Qesra Xan dibînin. Mekanên ku bûne sehneya bûyerê cihên rasteqînin in, ne cihên xeyalî ne.

### 2.15.1.7. Ziman û Şêwe

Zimanê çîrokê zimanê jiyana rojane ye. Zimanekî sade, herikbar û edebî ye. Ziman, li gor mijar û atmosfera çîrokê ye. Herweha axaftina lehengên çîrokê li gor statuya wan e.

"-Axa xweya ye ko Xane hesabê me nakiye û li pêşberî te; qelûnê dikêşiyê. Eger destûra min bidî, ezê serikê qelûna wê bi tifingê bihingêfim."[460]

"-Law Mijo! Kira Xaneyê li min jî xweş nehat; lê ditirsim tu li wê bidî, paşê de ji me ra bibe şermeke giran û rûreşiyeke mezin!.."[461]

"-Na ezbenî. Eger bê serikê qelûnê berika min li Cîhekî din ket, serê min î li ber te ye."[462]

Wekî em bi vê diyalogê jî dibînin, peyayên Hemedo wî wekî "axa" û "ez benî" bi nav dikin.

---

458 "Mijo û Xane", r.5.

459 "Mijo û Xane", r.5.

460 "Mijo û Xane", r.5.

461 "Mijo û Xane", r.5.

462 "Mijo û Xane", r.5.

#### 2.15.1.8. Raman-Tema

Di destpêka çîrokê de nivîskar-vegêr dibêje: "Lê gava bixwînin, ez bawer im ko dê gelekî kêfa xwe jê ra bînin. Çima ko wê tê de gelek rûçikên Kurdan en qenc û delalî bibînin."[463]

Çîrok li ser mêrxasî, şervanî, ciwanî û qedirgirtinê ye. Herweha ev hevokên dawî yên çîrokê yên raveya vegêrî, kurteya ramana çîrokê ne; "Erê, wê dema ko Kurdan qedir û rûmeta mêran û mêraniyê holê digirtin, sed peyayên wekî Mijo bera ordiya serdarê Rom Hafiz Paşa didan."[464]

Di vê vê çîrokê de jî wekî çîroka "Şêrek Bi Darekî", "Beraz û Berazî" şopên çanda Kurdî hene. Em di her sê çîrokan de jî perûkirina lehengên sereke yên çîrokê dibînin.

### 2.15.2. Hêmanên Teknîkî

#### 2.15.2.1. Teswîr

Bi saya teswîra vegêrî, em Xaneyê di paceyê de dibînin ku qelûnê dikişîne;

> "Dema Xaneyê bi teqîna tifing û vizîna berikê ra firîna serikê qelûna xwe dît; bê ko bitertile an di xwe bi derxe, herwekî tu tişt ne bû be, rabû ser xwe û çû serikeke din anî dagirt bi ser darê yasemînî xist, kozek agir de ser qelûnê, dîsa di cihê xwe de rûnişt û kêşa. Ev kira Xaneyê rasterê ji Mijo ra vexwandineke ecêb bû. Mijo bi berika dudûyan ew serika jî hingaft. Xaneyê li xwe danenî ko darê xwe vala bihêle, an cihê xwe berde; çû serikeke din anî bi ser darê xwe xist. Mijo ew serika jî bi berika sisiyan hingaft."[465]

#### 2.15.2.2. Diyalog

Di çîrokê de di navbera Hemedo û Mijo de axaftinek rû dide. Vegêr, vê axaftinê bi diyalogekê bi xwînerên xwe dide zanîn. Bi saya diyalogê lehengê sereke yê çîrokê Mijo hestên xwe ji Hemedo re vedibêje.

---

[463] "Mijo û Xane", r.5.

[464] "Mijo û Xane", r.5.

[465] "Mijo û Xane", r.5.

“-Axa xweya ye ko Xane hesabê me nakiye û li pêşberî te; qelûnê dikêşiyê. Eger destûra min bidî, ezê serikê qelûna wê bi tifingê bihingêfim.”[466]

“-Law Mijo! kira Xaneyê li min jî xweş nehat; lê ditirsim tu li wê bidî, paşê de ji me ra bibe şermeke giran û rûreşiyeke mezin!..”[467]

“-Na ezbenî. Eger bê serikê qelûnê berika min li cîhekî din ket, serê min î li ber te ye.”[468]

---

[466] “Mijo û Xane”, r.5.

[467] “Mijo û Xane”, r.5.

[468] “Mijo û Xane”, r.5.

# ENCAM

Di vê teza me da me xwest ku em li ser 15 çîrokên Osman Sebrî yên di *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin, vekolîneke ji aliyê binyadê ve bikin û di warê edebiyata nûjen de çîrokan binirxînin û çîroknûsiya Osman Sebrî derxin holê.

Osman Sebrî nivîskarekî kovara *Hawar* û *Ronahi*yê ye ku gelek berhem dane. Herweha gelek helbest, çîrok, gotar, sihetî, bîranîn nivîsîne. Herçiqas hin gotar li ser çîrokek û çend helbestên wî hatibin nivîsîn, lêkolînên giştî hatibin kirin jî heta vê gavê çîrokên Osman Sebrî ji hêla binyadê ve nehatine vekolandin û nirxandin, lewma ji bo lêkoleran xezneyeke bêhempa ye.

Me di teza xwe de bi giştî behsa jiyan, berhem, hunera Osman Sebrî kir û me çîrokên Osman Sebrî analîz kirin. Encamên ku em gihiştinê ev in:

1.Ji ber ku piraniya çîrokan serpêhatî, bîranên Osman Sebrî ne vegêrê çîrokê kesê yekem e. Di hin çîrokan de jî forma ez û ew bi hevûdin re hatiye bikaranîn.

2.Di hemû çîrokên Osman Sebrî de bûyerek heye. Çîrok li dora vê bûyerê hatiye honandin.

3.Di piraniya çîrokan de vegêr lehengê sereke yê çîrokê ye. Leheng-vegêr heman kes e. Di çîroka *Li Goristaneke Amedê, Şîna Jinekê li ser Gora Birho*, *Terşê Şevê* de lehengê sereke yê çîrokê û vegêr yek e. Heta di çîroka *Terşê Şevê, Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz* de Osman Sebrî navê xwe bi kar aniye.

4.Piraniya çîrokên Osman Sebrî nehatine afirandin, hatine neqilkirin. Osman Sebrî an serpêhatiya xwe an jî çîrok û serpêhatiyên ku dibihîse bo ku winda nebin dinîvîse. Çîroka *Warê Min ne î Kor e, Mijo û Xane, Mist-Awik, Şêxê Barzan*, *Terşê Şevê* wiha ne.

5.Di hin çîrokan de bûyera sereke di nav bûyereke din de hatiye vegotin ango çîrok di nav çîrokê de ye. Bo nimûne, *Li Goristaneke Amedê*, *Şîna Jinekê* bi vî rengî ye. Lê di piraniya çîrokan de nivîskar di destpêk û navbera metna sereke ya çîrokê de bûyerê dide rawestin û agahiyan dide xwîner. Di destpêka çîroka *Pira Genderê, Beraz û Berazî, Şêxê Barzan, Şeytanqûnî 1, Şeytanqûnî 2, Şeytanqûnî 3, Şêrek bi Darekî, Mijo û Xane, Mist-Awik, Nêçîra Hirçan* de nivîskar di destpêka çîrokê de agahiyan dide, ev agahî ne wekî beşeke çîrokê ye, wekî beşeke xweser e û ji çîrokê

cuda ye. Ev agahiyên zêde di derbarê dîrok û paşxaneya bûyerê de, nirxa çîroksaziyê kêm dike.

6.Di çîrokan de ûnsûra meraqê heye. Ji serî heta dawiyê xwîner bi meraq çîrokê dixwînin da ku hîn bin di encamê de çi bû. Nivîskar vekirina girêka çîrokê ji xwîneran re dihêle. Di çîroka *Pira Genderê* de xwîner bi kelecan xilasbûna Hemûşê Kulik, di *Beraz û Berazî* de kuştina beraz ji aliyê Berazî ve, di *Terşê Şevê* de tişta li goristanê bi meraq dixwîne, kelaca di canê xwîner de heta dawiyê zindî dihêle. Lê di çîroka *Şêrek bi Darekî* û *Şeytanqûnî 3* de ev meraq tune, lewre vegêr-nivîskar girêkan yek bi yek vediçirîne, agahiyan dide xwîner, ev yek çîrokê qels dike.

7. Di çîrokên Osman Sebrî de bûyer li gor sedem-encamê hatiye ristin û bûyer wekî xelekên zincîrê bi hevûdin re hatine girêdan. Tenê di çîroka *Li Goristaneke Amedê* û *Şîna Jinekê* de bûyer di nav bûyerê de hatiye ristin. Bûyerek wekî xelekeke mezin ji bûyera sereke re bûye çarçove.

8. Çîroka *Şeytanqûnî 1, Şeytanqûnî 2, Şeytanqûnî 3* wekî rêzeçîrok hatine honandin. Mijar yek e, tenê cih û lehengên çîrokê ji hevûdin cuda ne. Lewma me jî ev çîrok wekî çîrokên serbixwe nirxandin.

9. Di çîrokên Osman Sebrî de piraniya lehengên ku navê xwe dane çîrokan lehengên erênî, baş, mêrxas, jêhatî, birûmet û edalet in. Di çîroka bi navê Mijo nîşangerekî jêhatî ye, Mist-Awik ewqasî jêhatî ye ku bi tena serê xwe li dijî dijmin şer dike û xwe nade destê neyar, di nav agir de dişewite. Herweha lehengên xirab ên di çîrokan de di dawiya çîrokê de dimirin û yên baş bi mêrxasî ji bo nekevin destê neyar dimirin an jî tên perûkirin. Em jê fêm dikin ku her lehengek Osman Sebrî civata Kurdan temsîl dike.

Di çîrokên Osman Sebrî de leheng curbicur in. mêrên mêrxas, şervan, rimbaz û şûrhingîv; jinên jêhatî û gundî; şexsiyetên ji dîrokê, şêxê ku difirin, seyên xiniz û ew bixwe bûne lehengên çîrokan.

a.Di çîrokên Osman Sebrî de hemû leheng mêr nînin. Di Şîna Jinekê de lehenga sereke jinek e. Di çîroka Mijo û Xane Xane ku jina Xane Bedlîsî ye bi aqil û wêrekiya xwe derdikeve pêş. Di Çîroka Şeytanqûnî 2yê de Zêzê jineke gundî, tirsonek e. Xane û jina Birho jinên jêhatî, biaqil in.

b.Di *Nêçîra Hirçan* û *Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz de* serlehengê çîrokan heywan in. Hirçekî nêr û seyekî xiniz ku di dawiya çîrokê de dimirin.

c.*Di Warê Min ne î Kor e* de Hemê Qadir Axa, *Mijo û Xane* de Mijo, *Beraz û Berazî* de Beraz, *Pira Genderê* de Hemûşê Kulik bi mêrxasî û dilêriya xwe derdikevin pêş.

e.Osman Sebrî ku jiyana eşîr û gund pir baş dizane, di piraniya çîrokê xwe de jiyana eşîr, gundiyan nîşan dide. Di piraniya çîrokên wî de leheng ji eşîreke ji derdora gundê wî ne.

f. Di çîroka *Terşê Şevê, Seyê Ku Gur Tanî Fêza Pêz*, *Li Goristaneke Amedê, Şîna Jinekê* de leheng-vegêr Osman Sebrî ye. Lê tenê di çîroka *Şîna Jinekê û Seyê Ku Gur Tanî Fêza Pêz* de navê wî derbas dibe, di yên din de xwe vedişêre.

g. Di çîroka *Li Goristaneke Amedê* de hemû leheng ji dîrokê hatine wergirtin. Şêx Seîd, Şêx Esedê Hewlêrî, Kemal Fewzî, Hesen Xeyrî, Ehmedê Xanî lehengên çîrokê ne.

h.Di çîroka *Şeytanqûnî 3*yê de lehengên sereke ên çîrokê tune ne. Heta navê tu lehengî nehatiye gotin tenê ajokar, gundî û rêwî hene.

i. Di *Şêxê Barzan* de lehengê çîrokê şêxek e, mirîden wî ew wekî Mehdî dibînin ji ber vê baweriya mirîdan, Şêx di nav destê wan de dimire.

k.Di çîrokên Osman Sebrî de dîwana axa, gundî, odeya gund wekî fon hatine bikaranîn.

10. Wekî ku Osman Sebrî di destpêka çîrokên xwe de jî dibêje piraniya çîrokan dibihîze û dinivîse. Di destpêkê de, derheqê tarîxa bûyerê de agahiyan dide. Di hin çîrokan de jî dem ne bi tarîxekê bi peyvên diyardeyên demê tê nîşandan. Herweha di du çîrokan de jî dem çend saet in lê vegêr xwînerên xwe di nav rûpelên dîrokê de digerîne.

a. Di çîroka *Mist Awik, Terşê Şevê, Şeytanqûnî 3* û *Pira Genderê* de Osman Sebrî di destpêka çîrokê de derbarê dîroka ku çîrok qewimîne de agahî dane. Yanî wexta bûyer qewimiye û wexta hatiye vegotin yek nîne û di navbera rûdan û vegêranê de demeke dirêj heye. Di çîroka *Mist-Awik* de bûyer berî dused salan qewimiye, vegêr ew bûyer bihîstiye û nivîsiye bi rojekê dest pê dike, di *Terşê Şevê*

de bûyer di sala 1924an de diqewime, lê di sala 1943yan de tê nivîsîn peyvên diyardeyên demê yên wekî “rojekê”, “roja dîtir”, “roja duduyan” hatine bikaranîn. Di çîroka *Seyê Ku Gur Tanî Fêza Pez* de dem rojek ji rojên sala 1923yan. Di çîroka *Şeytanqûnî 3*yê de bûyer di sala 1941ê de rojekê di nav çend saetan de diqewime, Pira Genderê de çîrok di sala 1943yan de tê nivîsîn lê bûyer berî heştê nod salan diqewime.

b.Di çîroka *Mijo û Xane, Şêxê Barzan, Şeytanqûnî 1, Şeytanqûnî 2, Beraz* û *Berazî, Nêçîra Hirçan* de dem bi peyvên wekî “rojekê”, “dotira rojê”, “roja dîtir”, “di kele kela nîvroyê de”, “nîvê şeve”, “sê roj bi şûn de” tê nîşandan.

c.Di çîroka *Li Goristanekê Amedê* û *Şîna Jinekê* de, dem şevek e, bi raketina leheng bûyer dest pê dike û bi şiyarbûna wî bi dawî dibe lê di xewa xwe de di nav rûpelên dîrokê de digere.

11. Di çîrokên Osman Sebrî de ku me ji hêla binyatê ve vekoland cihê ku lê bûyer diqewime gund û bajar in ku Osman Sebrî lê mezin bûye û baş nas dike. Tenê di çîroka *Şeytanqûnî 1*ê de cih mezeleke biçûk a mizgeftê ya ser sînorê Îranê ye ku tenê di vê çîrokê de nivîskar ji bilî gund, bajar û eşîrên derdora xwe cihek hilbijartiye, derketiyê derveyî sînor. Di navbera bûyer, mijar, leheng û mekanê bûyerê de peywendiyeke xurt heye.

a.Di *Şîna Jinekê* de mekan goristaneke li serê Çiyayê Araratê di *Li Goristaneke Amedê* de mekan goristaneke li Amedê ye.

b.Di *Mist-Awik* de bûyer li gundê Beremaniyê li mal û derdora mala *Mist-Awik*, di *Beraz û Berazî* herêma Semsûr-Semsatê, di *Warê Min Ne î Kor e* de Meletî, di *Seyê Ku Gur Tanî Fêza Pêz* de Mirdês, di *Pira Genderê* de di navbera Meletî û qeza Gextê de, di *Mijo û Xane* de Bedlîs, di *Şêxê Barzan* de dîwana Şêx a li qeza Zibarê, di *Nêçîra Hirçan* de Xêştûra Mirdêsê, di *Terşê Şevê* de Xêştûr, di *Şêrek bi Darekî* de Cizîr mekanê bûyerê ye.

c.Di *Şeytanqûnê 3*yê de ku bi şêweyekê pêkenokî hatiye nivîsîn bûyer li ser pişta wesayitekê diqewime.

12. Di çîrokên Osman Sebrî de zimanekî zelal, herikbar, xwezayî û têkûz hatiye bikaranîn. Ziman zimanê *Hawar*ê ye. Zimanê jiyana rojane ye. Herweha nivîskar lehengên xwe jî li gor civak, çand, perwerde û derûniya wan ew dane

axaftin. Lê ji hêla edebî ve ne ewqasî xurt e û ji asta destpêkê heta dawiyê yek e, negihiştiye asteke bilindtir. Çîrok pexşankî ne tenê *Şîna Jinekê* bi awayekî pexşan-mezûm hatiye nivîsîn.

13. Mijara çîrokan xinizî, mêrxasî, şervanî, xerefatên pûç ên di nav gel de, bêwelatbûn e. Lê nivîskar di piraniya çîrokên xwe de berî destpêka bûyerê bi paragrafekî raman û mijara çîrokê ragihandiye xwînerên xwe ku ev jî meraq û kelecana di dilê xwîner de dibe.

14. Di çîrokên Osman Sebrî de rê û rêbazên vegotinê ku bihayê berhemê ji hêla edebî ve xurttir dikin, hatine bikaranîn. Di çîrokan de rêbaza vegotinê, diyalog, teswîr, teknîka otobiyografîk, leîtmotîv, monolog (*Şîna Jinekê*), rêbaza paşve vegerînê (*Şeytanqûnî 2*) de derdikevin pêş.

15.Çîrokên Osman Sebrî ji aliyê hêmanên folklorik ve gelekî xurt in. Di vegêranê de gelek biwêj, gotinên pêşiyan, lorî û hin qalib û peyvên resen û kêmnas xuya dikin. Lêbelê tiştekî ji vê yekê girîngtir jî heye ku têkiliya folklor û vegêrana Osman Sebrî destnîşan dike: Ew di gelek çîrokên xwe de rêzebûyerê bi temamî ji çîrok, metelok û pêkenokên Kurdî werdigire û wan di nav çîroksaziya xwe de bi cih dike. Ligel vê yekê, vê pêwendiya bi folklorê re an jî bi vegêranên şexsî re bi zelalî di destpêka çîrokên xwe de dibêje û çavkaniya çîroka xwe ji xwendevanan re eşkere dike. Herweha bi hewla xelaskirina çîrokê ji wendabûnê, dixwaze bi tomarkirin ango nivîsandinê ve vegêraneka folklorîk a Kurdî bête neqilkirin bo nifşên nû. Helbet nivîskar berî ku vegêranên folklorîk bixe nav dinyaya çîroksaziyê wan vediguherîne û kirasekî nû ji karakterên xwe re difesilîne. Divê em li vir bi bîr bixin ku hin çîrokên Osman Sebrî bi bingehê ve rêzebûyera xwe ji bîr û afirîneriya nivîskar hildaye û bi temamî milkê çîroksaziyeke serkeftî ne.

Li gor van tespîtan em digihîjin vê encamê ku çîrokên Osman Sebrî ku di kovara *Hawar* û *Ronahi*yê de hatine weşandin her yek bi serê xwe nimûneya çîroka edebî (edebiyata nûjen-modern) ye û hêjayê vekolînê ne. Di encama vê lêkolînê de me destnîşan kir ku çîrokên Osman Sebrî ji hêla hêmanên materyal û hêmanên teknîkî ve xurt in.

# ÇAVKANÎ

Ahmed, M. Mele, “Çend Gotin Li Ser Rêzaniya Apo Osman Sebrî”, *Bîranîn:100 Saliya Osman Sebrî*, Berlîn, 2005.

Aktaş, Şerif, *Edebi Metinlerin Tahlili*, Kurgan Edebiyat Yay., Ankara, 2015.

Aktaş, Şerif, *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, Birlik Yayınevi, Ankara, 1984.

Alan, Remezan, *Zanista Edebiyata Modern*, Peywend, Stenbol, 2015.

Amed û Zîn, *Welatparêzê Hêja Apo*, (Hevpeyvînên salên 1984-1988an) Kaset 7, Parîs, 1991.

Aytür, Necla*, Amerikan Romanında Gerçekçilik,* DTCF. Yay., Ankara, 1974.

Aytür, Ünal, *Henry James ve Roman Sanatı*, DTCF yay., Ankara, 1977.

Baydar, Mustafa, *Edebiyatçılarımız Ne Diyorlar?*, A. Yaşaroğlu Kitapevi, İstanbul, 1960.

Bereh, Berken, “Osman Sebrî”, *W*, 2015, j. 51.

Çakır, Hasan, *Öykü Sanatı*, Çizgi Kitapevi, Konya, Eylül 2002.

Çetişli, İsmail, *Metin Tahlillerine Giriş-2*, Akçağ Yayınevi, Ankara, 2004.

Demir, Yavuz, *Anlatılar Tipolojisi*, Akçağ Yay., İstanbul 1995.

Eco, Umberto, *Anlatı Ormanlarında Altı Gezinti*, (wer. Kemal Atakay) Weş. Can, İstanul 1995.

Foster, E.M, Roman Sanatı, (Wer. Ü.Aytür), Adam Yay. İstanbul 1982.

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel Hîgur Sebrî”, 03 Tîrmeh 2017, (mail).

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel Kewa Sebrî”, 03 September 2017, (rû bi rû).

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel Nivîskar Dîlawerê Zengî”, 29 Heziran 2017 (mail).

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel nivîskar Dîlawerê Zengî*”*, 29 Hezîran 2017, (mail).

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel Nivîskar Firat Cewerî*”*, 18 Heziran 2017 (mail).

Hatun Sürücü, Sevim, “Hevpeyvînek Digel Şêx Mihemed Birimce*”*, 18 Îlon 2017, (rû bi rû).

Heyder Omer, *Osman Sebrî Helbestvan û Nivîsevan,* (PDF), 2015.

Husên, Hebes, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de,* Belavgeha Hogir, Bonn, 2007.

Jiyan, Rênas, *Napolyon-Selaheddîn*, Weşanên Belkî, Diyarbakır, 2011.

Kaplan, Mehmet, *Hikaye Tahlilleri*, Dergah Yay., İstanbul, Agustos 2016.

Kundera, Milan, *Roman Sanatı*, (Wer. Aysel Bora) Can, İstanbul 2017, r.137.

Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed, 2010.

Mem Bawer, “Li Goristaneke Amedê Xewna Azadiyê,” *W,* j. 51, Gulan 2014.

Nûbar, A, “Ji Nav Edebiyata Kurdî ya Klasîkî*”*, *Roja Nû*, 1987.

Özon, M. Nihat, *Türkçede Roman,* İletişim Yay., İstanbul 1985.

Sağniç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1992.

Sebrî, Osman, “Beraz û Berazî”, *Ronahî*, j. 16, 1 Tîrmeh 1943.

Sebrî, Osman, “Berdêlik”, *Hawar*, j. 2, 1 Hezîrana 1932.

Sebrî, Osman, “Dîroka Jîna Napolyon”, *Ronahî*, j. 16, 1 Tîrmeh 1943.

Sebrî, Osman, “Dîroka Jîna Selahedîn 1”, *Ronahî*, j. 23, Sibat-Adar 1944.

Sebrî, Osman, “Êzdî û Ola Wan 2”, *Ronahî,* j. 19, 1 Çiriya Pêşîn 1943.

Sebrî, Osman, “Gelo Dem ji Zêr e”, *Hawar*, j. 52, 20 Kanûna Paşîn 1943.

Sebrî, Osman, “Ho Xort”, *Hêviya Welêt*, j. 3, Newroz 1965.

Sebrî, Osman, “Jan”, *Hêviya Welêt,* j. 2, Gulan 1964.

Sebrî, Osman, “Li Goristaneke Amed”, *Hawar*, j. 21, 5 Hezîran 1933.

Sebrî, Osman, “Marşa Felatê”, *Hawar,* j. 50, 15 Çiriya Pêşîn 1942.

Sebrî, Osman, “Marşa Xortan”, *Hawar,* j. 27, 15 Avrêl 1941.

Sebrî, Osman, “Mijo û Xanê”, *Ronahî,* j. 17, 1 Tebax 1943.

Sebrî, Osman, “Mist-Awik”, *Ronahî,* j. 12, 1 Adar 1943.

Sebrî, Osman, “Nêçîra Hirçan”, *Hawar,* j. 48, 15 Tebax 1942.

Sebrî, Osman, “Pira Genderê”, *Hawar,* j. 52, 20 Kanûna Paşîn 1943.

Sebrî, Osman, “Sehitî”, *Hawar*, j. 22, 1 Tîrmeh 1933.

Sebrî, Osman, “Seyê ko Gur Tanî Fêza Pêz”, *Ronahî,* j. 15, 1 Hezîran 1943.

Sebrî, Osman, “Şerek Bi Darekî”, *Ronahî,* j. 14, 1 Gulan 1943.

Sebrî, Osman, “Şêxê Barzan”, *Ronahî,* j. 17, 1 Tebax 1943.

Sebrî, Osman, “Şeytanqûnî 1”, *Hawar,* j. 55, 15 Hizêran 1943.

Sebrî, Osman, “Şeytanqûnî 2”, *Hawar,* j. 56, 15 Tîrmeh 1943.

Sebrî, Osman, “Şeytanqûnî 3”, *Hawar,* j. 57, 15 Tebax 1943.

Sebrî, Osman, “Şîna Jinekê”, *Ronahî,* j. 21, 1 Kanûna Pêşîn 1943.

Sebrî, Osman, “Tarîxa Kurd û Kurdistanê 2”, *Hawar*, j. 29, 10 Hizêran 1941.

Sebrî, Osman, “Tarîxa Kurd û Kurdistanê 3”, *Hawar*, j. 30, 1 Tîrmeh 1941.

Sebrî, Osman, “Terşê Şevê”, *Ronahî*, j.14, 1 Gulan 1943.

Sebrî, Osman, “Warê Min Ne î Kor e”, *Hawar,* j. 51, 15 Çiriya Paşîn 1942.

Sebrî, Osman, “Wefda Kurdî”, *Hêviya Welêt,* j. 3, Newroz 1965

Sebrî, Osman, “Ziman di Jîna Miletan da”, *Hêviya Welat*, j. 1, Razber 1963.

Sebrî, Osman, *Bahoz û Çend Nivîsarên Din*, Şam, 1956.

Sebri, Osman, *Bîranînên Osman Sebrî,* Weşanên Aram, Stenbol, 2004.

Sebrî, Osman, *Derdên Me*, Weşanên Compte d’auteurê, Şam 1956.

Sebrî, Osman, *Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Perî, Stenbol 1998.

Sebrî, Osman, *Li Goristaneke Amedê*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2007.

Stevick, Philip, *Roman Teorisi*, (çev. Sevim Kantarcıoğlu) Akçağ Yay., Ankara 2017.

Tekin, Mehmet, *Roman Sanatı*, Ötüken Yayınevi, İstanbul, 2014.

Tekin, Mehmet, *Roman Sanatı*, Ötüken Yayınevi, İstanbul, 2014.

Uzun, Mehmed, *Hêz û Bedewiya Pênûsê*, Weşanên Nûdem, Çapa Yekem, 1993, Gotar Apê Tevger û Edebiyata Kurdî, r. 9-17; Kurdistan Press, j., 74, 1989.

Uzun, Mehmet, *Kürt Edebiyatı Antolojisi*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2000.

War, Ronî, *Terşê Şevê*, Weşanên Ava, Ankara 2013.

Wellek, A, *Edebiyat Biliminin Temelleri*, London 1978 (çev. A.Edip Uysal), KB. Yay., İstanbul 1983.

Wurmser, A., “Romanda Ben”, *İstanbul*, Sayı 69, 1.10.1946.

Yıldız, Alpay Doğan, *Hikaye İncelemeleri*, Dergah Yay., İstanbul, Haziran 2016.

Zengî, Dilawer, *Osman Sebrî (1905-1993)*, Çapemeniya Emîral, Libnan, 2012.